
roman

BÛBÊ ESER



# Gardiyan

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Gardiyan

# Gardiyan

**BÛBÊ ESER**

NEFEL
Stockholm
2002

**www.nefel.com**
**info@nefel.com**

**Bûbê Eser:** Gardiyan

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Bûbê Eser û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-973195-9-7

Çapa kevin: Roja nû

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike û di Internetê de bêxe malpera xwe.

*Ji bo keça min Rojbînê*

# I

Sîdar xwendevanekî unîversîteyê bû, wî li Ankarayê, beşa rojnamavanetiyê dixwend. Ji gundên wan tenê wî û pismamekî xwe, xwe gihandibûn heta unîversîteyê. Ji ber ko rewşa mala Sîdar ya aborî ne baş bû; wî him di daîreyeke dewletê de kar dikir û him jî unîversîteya xwe dixwend. Her weha çavê malbata wî li riya ko ew unîversîteya xwe biqedîne bû. Sîdar, rojek ji rojên zivistana Diyarbekirê, ya sala 1980-ê dî duduyê meha sibatê de hate girtin.

Sîdar bi qîzeke ne kurd re zewicîbû; Jina wî li bajarê Diyarbekirê, di nexweşxanê de hemşîre bû; Ew bi xwe ne tirk bû, ew Laz bû, lê tirkan ew asîmle kiribûn, zîman û çanda wan weke ya tîrkan dîdan nasandîn. Loma Piraniya wan êdî xwe weke miletekî din nas nedikirin. Wan êdî xwe tirk dizanîbûn.

Di dema zewaca wan de, him li Tirkiyê û him jî li Kurdistanê doza şoreşgerî gelekî bilind bû û ji ber ko ew herdu şoreşger bûn wan bi serê xwe biryara zewaca xwe dabûn. Piştî naskirin û jî hevtêgihiştinê, malbatên xwe di vê derheqê de agahdar kiribûn. Di demeke kurt de daweta xwe li dar xistin. Wan jî weke her bûk û zavayekî nû, xwestin ko bi miradê xwe şa bibin. Lê ev şabûna wan î bi hev re qasî du mehan dom kir. Dûre Sîdar hate girtin, hevala wî bi tena serê xwe ma. Di zewaca şoreşgerên wê demê de, tu garantiya ko kesên zewicandî, heta taliya jiyana xwe bi hev re bijîn, tunebû. Loma hevala Sîdar xwe ji vê rewşê qet aciz nekiri bû, ji ber ko berî ew bi hev re bizewicin, tu sozên ko ew ê qet ji hev neqetin nedabûn hev. Di vê bîr û baweriyê de, hevala wî Hava xwest ko vê jiyana bi tenê, li hemberî hemû xweşî û nexweşiyan, bi bîr û baweriyên xwe, li gel mêrê xwe bijî.

Belê Sîdar hîn zavayekî dumehî bû ko hatibû girtin. Wî demên xwe yên zavatiya nû, di girtîgehê de derbas kir, ma kê zanîbû ko piştî zewacê bi du mehan ew ê bête girtin. Lê ev yeka hate serê wan, ji xwe kesên wê demê yên şoreşger û welatparêz, her dem xwe ji girtinê re hazir dikirin, Sîdar jî ji wan kesan yek bû, ko hatibû girtin.

Sîdar di nozdehê meha Gulana sala 1983-an de hate berdan. Piştî berdana xwe xwest, ew miradê ko nîvco mabû temam bike, yanî zavatiya xwe ya du mehî piştî du sal û şeş mehan bidomîne. Lê gelekî mixabin ko piştî berdana wî, polîsan tu rehetî nedayê, carna gazî wî dikirin, ew dibirin qereqolê, carna li sûkê li wî mêze dikirin, dimizmizîn, weke bêjin: »biner, tu her dem di bin çavderiya me de ye«, bi vî awayî hemû rojên Sîdar di bin çavderiya polîsan de derbas dibû. Piştî demekê û pêde Sîdar baş tê gihişt ko wê nikaribe di rewşeke weha de li bajarê Diyarbekrê bijî, ji ber ko ew her dem dikarîbû bihata girtin.

Dema Sîdar di girtîgehê de bû keçeke wî çê bû bû, diya wê nav lê kiribû, Rojbîn. Rojbîna wî bîr nedibir ko bavê wê di girtîgehê de ye, wê jî weke her zarokekê, dixwest ko bavê xwe li ba xwe bibîne, lê wê tenê dikarîbû bavê xwe di girtîgehê de, di nava têlên bî de kelem bidîta.

Piştî hewqas tade û êşkencan, dema Sîdar ji girtîgehê derket, wî xwest ko demekê li Diyarbekra şirîn, li gel qîz û hevala xwe bijî, lê hingî polîsan li wî dipirsîn û çavderiya wî dikirin, ew tê gihiştin ko ew ê nikaribe li Diyarbekrê bijî, loma jî bi alîkariya xalê xwe, wî tayîna hevala xwe derxist hêla Behra Reş, ew li nahiyake bajarê Trabzonê, bi cih bûn, li wir biyanîtiya Sîdar ya cara yekem dest pêdikir.

Nahiya ko ew lê bi cih û war bûn; Fabrîqeyeke çayê, qereqol, nexweşxane û lîseyek lê hebû. Loma jî mamoste, doktor û memurên wir gelek bûn. Li wir mirov dikare bêje ko piraniya mêran karên wan hebûn, hin mamoste bûn, hina di fabrîqê de kar dikirin, kesên ne memûr bûn jî di zeviyê çayê de dixebitîn, di vê rewşa taze de, li wir tenê Sîdar bê kar û şixul bû. Loma pêwîst bû ko Sîdar ji xwe re rêyek bidîta, ko ji wê bêkariyê xilas biba.

Li wir ji bona Sîdar, jiyaneke nû û gelek zor dest pê dikir, ew bi xwe nuh ji girtîgehê derketibû, ne kar û ne jî pereyên wî hebû. Bi ser vê de jî ew ji Universîteya ko wî dixwend, hatibû avîtin. Ew mecbûr mabûn ko li wî cihê biyanîtiyê, tenê bi maaşê jînê îdare bikin, him li hember hemû teda û cefayê, tekoşîneke nû destpêdikir him jî jiyana biyanîtiyê. Lê tiştê herî zor ew bû ko bi yek maaşî li wir jiyana wan bû, ya herî zahmettirîn û zor-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

tirîn jî ew bû ko mêr li mal bê karûbar û jinê jî kar dikir, ev jî tiştekî gelekî çewt bû ko mirov bikarîba li hêla Derya reş bi awayekî azad bijiya, ji ber ko gelekî şerm bû ko li wê heremê mêr betal ba û jinê jî kar bikira.

Ew ketibûn tengasiyake mezin, him wan ne dixwestin ko mirovên wir, raberdûyên (serborî, mazî) wan bizanibin, him jî pêwîst bû, ko wan bi rêyekê ev problema xwe çareser bikirana. Lê bi çi riyê, wan jî nizanîbûn, tenê di ser hev de diponijîn û difikirîn ko çareyekê, rê û rêbazeke ji bêkariya Sîdar re bibînin.

Piştî fikirandineke dûr û dirêj wan riya xilasiya xwe di derewekê de dîtin. Eger derewa wan ji alî rûniştvanên herêmê ve bihata bawerîkirin, ew ê ji vê tengasiyê xilas bibana. Wan derewek weha ji xwe re peyde kirin ko jiyana wan a wir bi wê derewa ko kiribûn, hatibû girêdan. Eger plana wan yanî derewa wan bi cih biba wê bikarîbana, li wê biyanitiyê heta demekê jiyana xwe bidomandana, lê eger derewa wan cihê xwe negirta karên wan ê gelekî zahmet ba. Piştî ko wan derewa xwe ya ko wan hemû hêviyên xwe jî pêde girêdabûn, ji der û dora xwe re gotin û ew derewa wan bi cih bû bû. Loma êdî baweriya rûniştevanên heremê, çê bû bûn ko ew tiştên ji alî Sîdar û hevala wî de hatibû gotin rast e. Ji ber vê sedemê bû ko heta ew li wir man, bi saya serê wê derewê bi awayekî normal jiyana xwe domandin.

Berî girtina xwe Sîdar, li unîversîteyê beşa rojnamegeriyê dixwend, unîversîtêya wî li paytextê tirkiyê yanî li bajarê Ankarayê bû. Dema ko ew hatibû girtin, ji universîteya xwe hatibû avîtin. Wî sê salan xwendibû. Sala wî ya dawîn bû ko wî ê xwendina xwe biqedanda û ew ê biba burokratek. Ji ber ko çavên malbata wî, dost û hevalên wî li benda xilasbûna xwendîna wî bûn ko ew alîkariya wan bike. Qedandina Sîdar ji unîversîtêyê wê kêfxweşiya dost û hevalên wî ba. Lê neqediya. Her çiqas wî universîteya xwe neqedandibû jî, bi saya serê wê, ew li wê herêma Derya Reş, li gel malbata xwe qederê heft mehan bê problema girtinê, lê bi awayekî birçî û tirs jiyana xwe domandin. Loma ew derewa ko wan kiribûn, ji wan re bû bû weke riyeke nû, weke riya azadî û xelasiyê, ew bû sebeb ko Sîdar li gel qîz û hevala xwe li hêla Derya Reş, demeke jiyanê buhurandîn.

Şevekê ji şevên payizê, ko qîza wan razabû, hay û bala wê ji bayê felekê tunebû, wê nizanîbû ko bav û diya wê di çi rewşê de ne, wê nizanîbû ko dê û bavê wê, wê çawa xwe ji vê rewşa ko niha têdene, azad bikin, loma ew ketibû xewa xwe ya şîrîn, Sîdar û Hava bi ser hev de diponijîn, ko ew

ê bi çi awayî bikaribin rêyeke nû ji xwe re peyde bikin, ew ê çi bikin ko ji vê rewşa nebaş xilas bibin. Loma ew gelekî bi ser hevde fikirîn, ne xewa wan dihat, ne jî karîbûn razana, ji ber ko piştî du rojên din Hava wê dest bi kar bikira. Rûniştvanên heremê wê bihatana xêrhatina wê, dema wan xêrhatin li Hava bikrana, wê rewşa mêrê wê bipirsiyana, ka ew çi karî dike. Piştî pirseke weha Hava wê nikarîba bigota ko »ew bê kar e« an jî ew »nû ji girtîgehê derketi ye« gotarên weha wê rewşa wan î wir zortir bikira, wê êdî kesî bi çavekî qenc li wan mêze nekirina, tu kesî wê qedr û qîmet nedana wan. Dema cihê ko mirov lê dijî, qedr û qîmeta mirovan li vir tune be, jiyana wir bê mane dibe. Piştî fikirandineke dûr û dirêj, bi ser hevde diponijin, carna ji wan yekî »digot gelo em weha bêjîn wê çawa be, na wele em weha bêjin wê çêtir be« piştî çêkirina hin plan û dîtina hin riyan, kete bîra Sîdar ko wî demekê li unîversîtê dixwend, gelo dîsa bi sedema vê, wê nikaribin riya xelasiyê bibînin, dema ev kete bîra Sîdar rûyê wî vebû, keniya, hevala wî li wî mabû ecêbmayî û got:

— Wa Sîdar, ma qey rewşa me gelekî xweş e ko tu dikenî.

— Na na, got Sîdar. Min rêya azadiyê dît, ez weha bawerim ko ev plana min wê rewşa me derxe ronahiyê, de ka ez ji te re jî bêjim ko tu çawa dibîne?

Rêya ko Sîdar dîtibû, ji hevala xwe re weha şirove kir:

— Hava, weke tu jî pê dizane ko berî girtina xwe ez xwendevanekî universîteyê bûm. Eger niha tu têkiliyên min bi universîtê re nema be jî, divê em weha ji der û dora xwe re bidin diyarkirin, ko ez kurê dewlemendekî me, malbata min naxwaze ko ez karê bin emir bikim, ji xwendîna min re salek maye, piştî qedandina wê, ez ê bibim rojnamavan û êdî ez ê bi bîhneke fireh û seriyekî rehet karê xwe yê Rojnemageriyê bikim. Û niha jî malbata min, di warê aborî de alîkariya min dikin. Ev pêşniyara Sîdar ji alî jina wî de baş hate dîtin, ji xwe ji bilî vê jî tu rêyeke din ji wan re nema bû. Loma wan biryara xwe dan ko ew kesên ji jina Sîdar bipirsin:

— Ma gelo mêre te çima bê kar e.

Bersîv diyar e. Ji xwe dema hina ji Sîdar bipirsiyana wî yê hîn bi rêk û pêk mesala karnekirina xwe bi derewên xemilandî şirove bikira.

Bi vî awayî û bi saya serê wê derewa qelew, wan li heremê rûmet girtin, baweriya her kesekî çêbû ko bi rastî jî Sîdar kurê dewlemenda ye û tiştê ew dibên rast e. Sîdar carekê duduyan ji bo karekî taybetî çû Ankarayê. Çûyin û hatina wî ya Ankarayê, bawerî da der û dorê ko bi rastî Sîdar unîversîteyê dixwîne, loma wan hîn bêtir rûmeta wî girtin. Ji xwe li here-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

meke şûndemayî, qedr û qîmeta, doktor, hemşîre û kesên xwendevanên unîversîteyê gelek in.

Ew derewa wan bi awayekî qenc, di nava rûniştevanên wê herêmê de bi cih bû, Sîdar têkilî û hereketên xwe weke yên kurê zaroyê dewlemendan dikir, her dem wî kincin paqij û xweşik, yên xwe yên berê, li xwe dikir. Bêrîk vala bû, lê wî her dem peyvên qelew dikir. Bi vî awayî û bi saya serê wê derewê îşê wan baş bû, serda jî xelkê navçê hîn hêvî jê dikirin û jê alîkarî dîxwestîn, wan dîgot: ji xwe jina wî hemşîre bû, heta ji destê wê dihat, wê jî têkiliyên gelekî germ û xweş bi kesên wê navçeyê re datanî, li wê navçeyê di nexweşxanêeyê de weke hemşîreyekê karkirin bi serê xwe jî rûmeteke mezin bû. Ew navçe gelekî bi şûnde mabûn û tesîra dîn li ser wan gelek bû.

Nexweşxane û sê lojmanên wê, ne di nava nahiyê de bûn, li derî nahiyê di nava daristanê de hatibûn avakirin. Nexweşxane li pêşiyê bû, di dû re lojmana Doktor a hemşîrê û ya din jî ya dadûkê (ebe) bû. Êdî Sîdar û malbata xwe jî li wir bi cih û war bû bûn, tiştên wan yên hundurê malê, yên di dema zewaca wan de mabûn. Ji ber ko wan ew tiştên xwe, di dema zewaca xwe de kirîbûn, piştî girtina Sîdar, Hava jî mala xwe dabû ser hev û çûbû cem kekê Sîdar yê mezin, ji ber vê yekê bû ko hîn tiştên wan nuh dihatin xuyakirin û bi kar nehatibûn anîn, bi xêra nuhbûna wan alavan, mala wan xweş bû bû. Wan ew ji Diyarbekrê tevî xwe anîbûn. Ji xwe tiştê ji wan re bû alîkar, kincên Sîdar yên nû û eşyayên mala wan bûn, kesên çav li eşyayê mala wan û kincên Sîdar diketin, baweriya wan zêdetir dibû.

Her sibe Hava dest bi kar dikir, Sîdar û keça xwe li mal diman, heta ji destê Sîdar dihat wî bi her awayî di karê malê de alîkariya hevala xwe dikir, bi keça xwe re dilîst, di demên xwe yên vala de jî pirtûk dixwend, dema hina dipirsîn:

— Gelo ew çi pirtûk in tu dixwînî.

— Ez dersên xwe dixebitim, da ko ez, zû universtitêya xwe biqedînim, digot. Sîdar:

Li wê nahiyê, her roj saet sisiyên piştî nîvro, kar diqediya. Piştî qedandina kar kesên memur diçûn qahwexanê. Li wir qahwexaneyek bi taybetî bû bû weke ya hemû memûrên nahiyê. Piştî qedandina karê nexweşxanê car carna Sîdar û diktor û car carna jî Sîdar û memûrên din bi hev re diçûn qahwexanê. Bi vê munasebetê navbera Sîdar û karmendên nexweşxanê germtir bû bû.

Di nava memûrên navçê û di herêmê de Sîdar merivekî dewlemend û xwenda dihate naskirin. Hurmet û hezkirina rûniştvanên wê heremê li hemberî Sîdar roj bi roj zêdetir dibû. Ji ber ko wî gotibû ko ez rojnamegeriyê dixwînim, gelek caran hin kes dihatin ba wî û digotin: »Sîdar beg, eger te bi xêr xwendina xwe kuta kir, bûyî rojnamevan, ji kerema xwe re derdên me jî di rojnameyan de binîvîsîne ko bila dewleta me li me xwedî derkeve, rêyên me çêbikin.«

Gelek peyvên mirovên navçê dihat guhên Sîdar ko digotin:

»Mêrê hemşîra me, gelekî dewlemend e, malbata wî ji wî re gelek peran dişîne, ew jî niha universîtê dixwîn e, piştî ko biqedîne wê rojnamevaniyê bike. Loma malbata wî niha nahêle ko ew li ber destê kesên din kar bike«.

Di vê bîr û baweriyê de wan, jiyana xwe ya biyanetiyê ya cara yekem qasî 6-7 meha domandin. Jiyana wan bi awakî weha xweş hate domandin ko tu nema bû Sîdar biba mezinekî ji wir. Komutanê qerekola leşgeriyê ya li wir bi xwe jî kurd bû, komutanê qerekolê ne digot ez kurd im û wî tu daw û doza kurdiyatiyê nedikir, lê ji ber ko ew ji bajarekî Kurdistanê bû, her kesên wê heremê ji wî re digot in ku:

— Komutanê me bi xwe kurd e.

Du kesên ko ji bajarekî Kurdistanê bûn, di fabrîka çayê de weke teknisiyen kar dikirin. Bi vî awayî têkiliyê Sîdar û yên wan herdu kesên kurd û komutan bi hev re çê bûn, hevala Sîdar jî bi pîreka komutanê wir re têkiliyên xweş û dostanî danî, bi saya têkilêyên Hava û pîreka komutan, navbêra Sîdar û komutan hîn germtir bû. Bi saya van têkiliyan û bi hin tesadufan, li wir her ko çû, navbêra Sîdar û memûrên wir xweş bû, di derheqê wî de kesî nema şik dikirin, ji ber derewa ko wan kiribûn, cihê xwe girtibû û êdî kesî pirsa, »çima mêrê hemşîrê kar nake« ne dîkîrîn. Eger hinên nû ji rûniştvanên wir bi rewşa Sîdar nizanîbana, kesên din ji wan ra weha îzah dikirin:

»Sîdar yanî mêrê hemşîra me, ji malbateke gelekî dewlemend e û ew bi xwe universîtê dixwîne, ev sala wî ya dawî ye, ko ew ê bibe rojnamevan«.

Sîdar, li wir him bû bû beg û him jî mezin bû bû, li gor wê mezinbûna xwe jî wî rûmet girtibû, lê dema mirov li jiyana wan î li wir mêze dikir, ko bêrîk vala û gelek caran zik birçî bûn, bi xêra mala xezûrê Sîdar, bi du zikê birçî yekî têr jiyana xwe li hemberî hemû derd û êşan didomandin, bi anîna erzaqên ji mala xezûrê xwe, di mala wan de tiştên xwarinê peyde dibû. Ji ber ko li Trabzonê baxçê mala xezûrê wî hebû, wan her tiştê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xwarinê ji wir dianîn. Her çiqa du zik birçî û yek têr bû jî, dîsa Sîdar zêde xem nedixwar, lewra ev jiyan, ji ya girtîgehê gelek qenctir û baştir bû, qe ne be lêdan û tirsa kuştinê tunebû.

Hevala Sîdar, Hava, ji bona hezkirina mirovên wê navçê bigire, gelek caran zêdeyî taqeta xwe kar dikir. Bi kesên ko dihatin nexweşxanê re, bi hurmet û rûmeteke mezin eleqedar dibû. Hemû rûniştevanên nahiyê û her weha gundên der dora wan hemiyan navê hemşîra nuh ya ji bona nexweşxana wan hatiye bihîstibûn, kesên ji vê rewşê ne agahdar bana jî, ji yên din dibihîstin. Bi saya serê wê derewa wan û hemşirebûna pîreka Sîdar, ew êdî ketibûn nav memurên nahiyê, roja ko Sîdar neçûya qahwexanê geleka pirsa wî dikirin û digot in:

»Gelo çima îro Sîdar Beg nehatiye«.

Sîdar, çûyina xwe ya Ankarayê weha dianî zimên: »Ez qet ji bîr nakim, ko carekê çûme Ankarayê, berî çûyina xwe bi mehekê min ji der û dora xwe re gotibû ko îmtihanên min hene divê ez vê meha pêşiya me herim Ankarayê û têkevim îmtîhanên xwe, bi vê derewa cara dudan, him xwendevantiya min dihat îspatkirin û him jî çûn û hatina min bi rûmet û bawriyeke din dabû kesên wir.

Ez ji bo karekî xwe çûbûm Ankarayê, qederê 20 rojan li wir mabûm dema vegeriyam malê, weke rojên berê, piştî qedandina karên resmî ez jî weke her memûrekî, weke her car çûme qahwexanê, kesên wir bi dengekî berz, yeko yek xêrhatin dan mîn û hatin destên min girtin, pirsa îmtîhana min kirin...

Li wir şansa me baş çû bû, her weha gelek tesadufan jî alîkariya me kiribû, qaymeqamê qezê kurd derket, lê ew kes ne mirovekî qenc bû, ji ber ko ew jî ji bajarekî Kurdistanê bû, dihate gotin ko ew kurd e. Car carna gundî dihatin ba min, tika ji min dikirin û digotin: »Em hatine ba te, ko tu ji qaymeqamê hevwelatiyê xwe re bêje ko bila rêya gundê me çêbike.« Wan wer bawer dikirin ko ez ê bikaribim vê yekê bikim. Carna jî gundî dihatin ba min giliyê komutan jî dikirin. Tiştê herî baş ew bû ko navê min û yê hevala min li wê navçeyê bi awayekî gelekî baş hatibû belavkirin. Rûniştevanên wir ji hev re digotin:

»Ev hemşîra ko ji me re hatiye, firset û qismetekî qenc e, divê em vê firsetê baş bi kar bînin, qedr û qîmeta wê baş bigrin, belkî bi saya mêrê wê, em bikaribin rêya gundê xwe bidin çêkirin«. Û her weha axaftin û peyvên weha roj bi roj bêtir belav dibûn.

Her roj ji serê sibê heta saet 15.00-an ez û Rojbîna xwe, em li mal di-

man, dema roj germ dibû, min pirtûkek digirt destê xwe, kursiyek datanî derve, di bin wê tava germ û xweş de dest bi xwendinê dikir, kesê ko ez didîtim digotin, belkî ez dersên xwe çêdikim, ji ber vê yekê, xwendina min zêde bala kesî nedikişand.

Rojekê dîsa ez li derve rûniştîbûm, min pirtûk dixwend, him dixwend û him di nava ramanên bê binî de ez çûbûm dinyayeke din, ko gelo em ê çi demê ji vî halî xilas bin, gelo wê kengî dawiya vê rewşê bê. Carna min xwe ji ramanan azad dikir, xwendina xwe didomand, carna jî çavê min diçû ser saetê bê ka hela ew bû ye çi? Di nava raman û xwendinê de, dengek hate guhê min: »Sîdar Beg, Sîdar Beg« dema min serê xwe rakir, leşkerek nêzîkê min bû got: »Sîdar Beg, qomûtanê me got, here banî Sîdar Beg bike bila hetanî vir were« bi qedandina gotina wî nava min kir gupînî, tirs û xofekê ez girtim, ez ketim xeml û xeyalan. Min weha texmîn kir ko ji Diyarbekrê xebera girtina min hatiye, loma komutan şandiye pê min û bi awayekî tirs min ji leşker pirsî:

— Xêr e, gelo ji bo çi ye?

— Ez bi xwe nizanim, tenê komutan gote min »her banî  Sîdar Beg bike«.

— Baş e, here ez ê gaveke din werim. Min got.

Gotin rehet bû, lê piştî çûyîna leşker, xwêdaneke cemidî ez girtim, dilê min çû û hat. Min pirtûka destê xwe danî, kursiya xwe bir hundir, qederekê li hundir rûniştim. Rojbîna min li dora min çû û hat, wê dixwest ko em weke her car ji xwe re bilizîn û heneka bikin, taqet bi min re nemabû. Min bi dilekî sar û tirseke mezin, kincên xwe yên paqij li xwe kir, ji mal derketim, çûme nexweşxanê, hinda hevala xwe, min ji wê re got: » Hava Komutan şandiye pê min divê ez herim, bê hela xêr e«. Hevala min jî tirsiya, devê xwe vekir ko tiştekî bêje, ez li bendê nesekinîm û ketim rêya qerekolê.

Saet li dor sisiya bû, qerekol li aliyê din î nahiyê bû. Yanî nahiye di orta qerekolê û nexweşxanê de dima. Serê min di ber min de û bi gavên hêdî hêdî dimeşiyam, min ne dixwest ko dawiya vê riyê bê. Bi wan xof û xeyala, bi wê tirs û heyecanê ez gihiştim qerekolê.

Qerekol li cihekî bilind hatibû çêkirin, dora wê baxçe, rêya wê çêkirî bû. Di nava wê daristananê de, xaniyekî ji betonê avakiribûn, dora wê ji kevirên reş, weke sûrekê hatibû çêkirin û ew kevirên reş, ji serî hetanî nêvî, boyaxeke sipî kişandibûn ser. Bi xebata leşkeran, hewş, der û dora qerekolê gelekî xweş bû bû, hewşeke mezin çêkiribûn. Di orta hewşê de



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

holikek ko ji dara mêwê hatibû pêçandin hebû, di bin holêkê de, masayek û şeş kursî hatibûn danîn. Ev cara yekem bû ko ez diçûm wir. Li dor maseyê çend kesên bi kincên paqij û kravat rûniştî bûn. Dema ko çavên min li wan ketin tirsa min zêdetir bû, çongên min ricifîn, min weha baweriya xwe anî ko wan ev hazirî ji bona min dane çêkirin ko îfada min bigirin û min bibin Diyarbekrê. Tirseke weha ez girtim ko bi zorê min xwe li ser piyan girt. Du kesên bi kravat û bi kincên xweşik yên di nava wan da, gelekî bala min kişandibû hebûn. Yek ji wan simbêl zer bû. Dema çavên min li wî ketimn ew kesên li işkencaxaneya Diyarbekrê ko simbêlên wan zer bûn, hatin bîra min. Dinya li ber çavên min tarî bû û wê demê te kêr li min bixista xwîn ji min nedihat. Xwêdaneke sar ez girtim, min ne dixwest ko ez ber bi masayê herim. Xwestina min î wê demê ew bû ko erd veqelişiya û ez tê de wenda bibama. Tirsa min ne işkence û lêdana wan bû, tirsa min ew bû ko ew derewa me kiribû, wê derketa û piştî wê derewê Hava û Rojbînê wê nikarîbana li wir jiyana xwe bi awayekî normal bidomandana. Tirs ew bû ko ew ê cara dudiyan bi min re perîşan bibana. Eger em li Diyarbekirê bana xem tunebû, lê li vir, wê ji bona qîz û hevala min gelekî zehmet ba. Hîn ez di van xem û xeyalan de bûm ko bi dengê komutan hatim ser heşê xwe ko ew dibê:

— Ooo Sîdar Beg! -Berê xwe bi wan kesên rûniştî vekir û domand. Sîdar Beg ev e.

Komutan ji cihê xwe rabû hate pêşiya min destê xwe dirêjî min kir û xêrhatineke germ da. Bi wê xêrhatina wî re ez hebekî hatim ser heşê xwe, me destên xwe dan hev, min jî wî re got:

— Xêr e, komutan, te şandiye dû min?

Min dixwest ko beriya her tiştî rewşa xwe fêr bibim ko bê hela wî ji bo çi şandiye dû min. Berî ko ew biaxife, destê me di destê hev de em bi hevre nêzîkî masê bûn, ew kesên rûniştî rabûn, destê xwe dirêjî min kirin, bi destdirêjkirina wan komutan axifî û em bi hev dan naskirin. Û got:

— Sîdar Beg, ev herdu kes, hevwelatiyên te ne, ew ji bajarê Muşê ne. Û zîvirî ser wan û axaftina xwe domand. Sîdar ev e, ew bi xwe ji Mêrdînê ye.

Ez ji wê tirsa ko bême girtin xilas bû bûm, heşê min hate serê min, kêfa min hat, bi avîtina wê tirsê, bi awayekî kêfxweşî min halê wan, wan jî halê min pirsîn. Ew herdu kes di fabrîka çayê de teknîsiyen bûn. Dema me baş hevûdu nas kirin, kêfa min zêde, tirsa min kêm bû.

Komutan gazî leşkerekî kir, leşker hate ba me silaveke leşkerî da û got:

— Emir bike komutanê min.

Komutan zîvirî ser min û got:

— De ka bêje tê çi vexwe.

Min Coca Cola xwest, piştî wê tirs û sitresê vexwarina tiştekî sar we gelekî baş ba.

Êdî bi awayekî bê tirs me dest bi sohbeta xwe kir, piştî vexwarina cola yê leşkeran ji me re çayeke xweş jî çêkirin. Hîn me çaya xwe vedixwar, ko du mezinên nahiyê jî li me bûne mêvan, komutan em bi hev dane nasandin. Sohbeta me her ko çû germtir û xweştir bû. Hatina wan herdu kesên mezinên wê heremê ji bo min firseteke hîn baştir bû. Di dema sohbet û çay vexwarinê de, kesekî ji rûniştevanên wir yê nahiyê hat û ji nobedarê leşker re got:

— Ez dixwazim komutan bibînim. Ji xwe me jî ew kes didît hema komutan gazî wî kir û got:

— Ka were hela te xêr e?

— Komutanê min beytarê me ji qezê hatiye vir û gote ko eger karê komutan tune be ez ê werim, çayeke wî vexwim.

Bi qedandina gotina wî, komutan gotê:

— Here bila zû were ji xwe va ye çend hevwelatiyê wî jî li vir in, firset ev firset e, hemû hevwalatî li vir in.

Piştî qederekê beytar jî hat, min û wî cara yekem bû ko me hevûdu didît. Komutan em bi hev dan naskirin, kêfa me herduyan jî hat. Piştî xêrhatinê, min û wî hebekî sohbet kir. Ew bi xwe ji Ruhayê bû û kurdî jî zanibû, demeke gelekî dûr û dirêj çê bû bû ko ez bi kurdî neaxifîbûm. Wê êvarê min dilê xwe rehet kir. Ji xwe komutan gelekî aciz bû bû ko dema min û baytar, me bi kurdî qise kiribû. Lê komutan ew nerazîbûna xwe ya wê rojê, piştî çend rojên din ji min re gotibû .

Me hemûyan bi hev re şeveke gelekî xweş û rind derbas kir. Hinek kesan gelek vexarin, ji xwe derbas bûn, hin li ser heşê xwe bûn. Komutan jî ji ber axaftina min û baytar ya bi kurdî gelekî aciz bû bû, loma wî ew acizbûna xwe bi vexwarina wiskiyê dabû veşartin.

Qerekol di nava daran li ser girekî bû, hewşa wê weha çêkiribûn ko dema mirov li wir rûnişta, hemû nahiye dihate dîtin. Bayekî hênik dihat, li wî cihê hênik, sohbet û rûniştin gelekî xweş bû. Em bi hev re ketibûn sohbeteke gelekî xweş. Saet ber bi pêş diçû, di wê xweşiyê de min xwe ji bîr kiribû ko xeberekê bişînim mal da ko di hatina min î vir de tu tiştekî bi tirs tuneye. Wê sohbeta me ya xweş û delal hetanî destê sibê domand, piştî qedandina çend şûşeyên wiskiyê, em ji hev belav bûn.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dema ez hatim malê, hevala min hîn ranezabû, ew bi tirsa ko ez ê dîsa bême girtin li benda min sekînibû ko xeberekê bigire bê ka rewş çibû? Rebena hevala min ji tirsa ko ew ê min dîsa wenda bike xew bi çavê wê neketibû. Hezkirineke wê î gelekî zêde ji min hebû. Wê her dem dixwest ko ez li ba wê bim û em bi hevre hesreta wan salên buhurî derxin. Qasî ko ji min hez dikir û ne dixwest ko min tucarî wenda bike, ewqasî jî dixwest ko ez karê xwe yên siyasî bidomînim. Ew tucarî têkilî nava karê min î siyasî nedibû, eger tiştek ji destê wê bihata, wê jî qasî taqet û hêza xwe alîkariya min dikir.

Roja din, li nahiyê hate belavkirin ko beytar jî hevwaletiyê min e. Her ko çû rewşa min baştir dibû, qedr û qîmeta min zêdetir dibû. Li aliyê din rewşa me ya ko ji kesî ve ne xwuya û, gelekî zor bû. pereyên me tunebûn, gelek caran em hesrata nîv kilo goşt bûn ko em ji xwe re bikin şîv. Êvaran dema ez ji qahwexanê vedigeriyam malê, Rojbîna min dihat pêşiya min û digot:

— Bavo ka te ji min re çi anî. Weke her car dilê min dişewitî, kizinî ji nava min dihat, tenê min digot:

— Min îro ji bîr kir, ez ê sibê ji keça xwe ra bînim.

Rojbîna min ketibû sala sisiyan, wê hîn nizanîbû ko bê peretî çi ye û çi-lo ye. Dema min ji wê re bigota ko pereyê min tune ne, wê dikarîbû ji hinên din re bigota ko » Pereyên bavê min tune ne loma ji min re şekir nakire« min bi vî awayî Rojbîna xwe gelek rojan dixapand. Ew her êvar li benda min disekinî ko ez ji wê re tiştekî xwarinê bikirim û bibim. Hin ro-jan min jê re dikirî, lê wê jî her roj dixwest, ma di wê tunebûnê de kê karîbû her roj tişt bikiriya.

## II

Rojên xweş, dema tavê pencên xwe yên germ berra erdê dida, min Rojbîna xwe dişand nava zarokan ko ew ji xwe re bilîze. Û pirtûkek digirt, derdiketim derve û dest bi xwendina wê dikir. Bi vî awayî heta saet dibû sisê, êdî min dev ji xwendinê berdida û berê xwe dida qahwexanê. Ev hal bû bû weke karê min î rojane. Herkesekî baweriya xwe anîbûn ko ez dersên xwe dixebitim, loma tu kes heta saet sisiyan bi ser min de nedihat.

Nexweşxane li aliyê bajêr î hêla rastê, li ser girekî bilind hatibû çêkirin, ji xwe hemû heraêma Derya Reş bi xwe tev gir û dar in. Cihê nexweşxanê cihekî xewle bû, ew bi awayekî modern, hatibû çêkirin, cihê wê fireh, der dora wê bi darên çamê hatibûn xemilandin. Riyên hemû gundên wê der û dorê di ber wê re derbas dibûn. Ew kesên ko karê wan li bajêr tune ba, ji xwe hewce nedikirin ko herin nava bajêr. Pêwîstiyên xwe li nexweşxanê diqedandin û vedigeriyan gundên xwe.

Tiştê herî balkêş ew bû ko her roj di eynî dem û saetên serê siban de, xortekî yanî kesekî temenê wî li dora 25-30 salan bû ko di ber nexweşxanê re derbas dibû, diçû ser wî girê li hemberî nexweşxanê û heta tarî diket erdê li wir dima û piştî ko tarî diket erdê bi şûn de vedigeriya. Piştî çendaekî, êdî çûyin û hatina wî kesî bala min kişand ko ev mirov dihere û tê, ew ne weke kesên ji gund dihatin, ew mirovekî xemgîn bû, ji ber ko her dem serî wî di ber de silav li kesî nedikir, diçû û dihat, car carna wî li hêla mala me dinerî, weke bibêje »wele ez dixwazim werim hinda we, lê ez nikarim«. Ji roja ko em li wir bi cî û war bû bûn, rewşa wî ketibû ber çavên min. Ewilî ez li wî ketim şikê ko ew ji ber jinên ko li nexweşxanê kar dikin diçe û tê, lê kesên kar dikirin, weke hemşîre, jina min û weke dadûk hebû, lê ew jî bi karmendekî nexweşxanê re zewicî bû. Ez gelekî fikirîm ko gelo têkiliyên wî bi dadûkê re heye, an wî çav berra jina min da ye.

Di demên ko tavê pencên xwe bera erdê dida, der û dora xwe germ dikir, min jî dixwest ko hesreta çend salên di girtîgehê de yên ko bê tav


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mabûm derxim. Loma min kursiyek derdixist, pirtûkek jî dikir destê xwe û di bin wê tava xweş û delal de dest bi xwendinê dikir. Îro jî taveke xweş hebû, loma min haziriya xwe ya derve qedandibû û xwe li ser kursiya xwe bi cih kir ko dest bi xwendinê bikim. Min rûpelên pirtûkê di ser hevde dibir û dianî, qet sebra min ne dihat ko ez bixwînim. Lê dîna min dît ev bû, ew ew kesê ko her roj di vir de derbas dibû, cixareyek xiste devê xwe û ber bi min hat, dema ew li gel min rawestiya û got:

— Gelo agirê te heye ko ez cixara xwe pêxim.

Min çeqmaq derxist û min xwest ko ez bi xwe cixara wî pêxim, dema wî xwe bi alî min de daqûl kir û bi awayekî nizm got:

— Derdê ko ez têdeme gelekî giran e. Qasî ko min bihîstî ye, tu dibistana rojnamavaniyê dixwînî, de ka were ez ji tere vî agirê ko ez di nav de dişewitim bêjim.

— Tu di nav çi agirî de ye, xêr e?

— Agirê ko ez di nav de me kes pê nizane. Ez dixwazim vî agirê ko ez şewitandime, her kesek pê bizanibe, daxwaza min ji te ew e ko tu guhdariya min bikî û tiştên ko ez ê bejim, weke ko ez dibêjim binivîsînî.

— Bila be, hema tu çi demê dixwazî, em dikarin dest pê bikin.

— De baş e, hema serê sibê piştî ko ez ji vir derbas bûm tu jî li dû min were. Qelem û defterê ji bîr neke?

— Baş e, tu qet meraq neke.Û wî da rê û çû, piştî wî jî ez ketim ramanên bê binî, ramanên hûr û kûr, min gelek meraq dikir ko gelo ew ê çi ji min re bêje. Gelo çima wî xwest ko tiştên xwe ji min re bêje.

Rojtira din piştî çûyina wî, min kursiya xwe xiste hundir, pirtûka xwe danî, berê xwe da nexweşxanê çûme ba hevala xwe û min ji wê re got:

— Wa Hava vaye ew mêrikê ko min do behsa wî ji te re kiribû çû, ez ê jî piştî qederekê herim, tu li Rojbînê miqate be.

— Bila be tu qet xema nexwe, bi xêr here û bi xêr were.

Ez ketim rê û min berê xwe da girê li hemberî nexweşxaneyê. Min dît ko ew kes li wir, li bin darê rûniştî ye û li benda min e. Wî xêrhatina min kir, me berê hinek sohbet kir, berî ko em dest bi axaftina bikin, min xwest ko fediya wî rabe, loma min berî wî dest pêkir û got

— De va ye ez hatim, tê ji min re çi bêjî. De fermo.

— Tu bi xêr hatî.

— Tu di nav xêrê de be.

— Qurban ez tu xêr mêrê naxwazim, gunehkariya min kiriye, bi tu xêrê nayê şûştin.

Mebesta wî diyar bû, wî dixwest biaxife, tiştna ji min re bêje, min jî weke rojnamavanekî jî wî pirsî, ko em derbasî mijara ko ew dibêje, bibin.

— Ma gelo dê û bavê te sax in?

— Belê.

— Hûn çend bira ne.

— Ma tê çi bike ko em çend biran ne? Ji bo wan ez û ji bona min ew qediyan ne. Niha dê û bavê min, min weke ewladekî nahesibînin. Xwişk û birayê min jî ji min direvin. Ew jî naxwazin bi min re qise bikin. Lê heqê wan heye. Ji ber ko min gelekî dilê wan hişt, min gelek tade û işkence da wan.

— Çima sebeb çi bû ko te tade da wan?

Piştî vê pirsa min, ew rawestiya, cixareyek pêxist, ew bi hêrs dikişand, bû ofe ofa wî, rûyî wî sor û mor bû, kelogirî bû, xwest bigirî, lê tenê bi çend hêsirên girover hêrsa xwe daxist. Rahişt darikê xwe serê xwe bera ber wxe da û dest bi kolana erdê kir û got.

— Belê qurban ji xwe tiştê ko dixwazim ji te re bêjim ev e. Û dest pê kir got:

“Ez ji gundekî der dora Derya Reş im. Li wir hatime dinyayê, xwezî ez nehatibama dinyayê ko min ew bobelatên di girtîgeha Diyarbekrê de dianî serê ew mirovên qenc nedîta. Wê gelek baştir ba ko min bikarîba uzrê xwe ji wan kesên ko min bi xwe gelek tade û işkence bi wan kiriye bixwesta. Lê ez baş dizanim ko bi uzirxwestinê ew bobelatên ko me dianî serê wan kesan, ez ê nikaribim xwe ji wê berpirsiyariyê xelas bikim. Ne ko ez ditirsim û loma vê yekê dibêjim, tiştekî ko ez jê bitirsim nemaye, ji ber ko min hemû hebûnên xwe wendakirine. Tiştekî ko ez pê bigirim jî nemaye. Hele hele ji kuştinê qet natirsim«.

Di virde weke bêje, »biner ez ê ji te re her tiştî bêjim, tiştên ko wê bête serê min jî ez bi xwe nema jê ditirsim, tenê dixwazim ew tiştê ko di tariyê de mane, derxim rohniyê«. Û axaftina xwe berdewam kir:

»Ew kultura û zanabûna ko di girtîgehê de didan me weha bû, ko diviyabû em ew kesên ko li wê girtîgeha bi nav û deng ya Diyarbekirê gardiyan bûn, pêwîst bû ko me lêdan û tiştên nebaş bigotana ko çavên mirovên li wir girtî bitirsanda. Ew kultura ko me li wir girtibû, bingehê tiştê xerab û nebaşiyê bûn, ew kesên ko fêrî wê kulturê dibûn zû bi zû nikarin xwe ji wê xerabiyê azad bikin. Eger tu li min guhdarî bike, ez ê


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

van ji te re yeko yeko şirove bikim ko ew tiştên me gardiyanên girtîgeha Diyarbekrê dikir,in rêz bikim ko sedemên wê lêdanê ji ko dihatin bêjim ko bila herkes bizanibin ko em, ew gardiyanên wira ne bi destên xwe bûn.

Weke min berê jî anî zimên ko ez li gundekî derdora Derya Reş hatime dinyayê. Malbata min ne malbateke dewelemend û ne jî feqîr bûn, îdare me ya rojane bi awakî normal derbas dibû. Em sê kur û çar qîzên malê bûn. Yê mezin ez bûm. Ji ber ko ez ê mezin bûm, di dema min de hîn li gundê me dibistan nehatibû çêkirin, ew kesên bixwestana biçûna dibistanê, pêwîst bû ko biçûna gundekî din xwendina xwe ya ewilî li wir bikirina û dûre rewşa aboriya malbata wan kesan dest bida, malbata wan li bajêr odayek ji wan re kirê dikirin û wî/wê li wir xwendina xwe didomandin.

Ji bo min yek ji vana derbas nedibû. Ne malbata min dikarîbûn min li bajêr bidin xwendin û ne jî ez karîbûm biçûma gundekî din. Ji ber ko karkerê mala me tenê ez bûm, dema ko ez jî biçûma xwendinê kesekî ko alîkariya bavê min bikra nedima. Loma bavê min ez neşandim dibistanê û ez li ba wî weke karker xebitîm. Me bi hev re debara malê dikir.

Ew xebata me bi hindikayî ba jî debara me dikir.. Ji ber ko ez êdî bû bûm xebatkarê malê, min êdî alîkariya aboriya malê dikir, loma mafê min î biryardayînê di mala me de hebû. Bavê min êdî guhdariya min dikir. Min jî xwest ez vî mafê xwe ji bona xwişk û birayên xwe bi kar bînim. Loma min xwest ko ew herin dibistanê, dema min ev nerîna xwe ji bavê xwe re got, bavê min ewilî li dij derket û got: »biner kurê min, em ne ewqas dewlemend in, em ê nikaribin wan bidin xwendinê, çûyina dibistanê mesref ji re divê, pere ji re divê, li bajêr xanî kirêkirin jê re divê, di bin van mesrafan de em ê herin xwarê, ka bihêle bila ew jî bi me re kar bikin, wê rewşa me baştir bibe«. Min ev mazerata bavê xwe qebûl nekir û min ji wî re got: »Bavo ez her tiştê wan didim ser xwe, ez ê hîn zêde kar bikim, ez nahêlim ko ew li me bibin serbar, bi xebata xwe ya zêde, ez ê mesrefên wan derînim. Tenê tu bêje erê, yên din hemû ez diqedînim.« Min bavê xwe razî kir, ew hebekî nerm bû û got: »Baş e, kurê min tu dizane, lê rojekê em têkevin tengasiyê, ez ê vê bînim bîra te«. Dema mesrefên xwişk û birayên min yên dibistanê kete hustiyê min, êdî rehetbûn ji min re nema bû, barê min gelekî giran bû bû, lê çi dibe bila bibe, daxwaza min ew bû ko ez ê wan bidime xwendinê, loma jî min hîn bêtir dest bi xebatê kir, êdî ne şev û ne jî rojên min hebûn. Hema hema mirov dikare bêje ko ez bi şev û roj dixebitîm, bi vê xebata zêde ez ketim sala bîs-

tan. Temenê min bû bû bîst, berpirsiyariya min girantir bû bû, ji ber ko bi saya wê xebata min, xwişk û birayên min li bajêr xwendina xwe didomandin, min nedihişt ko ew hewcedarî tiştekî bi bin. Lê temenê min bû bîst, divê êdî ez biçûyama leşkeriyê, leşkerî jî weke deynekî dewletê li mirovan e..

Dema behsa leşkeriyî dibû, ez bi xwe gelekî ditirsiyam, ji ber ko ne xwendin û ne jî nivîsandina min hebû. Yanî ji min re cahil dihate gotinê, ez cahilê xwedê, ez ê li leşkeriyê çi bikim, di nava hevalan de rojên min ê çawan derbas bibana! Ma gelo ez tenê vêya difikirîm, na, na, ne tenê ev bû, derdê herî giran pere bû. Di serê min de her gav ev derbas dibû ko »gelo dema ez herim leşkeriyê kî yê ji min re perayan bişîne? Ez ê çawa debara xwe bikim, di nava heval û hogiran da ez ê çi bikim.« Xebata bavê min ancax têrî mesrefa xwişk û birayên min û malê bikira. Ji xwe wî hercar ji min re digot: »Te nehişt ko ev zarona ji me re kar bikin, te ew şandin dibistanê, ji ber vê yekê ye ko rewşa me ya aborî nebaş e. Eger wan jî weke min û te kar kiribana wê niha tu pêwîstiyên me tuneba. De here leşkeriyê, lê ez ê nikarim te li wir bi awayekî qenc xwedî bikim, tiştê ko ji destê min bê, ez ê ji te re bişînim, divê tu jî îdara xwe li gor pereyên xwe bike«

Roj di ser rojan re derbas dibûn, roja leşkeriya min hat û weke hemû heval û hogirên xwe min jî xatir ji dê, bav, xwişk û birayên xwe xwest. Ketim rê. Min berê xwe da wî bajarê ko cara yekem bû ko min navê wî dibihîst. Dema min navê wî bajarî bîhist tirsê ez girtim, lerzîn kete nava min, çûyina wir ji mirinê xerabtir bû, lê êdî veger tune bû, hêsirên diya min weke xulorîkên baranê di ser hinarikên rûyê wê de dihatin xwarê., Bavê min car-carna bi wê re dixeyîdî û car-carna jî ji min re digot:

— Kurê min leşkerî deynê zilaman e, ew kesê ko leşkeriyê neke ne zilam e, tu guh nede diya xwe, ew ji ehmaqiya xwe digirî.

Her çiqas bavê min dixwest moral bide min jî alîkarî nedikir, min berê xwe da wî bajarê biyanî û nava wan mirovên li wir dijiyan ko digotin »ew kesên ko li wir dijîn ne weke merivan in, ew dikarin mirovan bixwin, wehş in, hov in û hew«. Dema wahşbûn û hovbûna wan dikete bîra min, xwêdaneke cemidî ez digirtim. Nigê min dirincifîn, ji tirsa wan kesên hov û wahş taya sar dihate min.

Bi gazîkirina haparlorê ez hatim ser heşê xwe ko êdî otobusa me dike here, cara dawî min herkes dîsa maçî kir, te digot qey ez dikim herim û venegerim. Ez bi xwe ketim rewşeke wer, ko min digot qey ez diherim mirinê, ez diherim riya çûyinê û nehatinê. Ez wer bawer dikim ko bavê

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

min ev rewşa min famkiribû loma got:

— Kurê min dema te xwe gîhand cihê xwe hema zû bi zû ji me re xeberekê bişîne ko em bizanibin te xwe gîhandiye cihê xwe. Dûre xwedê mezin e, qet xema mexwe, du sal wê weke avê derbas bin. Hew dîna ko te dît qediya.

Axaftina bavê min ya dawî weke zengilekî di guhên min de lêxist, »xema mexwe, du sal wê weke avê derbas bin«. Min jî dixwest du sal weke avê derbas bin, min dixwest ko ez ji vê gotaina bavê xwe bawer bikim, lê bawerîkirin zehmet bû. Ji ber ko li Diyarbekrê ne du sal, du roj jî derbas nabe, di nava wan hovan de, ma gelo wê dem çawan derbas biba. Bi vê bêhêvîtiyê min xatir ji wan xwest, li otobusa xwe siwar bûm, di ramanên kûr û hûr de min dinya xwe wenda kir. Otobus dihere an sekiniye min nema zanîbû, tenê dema deng bi miawîn ket, digot:

— Em ê 30 deqîqan li vir rawestin û çay ji kîsê şîrketê ye.

Bi wî dengê ko ji hoperlorê derket, hatim ser hişê xwe, min çavên xwe vekirin, çûme avrêjê; dûre min rûyê xwe şûşt, li dora xwe mezê kir ko ev cih, cihekî biyanî ye. Dinya tarî bû bû, ji tarîbûna dinyayê, têgihîştim ko em gelekî hatin e. Her kesekî pêwîstiyên xwe pêk dianîn, hina limêj dikirin, hina xwarin dixwarin, hina çay û vedixwar in, ez bi xwe birçî bûm, cûze cûza zikê min bû, lê ji derd û qehra, min nikarîbû tiştekî têxime ber dilê xwe, zikê min vala bû, lê madê min tiştek nedigirt. Ji dilva xwarinê min jî weke hin kesên diçûn camiyê, misînek girt destê xwe, bi awayekî nîvco destlimêj girt, destlimêj çawan dihat girtin, min bi xwe baş nizanîbû. Ji ber ko heta wê rojê min qet limêj nekiribû. Min li der dora xwe nihêrt ko bê ka kesên din çawa ndestlimêj digrin û li mêj dikin ko ez jî weke wan bikim. Hemûyan xwe xwar dikirin û rast dikirin, dûre bi eniyan diçûn erdê, di devê xwe de tişt digotin, lê çi digotin min ew jî nizanî bû. Berî ko hinek bi halê min î şaşo maşo bihesin min, weke wan kir û tenê min jî digot:

— Xwedêyo! tu min ji vê belayê xelas bike. Ez ê di nava wan wahşan de çi bikim, ez ê çawan du salan biqedîninm Yarebî, xwedêyo tu li min were rehmê! Amîn.

Bi vî awayî ta ko dengê haparlorê kete guhê min qêrînî jê dihat û digot:

— Otobusa »Ulusoy« ya ji Trabzonê hatiye û dike here Diyarbekrê, di hereketê de ye, bila rêwiyên otobusê swar bin, otobus di hereketê de ye. Oxira we ya xêrê be.

Min êdî dev ji limêja xwe berda, bi bazdan hatim li cihê xwe rûnştim, dîsa ketim xem û xeyalan.

Diyar bû ko kêfa şofêrê me li cih bû, zikê xwe dagirtibû, çay û cixara xwe vexwaribû, kasetek xiste teypa otobusê, dengê muzîkê li otobusê belav dibû, te digot qey dengbêj bi halê min dizane û ew li ser min dibêje, wî bi awayekî xweş û rind, derdê ko ez di nav de bûm dianî zimên«.


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## III

»Saet çarê sibê bû ko me xwe gîhand bajarê Diyarbekrê. Berê min li der û dora xwe mêze kir ko bê hêla şikeftên ko ew tê de dijîn çawa ne. Ji ber ko li hêla me digotin: »Ew kesên li wê hereêmê dijîn di şikeftan de ne.« Min ev yeka weha dizanî bû. Lê dema ko min li dora xwe temaşe kir, gelek qesrên bilind ketin ber çavên min, ewilî min bawer nekir ko ev bajar Diyarbekir e, loma min ji yekî pirsî:

— Pismam , ma gelo ev ko der e.

Bersîva wî ew bû:

— Diyarbekir e, Diyarbekir. Qey tu şaş ji otubusa xwe daketiye.

— Na, na.

Bi rastî ez şaş û matmayî mabûm. Min bi xwe re qise kir ko gelo çima li hêla me digotin: »Kesên vir ne xaniyên wan hene û ne jî ew weke mirovan e. Niha dinêrim ko qesrên li vir ji yên hêla me bêtir in, bilintir in û xweşiktir in. Mirovên vir jî weke kesên hêla me ne. Û mirov dikare bêje ko lixwekirina wan, ji yên hêla me xweştir û temiztir in«. Bû niçe niça min, ji ber niçe niça min yek li min haybû ko ez dikim niçe niçe, nêzîkî min bû got:

— Pismam ma te tiştekî xwe wendekiriye?

— Na, na. Min got.

Gelo çima ev derawa hanê li hêla me hatibû bi cih kirin. Gelo ji bo çi, li hêla me di derheqên mirovên vir de weha dihate fikirandin û gotin! Min tu mane neda vê yekê û ji ber ko zêde wexta min tune bû, ez nikarîbûm dûr û dirêj bifikiriyama, tenê karim bêjim ko dema çavên min li wan qesran û mirovên li vir ketim, hinek ken bi rûyê min ket, kêfa min hat ko ew tiştên ji min re hatibûn gotin ne rast in. Lê di navbera van du salên min î leşkeriyê de, wê çi bihata pêşiya min, hîn ne diyar bû, ma kî dizane ko li leşkeriyê wê çi bê pêşya mirovan. Tenê mirov dikare bêje ko dema kesek dihere leşkeriyê ew kes heta taliya temenê xwe serpêhatiyên leşkeriyê dibêjin, lê dîsa naqedînin.

Ez jî weke her rêwiyekî çûme ber otobusê ko çentê xwe ji bagajê bigir-

im, dema ko mawîn çente derxist û berî ko ez çentê xwe bigrim destê xwe, wê demêmin bala xwe dayê ko çend kes li dor min civiyan, her yekî xwe dirîêî çente dikirin, yekî digot:

— Kekê ez ê çentê te erzantir bighînim, cihê ko tê herê. Yê din digot:

— Na ez dikarim hîn erzantir bibim.

Min bi xwe tu tişt ji wan famnekir ko çima ew weha dikin, dûre lê haybûm ko ew kesên weha bi pereyan, yanî bi heq tiştê mirovan hildigrin, bi hilgirtina wan çenteyan û alavan ew ji xwe re çend quruş pere qezenc dikin. Ji ber ko pereyan min zêde tunebûn, min çenteyê xwe hilgirt û ji mawînê otobusê re got:

— Gelo ez ê çawa herim Kurtoglu?

Kurtoglu cihê mîn î ecemîtiyê bû. Ew kaxiza adresa min li ser dirêjî mawîn kir, wî çûyina wir ji min re got, ez li minîbûsê siwar bûm û çûme cihê xwe, cihê tadê û işkencê, cihê ko mirovan weke heywanan jî nahesibînin«.

Dema ew bêjeya navê Kurtoglu ji devî wî derket, bi yek carê rûyê wî hate guherandin, qederekê sekînî, cixareyek vêxist, devê xwe vekir ko tiştna bêje, lê tu tiştek negot, tenê hilmên bê binî li cixara xwe dixist. Li çavên min mizekir got:

— Kurdoglu, Kurtoglu, ma derdê wir, tade û cefayê di wir de dihat kirin ne kêmî ya girtîgehê bûn. Di wir de mirov hatin şewitandin, di wir de gelek kes hatin kuştin, û gelek kes hatin seqetkirin. Ax ax, ez nema dizanim ko behsa kîderê bikim.

Piştî hilmvedanekê wî dîsa domand.

“Êdî rojên min î leşkeriyê destpêkiribûn, weke her kesekî min jî kincên leşkeriyê li xwe kiribûn. Porê xwe bi makîna poran ya 3 nimre kur kiri bû û di nava wan kincan de bû bûm mirovekî din. Gelek kesan dema kincên leşkeriyê li xwe dikirin, ew kinc li bejna wan dihat, lê yên min te digot qey, kinc jî ji min ne xweş bûn, qet li min nehatibûm, ez di nava wan de bû bûm mirovekî din. Heroj piştî xwarina serê sibê me dest bi talîma leşkeriyê dikir, lêdan û işkenceyeke gelek zor jî didît. Ji xwe ew kesê ko leşkeriyê bike û lêdanê nexwin tune ye. Mirovên ko wan bobeletan dibînin, dixwazin bimrin ko leşkeriyê nekin. Ez jî ji wan yek bûm, ne xwendina min û ne jî nivîsandina min hebû, ji ber ko ez li gund mezin bû bûm, min lêdaneke baş dixwar, ji xwe navê min jî cahîl bû.

Di bin darê zorê de û bi hukmê lêdanê, leşkerî dihate kirin, qasî 15-20


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rojên min li wir bû bû ko êdî talîma me di bin kontrola yuzbaşiyekî de dihat çêkirin, her roj ew yuzbaşî dihat û li me temaşe dikir, car carna jî dihat nava me, hal û xatirê me dipirsî. Navê bajarê ko em jê dihatin fêr dibû, bi leşkeran re qise dikir. Rojekê hate ba min û pirsî:

— Tu ji kîjan bajarî hatiye?

— Trabzonê komutanê min.

— Trabzonê ha, got û serê xwe hejand, ez hebekî tirsiyam, gelo ji bo çi wî serê xwe hejand, »Naxwe Trabzonê got«, li min mezê kir bi awayekî nerm û xweş berdewam kir- Trabzon gelekî xweş e, mirovên wê jî gelekî baş û welatperwer in. Ma ne weha ye.

— Belê komutanê min.

— De baş e, baş, ez ê qîmeta te bizanibim. Dûre destê xwe di serê min da, bi awayekî dilpak û rehm li min nerî, û got:

— Tu qet netirse, tu min guhdarî bike, tê li vir bi awakî gelekî qenc leşkeriya xwe biqedîne. Ez ji Trabzoniyan hez dikim, ez wan nas dikim. Ew berjewendiya welatê xwe di ser hertiştî re digrin. Ma ne weha ye?

— Belê komutanê min.

— Aferim kurê min, eger tu li min guhdarî bikî tê qet poşman nebî. Keniya, da rê û çû.

Axaftin û qilafetê wî yê wê demê, hîn jî weke niha li ber çavên min e. Piştî wê roja ko ew li gel min axifîbû, dikarim bêjim ko êdî ew her roj di dema talîmê de dihate hinda min, bi min re qise dikir, gelekî kêfa min jî dihat ko »xwedê dua min qebûl kir û ev mirov ji min re şandiye«. Êvaran dema xwarinê û berî razanê, hevalên min digot:

— Kuro ew yuzbaşî çî yê te, weha nêzîkayê li te dike, te ev bertîl çawan çêkiriye, de ka alîkariya me jî bike...

— Wele ez nizanim, tenê wî ji min re digot ko »ez ji Trabzoniyan hez dikim, hemû jî welatperwer in«.

# IV

»Bi çûyin û hatina yuzbaşî, nava me germ bû bû, kêfa min li cih bû, ji ber ko riya xelasiyê dihat dîtin. Berî ko ez werim leşkeriyê, kesên leşkerî kiribûn digotin: »Li leşkeriyê nasekî meriv di nava serbazan de derkeve, wê demê kêf kêfa meriv e.« Loma kêfa min jî gelekî ji wî yuzbaşiyê re hatibû. Ma min ji ko dizanîbû ko ew kes sadîst e, ma min ji ko dizanîbû ko ew kes, kêş e û min ji ko dizanîbû ko ew dijminê mirovên qenc e, ma min ji ko dizanîbû ko wê bobelatên mezin bîne serê min. Mehek bi ser ecemîtiya min de derbas bû bû. Ew meh li min bû bû weke çend salekê, ji lêdanê mirov ber xwe nedidît. Heroj lêdan tada û zulmdarî hebû, ji ber wê zulm û zordariyê merîv digot: »Bila mirov ji vir xilas be, çi dibe bila bibe«. Rojekê dîsa em li talîmê bûn, ko ew yuzbaşiyê min, ew kesê li gor gotina hevalan, ko mirovê ji alî min de hetiye bertîlkirin, loma weha li min xwedî derdikev e, ew kesê ko min jê hêvî dikir ko ew ê min ji vê zulmdariyê azad bike hat Em hemû leşker di rizê de bûn Wî destê xwe xistibû nav hev û danîbû ser qûna xwe, serê xwe bilind kiribû, li me mêze dikir, wî ji nava me çend kes destnîşan kir. Ez jî yek ji wan bûm. Kêfa min hat ko ez jî hatibûm hilbijartin, em ew kesên ko hatibûn destnîşankirin me weha bawer dikir ko ew ê me ji vê ecemîtiyê xelas bike û weha bû, em ji ecemîtiyê hatibûn azadkirin. Lê berê me ber bi ko de bû, ne diyar bû. Dema ko em ji nava hevalên xwe derketin, Yuzbaşî got:

— Bidin dû min. Me hemûya bi hev re got:

— Emir bike komutanê me.

Em li erebeyake servekirî kirin, çûne cihekî din yê leşkeriyê, em birin metbexê berê xwarin da me, xwarin gelekî xweş bû, em weha tê gihiştin ko ev xwarin taybetîji bona me hatibû çêkirin. Em şaş bû bûn, gelo çima ev kes weha dike, gelo ji bo çi em ji ecemîtiyê azad kirin, xwarina xweş dide me. Me xwarina xwe qedand. Piştî xwarin û vexwarinê wî pirsî:

— Çawa bû? we têr xwar û vexwar, ma hûn dixwazin her roj weha bixwin, vexwin û talîmê nekin. Me dîsa bi hevre got:

— Tu emir bike komutanê me.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hêviya min hatibû cih, ez difikirîm ko ev kes ji min re bû weke bavekî, ma min ê ji ko bizanîba ko ev kes wê malikê li min xera bike... Wê dema ko me ta`de û işkence dikirin em li xwe hay nedibûn. Lê niha dema, ez wan kiryaran difikirim, dîn û har dibim. Gelekî mixabin êdî tiştek nema ji destê min tê. Tu bala xwe bide vî halê min, êdî ez nikarim herim nava civatê, dema li mirova mêze dikim ew kiryarên girtîgehê weke filmê sinemayê têne ber çavên min û ji xwe fedî û şerm dikim«.

Min xwest ji wî pirs bikim, ko çima ew ketiye vê rewşê û min got:

— Baş e, ez dixwazim fêr bibim ko çima tu nikare here nava civatê, sebeb çi ye? Sebeb çi ye ko tu dixwazî tenê li vê çolê di nava vê daristanê de bijî? Em bêjin tu ji civatê aciz e, lê çima tu naçe nava malbata xwe, najî?

“-Ez bêjim qurban, ez bêjim. Dema leşkeriya min qediya, ez ji mirovantiyê derketibûm, bû bûm hov, bû bûm dewar, dîn û har bû bûm. Bû bûm weke seyekî har, ko min li kîderê mirovek bidîta hema min êrîşî wî dikir, ew kiryarên ko min li girtîgehê de dianî serê wan girtiyan, êdî di ruhiyeta min de, di serê min de hatibû bi cihkirin, ji bêyî wan tebata min nedihat, min dikir û nedikir min nikarîbû, xwe ji wan serboriyan xilas bikim. Min êdî mala xwe jî weke girtîgehekî dizanîbû, loma car carna dema ko bavê min tiştekî ne li gor min bikira, min ew weke ko wî şaşitiyek kiribe, jê re digot:

— Kurê min te ev şaş kir, heqê te 20 jop e, ji ber şaşitî û çewtîtiyên xwişk û birayên xwe, yên ne li gor min, min lêdaneke weke ya girtîgehê li wan dikir, kesekî nema diwêrîbû bi min re qise bike, kesê ko bixwesta ji min re tiştekî bêjin an qise bikin, diviya bû ko bi awakî nîzamî biaxifiyana. Ew kesê ko bihata hemberî min û nîzamî nesekiniyana, lêdan dixwarin, ji bo vê yekê rehetiya malbata min ji destê min nema bû, ji bona van kiryarên min, wan çend caran li min jî dan, ez çend rojan girêdam, tu fêde nedîtin. Eynî rewş ji bona kesên gundiyên me jî derbas dibû, kesê ko bihata ba min û qise bikirana min ji wî re jî digot:

— Kurê min divê tu nîzamî raweste û bi dengekî berz qise bike. Bi kurtasî li girtîgehê min çi dikir, ew tişt dixwest li wir, li gundê xwe, di nav malbata xwe de jî bikim. Ji ber vê yekê, gelek caran şer di navbera min û gundiyan de derdiket, min li herkesî dida, dûre gundiyan navê dînbûnê bi dû min xistin, herkesî digot:

— Ev reben çû leşkeriyê dîn bû û hat, wax, wax wê çawa be.

Loma kesî êdî têkiliyên xwe bi min nedianîn, bi min re qise nedikirin, kesê qise bikirana jî lêdana xwe ji alî min de dixwarin. Her kesekî ez dîn

dizanîbûm, bi tena xwe mam, weke kesekî dîn û beradayî. Piştî çendaekî li xwe hay bûm, lê êdî ev têgihiştina min pere nekir, ne mirovên min û ne jî gundiyên me tu kesekî têkiliyên xwe ji min neanîn, ez bûm dînekî gund, nav û dengê min weha li nahiyê hate belavkirin, êdî zarokan jî berra dû min didan, tînazê xwe bi min dikirin. Lê ez bi xwe ne dîn im, heşê min li serê min e, tenê car carna ew bûyerin ko min li girtîgehî kiribûn, bi awayekî derî îrade xwe, min dianî serê, dê, bav, xwişk û birayên xwe û carna jî dianî serê gundiyan. Dema ez li xwe hay dibûm ko ev tişt ne rast e, ji bo ko ez carake din nekevim rewşeke weha min gelekî hewl dida, lê gelekî mixabin, tu fêda wê nehat dîtin. Ew jiyan û ew bûyerên girtîgehê weke nîkotinê ketibû canê min, kesekî fêrî nîkotînê bibe, ew weha rehet, rehet, nikare xwe ji wê azad bike. Di gelek şevan de dema ez şiyar dibûm, radibûm ser xwe diçûm ber deriyê oda ko bav û diya xwe an jî ya xwişk û birayên xwe ya ew lê razayî bûn, dinerî û carna jî ez li bendê dipam ko yek were komûtê bide min, eger kes nehata, min gazî dikir:

— Ûlan nobedar, qawiş, ma hûn li ko ne?

Di vê dengdan û gazîkirina min de hemû kesên mala me şiyar dibûn, dihatin ba min û gelek caran wan lêdan jî dixwarin«.

Li vir min nexwest ko ew zêde behsa tiştên malbatî bike, loma min, ji vî pirsî û got:

— De baş em ê dawiyê werin ser van tiştan. Piştî wê xwarina xweş, yuzbaşî çi ji we kir?

— Ji xwe ya girîng ev e.. Li wir, yanî li metbexê, piştî xwarin û vexwarinê, yuzbaşî em xistin rêze û dest bi axaftinê kir:

— Binerin hevalno, weke ji we jî diyar e ko di leşkeriyê de tiştê herî zor, dema ecemîtiyê ye. Mirovê ko li ecemîtiyê lêdanê nexwin tune ne. Kesên nobedarî negire tune ne. Ev tişt dibe qismetê herkesekî ecemîtiye dikin. Ev çend rojên ko ez di dema talîmê de di derheqa we de ez bi gelek tiştan hesiyam; bajarê ko hûn jê ne, fêr bûm, rewşa we û yên malbatên we bi her awayî dinasim. Ji ber vê yekê ye ko min hûn hilbijartin. Eger hûn li min guhdarî bikin, tiştên ko ez dixwazim hûn pêk binin, hûn ê heta taliya temenê xwe bi awayekî şad bijîn. Tiştên ko ez dixwazim ne ji bona şexsê min e. Ji bo hebûna dînê me î îslamê û welatê me î delal e. Ji bona van herdu tiştan divê mirov karibe her fedekariyê bike. Ji ber ko kesek nikare bê dîn û bê welat bijî.

Weke hûn jî dizanin ko di van salên dawîn de gelek kesên kominîst,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

anarşîst, dînsiz û kurtçî dixwazin welatê me û ew dînê me î muqades ji dest me bigrin. Ma hûn dizanin ko komunîst çi dixwazin. Me hemûya bi hev re got:

— Na, komutanê mîn.

— Baş e, ez vê yekê jî ji were behs bikim, baş guhê xwe bidim min.

Komunîst ew kesê ko ji bo wî, dê, bav, xwişk û bira yek e, ferq di nava jin, dayik û xwişkê de tune ye. Yanî her kesî komunîst dikare bi diya xwe re, bi xwişka xwe re razê, ev ne eyb e û ne jî şerm e. Ew kesê anarşîst jî dixwazin hema kuştinê bikin û bêtirîn ew ji kuştina leşker û polîsan hez dikin. Aha hûn di tv.:yê de dibînin û dibihîzîn ko roja leşker û polîsên me nayên kuştin tune ye. Ji bilî vana yên herî xeter, bi zerar û tehlûke ne, ew kesên ji wan re dibêjin Kurd. Ew dixwazin vî welatê me perçe bikin, bi alîkariya dijminên me yên gawir, bi navê Kurd dixwazin welat perçe bikin, de werin vê ecêbê, dema ko ew welat jî perçe bikin, ew kesên li hêla wan bimînin, ew ê hemûyan bikujin, wê wan kesan bi saxî serjêbikin. Ew him anarşist, him konunîst û him jî kurtçi ne. Ji bona welatê me î xweş û delal, van kesên Kurtçî tehlûkeyên herî mezin in. Ew kesên vî karî dikin, an didin kirin, me gelek ji wan, girtine û xistine girtîgeha Diyarbekrê. Divê ew bêne terbiyekirin, divê serê wan ji wan fikrên çewt bête paqişkirin, divê em bi hev re wan bikin ewladên baş û qenc ji bo welatê xwe î şêîrîn. Piraniya wan xwendavan in, ew dikarin zû bi zû mirova bixapînin, weke hûn dizanin ko serokên wan, rêberên wan bi xwe li Ewropa dijîn, pereyên wan pir in, jiyana wan gelekî xweş e. Me hin ji wan berpirsiyar û serokên wan jî girtine, hin ji serokên wan li vir in, li ba me ne. Ji bo ko em wan bikin mirov, pêwîstiya min ji gelek mirovên çak û pak heye. Min weha baweriya xwe anî ko hûn jî wan kesên ko mirov bikaribe pişta xwe bidin wan nin. Eger hûn rê nedin, wan komunîst, kurtçî û dînsizan, em ê bi hev re welatê xwe ji van mîkroban azad bikin. Eger em bi hev re van kesên weha bi tehlûke bînin rê, hûn ê hemû ji bo vê yekê, ji ber welatperweriyên xwe, diyarî bigirin. Hûn ê bi her awayî di girtîgehê de serbest bin, xwarin û vexwarina we, wê ji kîsê dewletê be û xwarina we wê ya herî xweş û delal be. Hûn ê bi her awayî serbest bin, kesekê ne li ser û ne jî li ber we bin. Hûn ê him qomûtanê xwe û him jî yên girtiyan bin. Meziniya vê girtîgeh ê hûnê bikin. Di berpirsiyariya karê xwe de hûn ê ji min jî mezintir bin. Dema min jî sûc û guneh kir, li min jî bixin. Nobedariya derve wê ji bo we tune be, çi gavê hûn bixwazin hûnê bikaribin, razên, rûnên, bixwin û vexwin. Her yek ji we wê bibe,

qomûtanê kowûşeke girtiyan, kowûş wê di emirê we de be, emirê xwe hûnê bi xwe bidin. Kesên li we guhdarî nekin, hûn çi bîne serê wan hûn ê bi xwe biryar bidin û di biryara xwe de hûn ê serbest bin. Tenê ez ê ji we daxwazekê bikim û ew daxwaza min ê ev be, ko hûn bi awakî dilsoz wan kesên di vir de, yên bê dîn û îman, kurtçî û anarşîst, xwedê nenas û kurtçiyan bînin rê. Kesê ko zû bi ser keve, ez ê hîn zêdetir, mafê îstirehetê bidim wî. Lê ew kesê ko vê daxwaza min pêk nîne, ew ê vegere cihê xwe, veger jî, wê ne weha rehet be, di vegerê de serbazê ji we bipirsin: »çima hûn bi şûnde vegeriyan« hûn ê nikaribin tu bersivan bidin, ji bo ko we karê xwe yên welatparêzî pêk neaniye, li wir him hûn ê lêdanê bixwin û him karê herî zor wê ji bo we bête dayîn. De êdî her tişt wê li gor daxwaz û biryara we bête dayîn.

Yuzbaşiyê me axaftina xwe qedand, wî him em tehdît dikirin û him jî nesîhatên xwe li me dikirin. Ji xwe tiştekî ko me bigota tunebû. Hin kes bi zanabûna ko ew ê li komûnist û kurtçiya bixin hatibûn, hin jî weke min ji ber feqîriya xwe û bê peretî û nezaniya xwe hatibûn. Nav û paşnavên me hate lêkirin, tu kesekî ji me tu tişt negot. Navên weha li me kirin ko tu kes me nasneke. Navên me yên rastî nizanibin ko dûre tu talûke neyê serê me. Kêfa yuzbaşî li cih bû, li gor wî her tişt qediya bû, loma em li erebeyekê siwar kirin û berê me da wê girtîgeha bi nav û deng ya li bajarê Diyarbekrê, ya ji bona kurtçiya hatibû, çêkirin«.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# V

»Ew girtîgeha bi nav û deng ya bi navê 5 noluyê li ser rêya Sêwregê û li navça Baxlara de hatibû damezradin. Ew bi awayekî gelek modern hatibû çêkirin, modernbûna wê ne ji bona ko girtî tê de rehet bikin, ji bona ko em bikaribîn bêtir lêdan û işkencan tê de bikin, hatibû avakirin.

Ew modernbûna girtîgehê ne jî bona başiya girtiyan bû, eksê wê ew bi wê modernbûna xwe gelekî di elehê wan de bû, ew modernbûna wê hêz û taqata me gardiyanan geştir, firseta lêdanê zêdetir dikir.

Ez li wê girtîgehê bûme mêvan. Êdî rojên min ê li wir derbas bibana. Di destpêkê de, gelekî kêfa min dihat ko êdî ez ji nobedariyê û ecemitiyê xilas bû bûm, ji ber ko li vir êdî tu lêdan û nobedarî tunebû, bilaeks, li wir rehetî emir dayîn li wan mirovên xwenda û zana işkencekirin, kesên di vir de, di emirê xwe de şuxulandin hebû. Ez ê bi halê xwe yê cahîl li ser serê wan kesan bibama komutan, min ê li wir bikarîba, tiştê ko min dixwest bi wan bidime kirin. Li wir êdî min ê jî bikarîba emir û ferman bida. Êdî min ê bikarîba li wir, li wan kesên ko gelekên wan bi temenê xwe ji min mezintir, lêdan û işkence bi wan bikira. Êdî ez ê bibama fermandarek, min ê êdî li wan kesên xwenda û zana bidana ber dar û jopan, ma gelo kes hebû ko ji vê hebûna delal û berjewendiya rind re bigotina na.

Bi emirê yuzbaşî em 40 kesên nuh hatin girtîgehê ko bibin gardiyanên wir. Dema em ji erebê daketin, yuzbaşî û çend leşker li dû wî hatin pêşiya me, yuzbaşî dikeniya, bi awayekî kêfxweş nêzîkî me bû, yeko yek bi destê me girt û got:

— Hûn bi xêr hatin, vê dibistana, ko gawiran dike musliman, komunîstan dike welatperwerê tirk û ew kesê ko dibêjin em kurd in, dibin tirkên esîl. Piştî bi destê me girtinê, zîvirî ser çawişê kêleka xwe û got:

— Çawuş

— Bêje komutanê min?

— Van hevalên nuh bibe cihên wan, dûre bila herin hamamê serê xwe bişon, îro îstirehet bikin û serê sibê bila bi we re derkevin, gera girtîgehê.

— Temam komutanê min, dibe.

Rojtira din serê sibê em jî weke herkesekî rabûn ser xwe çûn cihê îştimayê, (cîhê ko leşker lê fêrî kaîde û nîzama leşkeriyê dîbîn) li wir em diketin rêzê, yuzbaşiyê me destê wî li paş, seyê wî li dû, bi aweyekî bî kêf hate ba me, li me mêze kir, mizmizî, hustiyê seyê xwe xurand, dûre destê xwe di serî wî de da, hal û rewşa me pirsî, li gardiyanên berî me, mêze kir û axifî:

— Van hevalên xwe yên ko nuh hatine, li hemû girtîgehê bigerinin divê ew çend rojan li ba we bin ko ew jî fêrî kar û barê girtîgehê bibin.

Berî ko em dest bi karê xwe yên muqades(!) bikin, wan em, ew kesên ko nuh hatibûn girtîgehê li hemû derê wê gerandin., Berê ji salona ko mirov dikete hundir dest pê kir.Li hemû salonan, qawişan, hucran û cihên lêdanê gerandin, dema em ketin hucre û cihên lêdanê xofekê ez girtim, tirsek kete nava min, ew kesên ko işkence li wan dihat kirin hemû bû bûn hestî û çerm, min nikarîbû li wan mezê bikira. .

Dema ko em digeriyan li alîkî dengê xwendina sirûdên leşkerî, li alîkî dengê lêdan û li alîkî jî dengê qêrîn û warîna kesan dihat. Gelek caran mirov ji wê rewşê diêşiya, lê ji bona ko em hîn bêtir li ser serê wan kesên girtî dîn û har bibin, çawîşê blokê li me mêze kir û digot:

— Gelî gardiyanan! Yuzbaşiyê me her dem dibê ko bila zikê we bî van girtiyan neşewite. Hûn nizanin ko ew çi bela ne, eger ji wan yek, we hin gardiyana li dereke tenê bigire wê, we bikujin. Ji ber ko vana ne mirov in, ev ew kesên xwedê nenas in, dijminê miletê tirk in. Û ev in yên ko leşker û polîsên me dikujin.

Ew axaftina çawiş, tesîr li ser me dihişt. Ew bû bû berdevkê Yuzbaşî loma ew jî fêrî ajîtasyonê bû bû, wî carna weke yuzbaşî him tirs di me de dîfîrand û him jî rêya lêdanê dida ber me ko em jî dest bi lêdanê bikin. Wî riya ko me di bin tesîra axaftina xwe de bihêle dizanî bû. Yuzbaşî ew kiribû pisporekî zîrek. Eger me jî weke wî nekira him me lêdan dixwar him jî bi vegera cihê ecemetiyê em dihat in tehdîtkirin.

Di destpêkê de, em her kesekî ko nû hatibûn, dane cem yekî ko li wir qardiyan bû, bi qederê çend rojan em weha li gel qardiyanan li qawûşan digeriyan. Ji bona ko em jî fêrî lêdanê bibin, gardiyanên berî me banî hin kesên girtî dikirin û ji me re digotin:

— De lê bide, niha dora te ye.

Li gor wê lêdan û êşkenceyên ko me dikir, hilbijartina ko kî wê li girtîgehî bibe gardiyan dihate kirin, ew kesên baş lêdan nedikirin şûnde dihatin vegerandin, yên weke min zalîm derketin, li wir man. Ji ber rewşa



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

min î ne qenc û ji bo ko ez venegerim cihê ecemîtiyê heta ko ji min dihat, min lêdana xwe qenc dikir, min wer dikir ko dema yuzbaşî dibîhîst an wî bi xwe di demên kontrolên xwe yên bi dizî dikir didît, gelekî kêfa wî dihat, loma car carna banî min dikir û digot:

— Kurê min, li gor agahdariyê ko ez distînim, tu ne miroveki xerab î, eger ev rewşa te her dem berdewam be, tê li vir bimîne û tu ê gelek diyarî jî ji min bigire, ez ê te bikim, onbaşî an çawîş, dema tu bibe çawîş tu ê pereyekî baş jî bigire. Tu ê bibe mirovê min î yekemîn. Lê heta taliya leşkeriya min, ne ez bûme mirovê wî ê yekem û ne jî min tu maaşekî zêdeyî hevalên xwe girt. Dawiya dawî ez tê gihiştin ko yuzbaşî ev yeka hanê ji her kesekî ko wê biba gardiyan re digot.

Wî ez maçî kirim, aferîneke qenc li min da, kêf bû bû kêfa min, ez ketibûm, çavê yuzbaşiyê xwe, êdî hêvî û baweriya min çê bû bû ko ez ê li girtîgehê bimînim. Bi kêf û eşqa ko ez ê li wir bimînim, min êdî lêdan û êşkenceyên xwe hîn zortir û dijwartir kir. Berî ko rojên min î provê biqede yuzbaşî banî min kir û got:

— Kurê min, tu weke ko ez difikirîm derket. Ez dikarim bi awayekî rehet bêjim,ku rewşa te ji ya hevalên te cûdatir e. Loma êdî ez dikarim te li vir bikim qomûtanê qawişekê. Êdî ew qawiş wê ya te be, tu bi wan çi dike, bike tu azad e. Daxwaza min ji te ew e ko bila tu carî zikê te bi wan neşewite, ew giş, gawir in, dînsiz in, xwedê nenas in, ew dijminên welatê me, polîs û leşkerên me ne.

Em ew kesên li wê girtîgehê bû bûn gardiyan bi her awayî azad bûn. Çi tiştê ko me bixwasta me dikarî bû bikira, xwarin û vexwarin pir û xweş bû, vexwarina araqê an jî kişandina esrarê ji alî yuzbaşî de hatibû serbestkirin, kişandin û vexwarina wan, ji alî wî de dihat temîn kirin. Carinan wî digot:

— Di demên xwe yên vexwarinê de herin nava wan xwedê nenasan wê gelekî baştir be. Wê dema hûn ê bikaribin baştir li wan bidin. Heta ko hûn fêr bibin, vexwarin ji bo we serbest e.

Wî her sibe, berî destpêka kar, em hemû dicivandin, nesîhet li me dikir, wî bi xwe em fêrî lêdanê dikirin. Wî di axaftinên xwe yên serê siban de, em bi kîn û nefretê dadigirtin û bi ser wan kesên girtî de dişandin. Bi wê kîn û nefretê me jî ew kesên di wirde hemû xayîn û dijminê gelê xwe didît. Di bin bîr û baweriyeke weha de dema me lêdan dikir, kêfa me gelekî dihat ko me dijminê gelê xwe dianî ser rêya rast«.

Êdî ew kete nav meselê û pêde çû, wî dixwest ko her bûyerê ji destpêkêde, li gor taqet û tiştên dihatin bîrê, yeko yek rêz bike. Dema ew diaxifî, rewşa wî car-carna nebaş dibû, car carna hêstir ji çavên wî dihat, car-carna weke gelekî poşman bû be, lê mîna zanîbû ko êdî tu fêda poşmaniyî tune ew bi xwe jî baş tê gihiştibû ko dem ne dema poşmaniyê ye. Ji ber vê yekê bû ko wî dixwest wan kiryarên ko wî û gardiyanên din kirine, bi awayekî rast bêje, loma ew bi kîn û hêrs bû. Weha diyar dibû ko tu hebûnên ko ew pê bigre nemabûn. Ji bo xatirê du salan bi rehetî derbas bike, çi bi serê wî hat, em guhdarî bikin.

»Ez û ev hevalên ko bi min re hatibûn girtîgehê em êdî li wir bû bûn gardiyan, bîr û baweriyên me, dîtin û nerînên me, heta ez dikarim bêjim însanetiya me jî bû bû bi awayekî din. Dema ez wan bûyerên ko me dikirin yeko yek bêjim, tê jî bi xwe bibîne ko em çawan ji însanetiyê dûr ketibûn.

Ew kesên ko dihatin girtin, berî ko bêne girtîgehê wan işkence û lêdan ji destê polîsan didîtinû demekê jî di binçavan de diman, weke diyar e ko ew mirovên gelek işkence diditîn û birîn li canê wan çêdibe, ji bo başbûn û rehetbûna birînên wan ew li cihê binçav de dihiştin ko heta birînên wan baş bibe. Ew mirovê ko lêdan û dema binçavitiyê diqedandin, ji alî dadgehê dihat ragirtin û dişandin wê girtîgeha ko ez lê bû bûm gardiyan.

Kesên ko dihatin girtîhegê, berê di bin hemû metodên îşkanceyan de dihatin derbaskirin, qasî mehekê an du mehan di hucreyan de diman, dûre ji alî me de, bi biryara me ew di qawişekê de bi cih dibûn.. Me metodekî weha bi kar dianî ko kesên bixwastina zû herin qawişekê pêwîst bû wî/wê wan şert û şirûtên me û ew biryarên ko me ji bona hucran danîbûn, pêk bianîna, di wir de herkes fêr dibûn ko dawiya serîhildan û berxwedanê di hucran û di girtîgehê de tune ye, loma gelekan ji wan zû, biryarên me pêk dianîn, sirûdên leşkerî zû jiberdikirin .Tiştên me digot, pêk dianîn.

Ew kesên nuh dihatin girtîgehê, rewş û şertên girtîhegê nedizanîbûn, wan bawer nedikirin ko bûyerên weha dûrî aqilan, wê li wir bêne serên wan. Ew kesên, dema xwe ya işkencê û ya binçavan diqedandin, leşkeran ew dibirin dadgehê û li wir yên ko dihatin girtin, ji bona me dişandin. Dema ew diketin hundir, em yek gardiyan nêzîkî wî/wê an wan dibûn û me digot:

— Hoo, hevwelatiyê min tu bi xêr û xweşî hatî vir, wey wey wey!.. hela


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bala xwe bidinê, wan polîsên bê bext, hevwelatiyê min kiriye çi halî! Wax, wax, wax xuya ye ko te ji mêj ve serê xwe neşûştiye, wax li min, hawar li min, kuro ma ev karê mirovantiyê ye, de bisekine ez berê te bibim hemamê ko tu serê xwe bişo, xwe paqiş bike, têr nan bixwe û dûre here qawişa ko tu dixwaze, de ka kincên xwe ji xwe bike!

Girtiyên reben nizanîbûn ko wê çi bihata serê wan, loma wan ji wê axaftina me ya ko me tinazê xwe bi wan dikir, bawer dikirin. An dixwastin bawer bikin, ji ber vê yekê bû ko kêfa wan dihat û difikirîn ko piştî işkence û lêdanê, wê serşuştin ne xerab be. Bi wan bîr û baweriyên weha, wan di xem û xeyala serşuştinê û têr nan xwarinê de, hema zû bi zû dest bi ji xwekirina kincên xwe dikirin ko di zûtirîn wext de xwe bighînin pariyek nan û xwarinê Loma ji bilî derpî, hemû kincên xwe derdixist û digot:

— Ez hazir im!

Me li halê wî û li gotara ko »ez hazirim« dinerî, em di mizmizîn, weke gurê ko nêçîra xwe girtibe kêfa me dihat û bi awayekî fenok em bi dora wî/wan diketin, kesên nuh dihatin, wan ê ji ko bizanîbana ko divê mirov derpiyê xwe jî ji xwe bike, loma jî wan derpî ji xwe nedikirin heta ko me yekî bi tinazî bigota:

— Hevwelatiyê min divê tu derpiyê xwe jî ji xwe bike,weha xuya ye ko te zûde serê xwe neşûştiye, ji bo tu baş bête şûştin, divê tu tiştek li ser te nemîne, ji xwe ew kincên li ser te nepaqij in, em ê yên nuh, temiz û xweştir bidin te.

Piştî axaftinên me yên weha girtî tê digihişt ko rewş ne baş e. Qederekê xwe bi vir û wir de dibir û dianîn ko derpî ji xwe nekin, lê xilasbûna wan tune bû. Dema wan xwe vardiqiland, an jî nedixwastin derpiyên xwe derînin, me yekî bi hêrs digot:

— Derpê jî derx e, ma hîn tu çi sekiniye!

Ew tê digêhiştin ko êdî tu çare tune loma derpiyê xwe jî xwe dikirin, xwe şûtî tazî dikirin, dûre em yek diçûn ba wan berê li salonê digerand ko sawa wan bête şikandin, dûre me ew kes an kesan dibir in ser wê hucra ko tije gû (pîsîtî) bû. Çi jin, çi mêr yê ko têketa destê me, diketin wî halî. Me ew li ser hucra tije gû, didan sekinandin û digot:

— Xwe bavînê.

Ew weke tênegihiştibin ko em ji wan re dibêjin xwe bavî yê nava wî gûyî, loma berê li dora xwe mezê dikirin, weke bide diyarkirin ko »em ê xwe bavîn kîderê« hina ji wan dixwestin fena bikin, lê me ew fenê wan

bêyî ko pirsa xwe dubare bikin, hema bi yek carê, me her yekî, bi wan darên (kalas) ko di destê me de bûn, li wan dida û ew davîtin nava wî gûyî. Dema ko ew diketin nava gû, me hîn bêtir dest bi lêdanê dikir ko ew xwe ji ber darên me bidin alî, dema wan xwe bi virde û bi wir de dikirin, herderê wan di nava gû de dima, him lêdaneke baş dixwarin, him di nava gû de dihat in gerandin, dûre me ew ji vir derdixistin, li ser betonê dirêj dikirin û bi dar û jopan bi canê wan diketin. Jop radida wan, dar li mêranî ya wan dixist, yanî tiştê ko dûrî aqila, me dianî serê wan, ko ew di rojên ewilî de çavtirsiyayî bibin, ev plan giş yên yuzbaşiyê me bûn, lê me ji daxwazên wî bêtir lêdan li wan kesên girtî dikirin. Heta me dereke wan neda şikandin, dev jî wan bernedida. Ev yeka bû bû weke biryarake me, ya gardiyana, ji bona wan kesên nuh dihatin girtîgehê.

Me navê vê metoda ko me dianî serê wan kesên nuh dihatin girtîgehê, kirîbû »bixêrhatin«. Bi vî awayî me xêrhatin dida wan û li halê wan dipirsî(!).

Rojekê dîsa hinekên nûh hatibûn girtîgehê, piştî xêrhatina wan, me ew kesên nû hatibûn, birin hucrê, hebekî bi wan şabûn, dûre gardiyenekî gazî Gestapo kir û got:

— Wa Gestapo, me îro tu job ranedayî (ne xistiye) tu kesî ma tu çi difikire? Va ye mêvanên me jî îro hene, ma wê ne baştir be ko em dest pê bikin.

— Ma ji vê çêtir wê çi hebe! Divê em qîmeta mêvanên xwe yên nûhatî bigrin.

Gestapo ji jopxistina qûna girtiyan bi nav û deng bû bû, wî laqabê xwe ji vir girtibû, dema ko pêwîstiya xistina jopekî heba, divê me destûr ji wî bigirta, ji ber ko ew bû bû, uzmanê vî karî. Loma ew di ser wan girtiyên nûh hatî de qêriya û got:

— Zû kincên xwe ji navê û berjêrtir derxin.

Kesên nûhatî, him rewşa girtîgehê baş nizanî bûn, him jî wan nedixwest ko kincên xwe derxin, loma jî xwe bi virde û bi wirde birin û dianîn ko xwe xilas bikin, lê xelasiya wan tune bû, kesekî nûhatî ne mumkun bû ko ji vê lêdana xêrhatinê xilas bibana. Dema wan kincên xwe dernexistin, Gestapo yê me hîn bi hêrstir diqêriya:

— Zû, zû derxin.

Lê dîsa jî tu kesî kincên xwe ji xwe nedikirin, îcar Gestapoyê me kire bire bir, gazî me çend gardiyanên din kir û got:

— Gardiyano, werin werin, ev kûçik lawê kûçikan, kincên xwe ji xwe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

nakin, ew emirê min bi cih naynin.

Hema em çend kesên din ber bi alî Gestapo de direviyan, ew merivekî gelekî tirsonek bû, di jiyana wî ya sivilîtiyê de her tade zulm didît, ji ber ko ew tirsonek bû, her gav hevalên wî li wî didan, ew di nava hevalên xwe de yê herî kêm dihat dîtin, dema ko ew li girtîgehê bû bû gardiyan, ji tol hilanîna, bûyerên xwe yên siviltiyê, li girtiyan dida, rehetiya girtiyan ji destê wî tunebûn, ew tucarî bi tena xwe nediwêrî bû, biçûya qawişekê, an jî bi tene xwe li kesekî bida, dema wî dixwest lêdanê bike an jî jop rade girtiyan banî me çend kesên din dikir, dema me xwe li dora wî dicivand, cesaret dihatê, mêr dibû û tiştên dûrî aqilan dikir,

Gestapoyê me li dor xwe nerî ko em qederê 10 gardiyanan li dor wî ne, loma wî got:

— Van kesên nûhatî, kincên xwe dernaxin ko ez jop radim wan, zû kincên wan ji wan bikin.

Em çend kes li yekî civiyan kincên wî bi zorê jêkirin, serî ber bi jêr û qûna wî jî ber bi jor rakir, tiştê ko Gestapoyê me dixwest pêk hatibû, karê me teva bû bû, her tişt ji bona Gestapo hazir bû, loma ew jî hat û job rada wî kesê ko di nava destê me de bû. Hingî me ew di navxwe de girti bû, wî nikarîbû xwe tev bida, bi xistina jop ya qûnê, bû qîre qîra wî. Qêrîniyeke weha jê hat ko ew qêrînî, qêrîniya bindestiyê, qirîniya bêhêviyetiyê bû, dema wî job radida qûna wî, ji ber êşa job, ew kesê girtî xwe dilivand, nigê xwe radikir, bi rastî jî ew êşa xistina job gelekî zor bû. Dema wî xwe dilivan Gestapoyê me digot:

— Xwe melivîne,- û ji me re digot- baş bigrin, hîn jop giş neçûyê, baş bigrin hindik maye. Piştî ko wî karê xwe qedand ew jobê bi gû derxist, lê mêze dikir, kêfa wî gelekî dihat, bi wê kêfxweşiyê berê xwe da ew kesên din yên di hucran de dima û got:

— Binerin girtiyên pîs û dijminê miletê me, eger hûn zû biaqil nebin, hûn bi ya me nekin, ez ê vê felekê bînim serê we jî.

Gestapoyê me bi vê kiryarê him xwe rehet kiribû, him jî wî aferîneke delal û qenc ji yuzbaşî girti bû. Ji xwe min fam nekir ko çawan li her derê yuzbaşiyê me hazir û nazir dibû. Ji xwe her serê siban wî serê me bi tiştên çewto mewto dadigirt û digot:

— Kurê min ev girtiyên di vir de hemû, fêlbaz in, hemû zane ne, nerîneke wan î cûda, axaftineke wan î ko jê nayê famkirin dibe ko bibe sebeba serî hildana girtîgehê ya girtiyan, wê demê jî ew ê we hemûyan di vir de bikujin, yan jî hûn ê seqet bimînin, loma divê hûn amanê nedin

wan ko ew bi zimanê ko hûn jê fam nakin, biaxife. Divê hûn amanê nedin wan ko ew bi çavan îşaretan bidin hev. Pêwîst e hûn ji hemû hereketê wan bi şik bin, eger hûn vê yekê nekin, hûn dikarin di vir de ji alî girtiyan de bêne kuştin.

Êdî em, ji xwelivandina girtiyan jî bi şik bûn, ji pozkişandin û kuxikên wan jî bi şik bûn, peyva kurt ev bû ko wan çi bikira em ji wan, ji tirsa xwe bi şik bûn. Rewşa me jî di wir de ne tu rewş bû, em jî di wir de her roj bi xewnên nebaş radibûn, bi saya serê vexwarina, esrar, araq û haşhaşa, ko yuzbaşî dida me, car carna me xwe ji bîr dikir, diketin kêf û şahiyê, bi vî awayî jî em hemû bû bûn araqvexwar, esrarkêş. Ez baş dizanim ko gelek kes wê di jiyana xwe ya siviltiyê de jî van tiştan vexwin, ji ber ko me bi şev û rojan araq vedixwarin û esrar dikişand, ji bona me serbest bû, me çiqa bixwesta, ewqasî kêfa yuzbaşî dihat û ji mere dianî. De bifikire ko mirovekî serxweş wê çi bike û çi neke, bi wan girtiyên ji destê me ketibûn amana xwedê. Me weha xwe hînkiribû ko em tu carî bê sûc li kesî naxin, loma her car me sûcek ji wan re peyde dikir û li gor wî sûcî ceza didan wan. Yuzbaşiyê me her dem ev yeka digot: »Binerin kurên min, heta hûn karibin, berî lêdanê, divê hûn girtiyan bi sûcekî gunehkar bikin û dûre li gor dilê xwe lê bidin wê hîn baştir be. Wê demê hûn dikarin bêjin ko em tucarî bê sûc li kesekî naxin«.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## VI

»Ji bo ko em wan kesên ne ji me, bikin mirov, êdî me di girtîgehê de hêdîhêdî meş û ezberkirina sirûdên leşkerî fêrî wan dikir. Di destpêkê da me meşên ecemitî û dûre meşa hostatiyê û ya dawî jî meşa komando fêrî wan kir. Lê meş hemû li gor daxwaza me dihat kirin, tiştên wan dikirin ne bi dilê wan bû, lê bi hukmê zorê û lêdanê, me dixwast em her tiştî bi wan bidin qebûlkirin.

Meş bê lêdan nedibû, bi darê zorê me ew fêrî meşa leşkerî kirin, lê em tenê bi fêrbûna wan î meşê nedihatin ser, me roj bi roj meş û xwendina sirûdên leşkerî zêdetir û zortir dikir. Ew kesên ko bi awayekî nîzamî meşnekirina an jî wan kesên ko bi meşê re bi awayekî qenc sirûdên leşkerî ne dixwendin an jî di demên xwendinê de xwe şaş dikirin, lêdaneke baş dixwarin. Em tenê bi lêdana wan kesên weha razî nedibûn, ji rûçikê wan, hevalên wan î qawişê jî têra xwe lêdan dixwarin. Me weha dikir da ko gîrtiyên din bên teşwîqkirin ko ew jî zû fêr bibin. Ji ber ko piraniya girtiyan nedixwestin ko ji bo kesekî lêdanê bixwin, loma me tiştên dûrî aqilan dianî serê wan. Ev taktîkeke meya baş bû ko me îcad kiribû, ev îcat îcada min bû. Di dema meşê de me ji nişka ve digot: »Rûnên, rabin, bazdin, bisekinin, çongên xwe bikşînin zikê xwe, dengê xwe derxin ûhw. Me weha di ser wan de dikir qêrînî ko ew xwe şaş bikin, da ko em hîn bêtir li wan xin«.

Rojekê serê sibê dema gardiyanê me hat, qerewanên vala ji qawişê bir ko ji me re taştê bîne, berî ko derî bigire awirek da me û got:

— ‹ro wê yek ji we here, hema wê here, ko ez jî nizanim, ya wê di nava du metre paçê sipî de here mal, yan jî ew ê here nexweşxanê. Axaftina xwe kir, derî girt û çû.

Ew çû lê me hemûyan baş famkir ko îro wê rewşa qawişa me nebaş be, loma me hemûyan temînî da hev ko em îro, him meşa xwe gelek qenc bikin û him jî di xwendina sirûdên leşkerî de dengê xwe weha derxin ko hemû rûniştvanên Diyarbekrê dengê me bibihîzin. Lê me baş dizanî bû

ko me çawan jî bikra, îro wê xelasiya me ji destê gardiyan tune ba. Ji ber ko emir hatibû dayîn, diviya bû, kesek ji qawişa me jî biçûya, tiştekî ko me bikra tune bû, li me wer hat ko ew kêfxweşiya em ê taştê bixwin nema bû. Xofekê em girtibûn, em ji rewşa xwe ya normal derketibûn, ketibûn rewşeke din. Lê çer biba wê biba, loma me taştêya xwe xwar û xwe ji bona derketina derve hazir kir. Gardiyan gazî kir:

— Qawiş, xwe ji bo derketinê hazir bikin.

— Emir bike komutanê me.

Ji xwe em hazir bûn, nava me gişkan dikir teprep, em her yek ji xwe bi tirs bûn, me baş dizanîbû ko wê îro yek ê ji me here. Loma gardiyan digot »wê here ku« me jî baş nizanîbû, bi vê tirs û xofê em derketin der, berê sirûda milî ya tirka, dû re xwendina xîtaba Ataturk û sonda me. Dû e em ketin rêzê, me dest bi meşê û xwendina sirûdên leşkerî bi dengekî gelekî berz kir.

Gardiyan jî têgihişt ko ev cara yekem e ko em weha bi dengekî berz sirûda dixwînin, ew xwendina me ya weha ji tirsa mirinê bû, mirin nêzîkî me bû, hevalek wê ji nava me biçûya, lê wê kî ba, nediyar bû, loma em her yek ji xwe bi tirs bûn. Gardiyanê me diqêriya:

— Dengê xwe rakin, ev çi deng e.

Hetanî ji me dihat me dikir qêrînî, îcar wî digot:

— Ka dengê nigên we nayê, nigê xwe hişk li erdê bidin.

Di meşê de me tu kêmasî nekir, îcar wî digot: »razê, rabe« em radizan û zû bi zû radibûn, di vir de jî qasî ko gardiyan kêmasiyê tê de bibîne çênebû. Werhasil wî çer kir tu kêmasiya me nedît, îcar em dane sekinandin. Wek her car rêzbûna me girtiyan, çariçar bûn, yanî em her çar kes, dî rêzekê de bûn. Gardiyan her carê rêzek tenê derdixist meşê û sirûdên leşkeriyê bi me dida xwendin, di vê rewşa weha de jî wî tu kêmasî nedît.

‹car em dan sekinandin, hebekî fikîrî, çû hinda hevalên xwe yên sekinî bûn û li me nerî, dûre vegeriya, dîsa wî ji rêza serî de dest pêkir û got:

— Rehet, hazir be, bimeşin. Dema ew herçar dimeşiyan îcar wî di nigê rastê de komûta sekinê da. Ev komût şaş bû, lê pêwîst bû li gor vê komûta şaş jî em bi awayekî nizamî bisekiniyana, pêwîst bû ko wî, di nigê çepe de bigota bisekine, wê demê rawastan gelekî rehet bû, ji xwe ew hevalê nezan di nava me de nemabûn, lê sekina di nigê rastê de ji bona me hemûya tiştekî nû bû, ew gelekî zor bû, çar rêzin ewilî bi wê komûta şaş, lê bi awayekî nizamî sekina xwe pêk anîn, dor hatibû, rêza pêncan, di wê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rêzê de jî kesekî ko temenê wî li dor 50 salî hebû, wan jî weke rêzên din meşa xwe kirin, lê dema biryara sekinînê de ew Xalê 50 salî xwe şaş kir, nikarîbû, li gor komûta şaş bi awayekî nîzamî bisekine, dema wî xwe şaş kir gardiyanê me keniya û got:

— Qawiş bisekine.

Em hemû di cihê xwe de sekinîn, wî jî nêçîra xwe girtibû, kêf bû bû kêfa wî, hate ber xalo sekinî û bi awayekî devliken got:

— Naxwe tu yê here mal ha, naxwe te bêriya mal û zarokê xwe kiriye ha. Baş e, baş e, tê îro ji alî min de tahliye bibe. Ez ê te têxim nava du metre paçê sipî û te bişinim malê, tu bawer be ez te naxapînim.

Weha tinazê xwe bi xalo dikir, ew gotarên wî ji lêdanê zortir bû. Lê me nikarîbû, tu tiştek bikira, xalo ketibû nava destê wî, weha çend caran gardiyanê me li dor wî çû û hat, dûre li ba wî sekinî tiliyên xwe civand serhev, rabû ser nigê xwe yê çepê û kulmek li rûyê xalo xist, bi lêdana wî û ketina xalo bû yek, xwîn ji serê xalo herikî, herikandina xwîna weha ne bi xêr bû, loma gardiyan, rehet bû bû, li xwînê nerî kenî û got:

— Qawiş herin û bila du kes jî vî berateyî rakin bibin, hundir û du kes jî bila vê xwîna pîs bişon. Tiştê ko wî got me zû bi zû pêk anî, ji ber ko me di rewşê weha de ecele dikir ko belkî ew heval hîn saxbe ko em bikaribin wî li gor îmkanên xwe rehet bikin

Em reviyan qawişê, du hevala xalo anîn jor, ew hevalê me yê nîv doktor çû ser xalo, li rewşa wî mêze kir, mizgniya ko hîn xalo dijî da me, kêfa me hat, li gor îmkanên di destê me de, me li xalo mêze kir û xalo piştî sê heftan bi ser heşê xwe hat.

Ew xalê me, kurd bû, lê ne misilman bû, ji fileyên der dora Midyatê bû. Ji xwe nemisilmanbûna wî bi serê xwe jî işkencê û lêdana wî hîn zêdetir dikir. Sûcê wî ew bû ko çaya qaçax dikire û difroşe, hatibû îxbarkirin. Bi vê sûcdariyê xalo hatibû vê girtîgeha kesên siyasî têde dijiyan. Anîna wî ya vir bi zanebûn bû, ji ber ko xalo jî mirovekî welatparêz bû, ew ji bona gelê xwe dixebitî, wî her gav digot: »Em baş dizanin ko fermana filan, ji alî dewleta tirkan de hate dayîn, hin kurdên misilman û nezan, ji bona çend quruş pere, an jî ji bo ko ew ê herin cennetê em dikuştin, dema wan em dikuştin kêfa dijmin bêtir dihat ko em ê xwe bi xwe rabin hev, em ê hevûdu bikujin, bizrê dijminatiyê wê têketa nava me kurdan xwe bi xwe. Çiqa dînê me cûda be jî, em hemû kurd in, welatê me Kurdistan e. Lê ev bi salane ko dijmin em berra ber hev dane, divê hûn weha baweriyan bidin, wan kesên file ko dilê wan li we vebe. Gelek mirovên me yên nezan jî

dibêjin ko »kurdên misilman em kuştinê, divê em jî tola xwe ji wan hilîn în, an em tucarî nikarin bi wan re bibin bira, bi wan re li erdekî bijîn, çi demê ew firseta xwe bibînin ew ê me bikujin«. Xalo weha mirovekî zana û têgiştîbû...

Bi gotara meşê, Eliyê di qawişa ko ez bi xwe lê dimam de, kete bîra min. Elî ji gundekî Licê bû. Ew bi xwe şivan bû. Wî ji gundê xwe pêve tu dereke din nedîtibû û karê wî jî tenê şivantî bû. Elî ne dibistan xwendibû ne jî bi tirkî dizanîbû. Di demên meşê de dema gardiyan digot »rast« wî nigê çepê diavît, dema gardiyan bigota »çep« îcar wî yê rastê diavît. Gardiyanan kirin nekirin nikarîbûn Elî fêrî meşê û xwendina sirûdên leşkerî bikin. Ew jî êdî tê gihiştin ko Elî ne ji mêraniya xwe weha dike. Ji ber ko wî tu tişt fam nedikir loma ew diket vê rewşê. Piştî vê têgihiştina, gardiyana êdî dev jî Elî berdan.

Li ser vê rewşa Elî, me ji wî pirsî ko gelo çima tu girtinê. Wî weha sedemê girtina xwe dianî zimên.: »Rojekê ez li ber pezê xwe bûm, carekê min dît ko leşkeran dora min û pezê min girtin, yekî gazî min kir û got: »Xwe tev mede yan na tê bê kuştin, destê xwe bi ser serê xwe de« min jî ji tirsa weke wan got, kir. Dûre hatin hinda min leşkerekî weha li min nerî û ji serbendê xwe re got: »Komutanê min ev bû ev, yê ko ji ber me reviya, şikil û şemala wî baş tê ber çavên min«. Welhasil destên min xistin kelepçê ez birim cihekî li wir çavên min dane girêdan, piştre çend kesan pirs ji min kirin, pirsên weha çewto mewto kirin ko min nizanîbû ew behsa çi dikin. Ji bo ko min ji pirsê wan tu tişt fam nedikir, min tu bersiv jî nedida wan. Bi saya serê wê bêdengiya min, wan heta dikarîbûn li min didan, hemû şikilê işkencan li min ceribandin, tu tişt ji min famnekirin. Hina digotin »wele ev serokê wan e, loma napeyive, hina digot; dibe ko ev kesekî navendî be«. Lê min ji van gotarên wan jî tu tişt fam nedikir. Piştî qedandina işkencê û dema bin çavê ez anîm vir. Niha jî ez nizamin wan ez ji bo çi girtime, û çima weha li min didin«.

»Bi vî awayî roj bi roj xwendina sirûdan zêde dibûn, ji bo ko barê girtiyan bêtir giran bibe, ji bo ko ew êdî, tu tiştekî din nefikirin, yuzbaşiyê me tenê bi meş û jiberkirina sirûdên leşkerî ne dihat ser, wî êdî pirtûka »Ataturk îlkelerî ve înkilap tarîhîmîz« derxist, ji bona ko girtî wê jiber bikin, emir derket me jî hema ew pêk anî, pirtûk ji 102 rûpelan pêk dihat, her kesek mecbûr bû ko wê ji ber bikin. Gelek caran em diketin qawişan pirtûk digirt destê xwe derek vedikir û me ji girtiyekî re digot: »Rûpelê 96-an û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

pragrafa 3-an bixwîne« ji xwe kesê ko ev pêk neaniya tiştên wê bihata serê wî diyar bû. Bi vî awayî me ew pirtûk bi darê zorê bi wan da ezberkirin.

Li alîkî işkencên kesî nedîtî dom dikir, li aliyê din, yuzbaşiyê me dixwest ko hemû girtiyan ji halê wan derbixe, têxe halekî din, wan seqet bike, wan bitirsîne ko ew careke din nikaribin doza welatparêziyê bikin. Ji ber vê yekê bû ko me her roj babetekî lêdanê îcat dikir û di serê wan kesên girtî de dixiste jiyanê.

Yuzbaşî her car ji me re digot »ew gardiyanê metodeke işkencey a nuh peyde bikin, ew ê ji alî min de bêne xelatkirin« xelatên wî li gor dilê me û daxwaza me bû, ji ber ko me kê îcad an jî metodê lêdaneke nuh bidîta, ya hefteyekê îzin, ya jî pere ji me re dihat dayîn û ya jî bi terfiyeke serleşkerî em dihatin xelatkirin. Loma her dem û wextê me li ser fikirandin û dîtina metodên işkencên nuh bûn. Êvaran dema razanê em diketin fikirandina ko şiklekî lêdanê ya nû bibînin. Loma her kesek ji me carna hetanî serê siban xew bi çavên me ne diketin. Me kerba bêxewbûna xwe jî di serê girtiyan de derdixist. Loma serê siban, di dema îştîmayê de, kê çi dîtiba an kê çi îcad kiriba, berê pêşkêşî yuzbaşî dikirin, eger têketa serê wî, ew dixiste jiyanê, yanî me li ser serê girtiyan diceriband, ew îcat cih bigirta, wan kesên ko ev dîtibana, ji alî yuzbaşî de dihatin xelatkirin. Ji bo vê yekê bû ko em hemû bi hev re ketibûn musabaqeyekê, ko kî û çawan dikare tiştekî baştirîn bibîne. Ew şikil û lêdana ko me dikir, hemû ji ber serê me derdiketin. Gelek gardiyan bi xwe sadîst bûn, gelek ji wan weke hovan bûn gelek jî ji weke min nezan, feqîr û ketiyê aboriyê bûn. Me gelekan ew lêdan û işkenceyên weha ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî di dema leşkeriyê de dikirin.

Hevalekî me î gardiyan rojekê dîtin û îcata xwe weha da diyarkirin.

— Hevalno, tiştê ko ez bi rojane li ser difikirîm ev e ko mirov bi şev di hundirê qawişê de nobedariyê bi girtiyan bide girtin. Ev dîtina min ji alî yuzbaşiyê me de jî hate tesdîqkirin û pêwîst e ko em vê yekê jî pêk bînin, binerin bê hela trewşa girtiyan li hember vê wê çawa be. Piştî qederekê yuzbaşî jî hate nava me û wî jî ji me re got:

— Binerin hevalê we ....... çi metodeke xweş dît ko em li ser girtiyan biceribînin. Ji ber vê yekê divê hûn ji sibê û pêde vê têxin jiyanê, eger tesîra wê baş derket, ez ê wî hevalê we xelat bikim.

Yuzbaşî axaftina xwe qedand, çend pirsên din ji me kir, hal û rewşa me pirsî, dûre got:

— De hûn dikarin êdî îro dest bi karê xwe yên pîroz bikin, bîminin di

xweşiyê de. Me hemûyan got:

— Sipas.

Em her yek ber bi qawişên xwe de çûn, ko qerewanên xwarinê ji wir bigirin û taştê bînin. Lê taştiya wan hema taştê bû (!) . Bi dayîna wê taştiyê jî me gardiyanan bi ser wan de dikire bire bir û me weha got:

— Qawiş! Wan hemûyan bi hev re, bi yek dengî digotin:

— Emir bike qomûtanê me.

Bi rastî dema wan hemûya bi hev re digotin »emir bike komutanê me« kêfa min gelekî dihat, ne ya min tenê, her gardiyanekî wir qasî min kêfxweş dibû ko ew mirovên hin ji wan doktor, hin ji wan avûkat, hin ji wan muhendis bûn ko em ew kesên nezan weke komutanê xwe qebûl dikirin. Gelo kêfxweşiyeke weha bi dest kê diket.

— Hûn ê ji îro pê de, bi şev di qawişê de nobedariyê bigrin, her ji du saeta yek, (Ev jî li gor mezinbûna qawişan hejmara nobedarên girtî yên bi şev dihatin guhertin) wê bibe nobedarê qawişê, di dema nobedariya kê de, çi bibe, çi biqewime, ew kes wê berpisiyar be. Di dema nobetê de, axaftin, xwe sipartina dîwêr, çûyina tuwaletê, qedexeye, tenê hûn ê, di dema noberdiyê de di hundirê qawişê de herin û werin, çûn û hatina we jî divê nîzamî be. Piştî vê axaftinê, min bi awayekî ji xwe bawer, gazî berpirsiyarê qawişê kir û ji wî re got:

— Berpirsiyar (mesûl), ji niha de divê tu lîsteya nobedariyê çêbike, kî, wê çi demê nobedar be, divê bête zanîn. Kesê nobedar, pêwîst e ji saet 19.00-an de dest pê bike, heta saet 06.00-ê sibê. Ha tiştê herî girîng wê ev be ko dema gardiyanek bê û wê şibaka di derîde veke, divê ew kesê nobedar, gavekê dûrî derî bisekine û komûta xwe bi awayekî nîzamî bide, ya na, di wê saetê de kî nobedar be ew ê gelekî lêdanê bixwe û dibe ko here hucrê jî.

Tiştê me digotin, qanûn û nîzama girtîgehê bû, eger kesekî ew tiştên me pêk neaniya, me ew kesên weha dibirin hucran û li wir ew dianîn ser rêya rastî yê.

Tiştên me digot an jî ew îcadên ko nuh dihatin didîtin, divyabû me hunerê wê bidîta, bê ka hela çiqa tesîr li ser girtiyan dike. Loma berî ko em biryar an jî şiklekî işkencê yên nuh têxin pratîkê, berê em hemû gardiyan gelekî li ser difikirîn, me di nava xwe de munaqeşe dikir, dûre bi biryara yuzbaşiyê xwe, me ew dixist jiyanê. Nobedariya şevan jî weha pêk hat. Biryara me ev bû ko şevê şeş kes nobedariyê bigirin, her ji du saeta yek dibû nobedar. Nobedarî ji saet 19.00- an dest pê dikir, yanî nobedarê

19.00–21.00 - 21.00–23 ûhw. Di dema nobedariyê de pêwîst bû ko her nobedarekî komûta xwe bidana, wî gardiyanê nobedar .

Dema ji alî gardiyanekî de ew şibaka di derî de bihata vekirin, pêwîst bû ko ew kesê nobedar weha bigota: » Mardîn Bloka D, qawişa 00-an nobedarî 23.00–01.00-ê me di dema nobedariya min de tu wuqûat tune ye qomûtanê min.« Piştî ko nobedarê girtî weha komûta xwe dida ji bo ko em wan hîn bêtir zivêr bikin, me weha ji wan re digot:

— Herkes raza ye?

— Raza ye qomûtanê min.

— Di towaletê de kes heye yan na?

Ji ber ko me piştî saet 19.00-an çûyina towaletê, kişandina cixarê, ji bilî nobedar, li ser lingan rawestandin qedexe kiribû. Loma nobedar digot:

— Tune ye, komutanê min.

— Nobeta xwe baş bigire.

Weke me dizanîbû ko her nobedarekî girtî ji me çêtir nobeta xwe digirtin, ji ber ko ew kesê nobeta xwe baş û nîzamî negirtana, serê sibê ew jî alî me de dihat işkencekirin, ji ber vê yekê bû ko herkesî tiştên me digot, ji me çêtir pêk dianîn.

— Emirê te li ser serê min komutanê min.

Em gelek caran, tenê bi komûtdana wan jî nedihatin ser, diviya bû me hin tade û işkenceyên din bi wan bikira, loma jî her leşkerekî gardiyan li gor însafa xwe çi bianiya serê wî nobedarê girtî, serbest bû.

Em di girtîgehê de fêrî rehetiyê bû bûn, êdî nobedariya şev ya hundirê girtîgehê jî ji me re zor dihat, loma me ev zora xwe di pozê girtiyan de derdixist. Deriyên qawişan hemûyan piştî serhijmara giştî ya êvaran, dihat kilîtkirin û kilît teslîmî îdarê dibû, yanê bi şev ji bilî yuzbaşî tu kesekî din nikarîbû deriyên qawişan vekirana. Eger nobederên girtî, daxwazên leşkerên nobedera pêkneaniyana serê sibê, berî xwarina taştê ew kes an kesan ji qawişan dihat derxistin, li gor sûcê wan ceza li wan dihat birîn, ji ber vê bû ko her nobederekî girtî ew daxwazên gardiyanên bi şev, ji tirsa xwe pêk dianîn.

Bi şev dema me nobet digirt, em aciz dibûn, di bin bêdengiya şevê de gelek tişt diketin bîra me, loma me aciziya xwe bi hin bobelatên ko me dianî serê girtiyan derbas dikir. Wekî: Dema ko me ew şibaka di deriyê qawişan de vedikir, nobedarê qawişê pêwîst bû gavekê, dûrî şibakê bisekiniya, komûta xwe bida. Her tiştê wî pêwîst bû ko bi awayekî nîzamî bihata kirin, nobedarê girtî çi bikirana, xelasiya wan tune bû, dema ew

şibaka di deriyê qawişê de bihata vekirin, ew nobedar bê ceza xelas nedibû, loma me hina ji wan re digot, serê xwe pênc caran li dîwêr xe. Wî an wan ev tiştpêk dianîn, ew kesên ev yeka me pêk neanîna, dizanîbûn ko serê sibê wê çi bê serê wan. Loma serê xwe li dîwêr dixistin, dûre li me dinerî, berê komûta xwe dida dûre digot:

— Emrê te hate cih, komutanê min.

Me bi vî awayî jiyana nobedariyê xiste pratîkê. Kiryarên me dikirin, ji alî yuzbaşiyê me de dihate pesindan. Ji ber ko ev yeka hanê bi girtiyan gelekî zor dihat, him nobedar aciz dibûn, him jî bi axaftina, gardiyan û nobedarê girtî hemû şiyar dîbûn, xew li wan diherimî, ji xwe daxwaza me an jî ya yuzbaşî ew bû ko tiştê ne bi dilê girtiyan be, em bibînin û pêk bînin. Loma jî nobedarî êdî bû bû jiyana girtiyan.

Di dema nobedariyê de bi hina re axaftin, razan, rûniştin qedexe bû. Bi kurtasî mirov dikare weha bêje ko tenê nobedarê girtî, di dema nobedariya xwe de li ser niga dikarîbû bigeriya. Wî nikarîbû li gel kesî têkilî daniya, nikarîbû tişt bida û bistanda. Eger yek ji me, em bihatana û tişt ji nobederê girtî me bixwesta jî, pêwîst bû ko wan nedaya. Ji bona ko em ji van tiştên xwe bawer bin, gelek caran me nobedarên girtî diceribandin, car-carna jî yuzbaşî xwe dikir weke nobedarekî leşker yên şevê û kincên wan li xwe dikir, li qawişan digeriya ko bê hela nobedariya şevê çawa derbas dibe, ji bona ko kesek şaşitiya nekin, me gelek tişt dianî serê wan.

Şevekê ez û çend hevalên gardiyan, em nobedarên saet 01.00 - 03.00-an bûn, em ji xwe re li hundirê girtîgehê digeriyan, lê ew ger bi xwe jî, ji me re xweş nedihat, ji ber ko em fêrî rehetiyê û serbestiyê bû bûn, loma em aciz dibûn, ji bo ko em acizbûna xwe derbas bikin, pêwîst bû me ji xwe re karek bidîta. Dema em di salona bloka D-yê de derbas bûn û em hatin ber qawişa (....) (Gardiyan nedixwest ko nav û nimrên qawişa bide her gav dema dihat ser nav û nimra wî digot felan kes û filan qawiş) hevalekî got:

— Hevalno ka em binerin bê hela nobedarê vê qawişê çi dike, çawa nobedariya xwe digre. Her tiştê wî nîzamî be jî, divê em tiştekî din bîne serê wî.

Hevalekî din got:

— Çawa, em ê çi bînin serê wî.

— Em tiştekî weha bînin serî wî, ko ew xwe şaş bike. Yekî din got:

— Çawa?

— Binerin, em ê çar kes di wan qulikên di şibakên di dîwar de ne biner-

in. (Di dîwarên qawişan de hin şibake hebûn, sitara şibaka ji hesin çêkiribûn, di wan sitaran da yanî di kapaxan de jî çar qulik hebûn, dema ew sitar yanî kapaxa şibakê dihate girtin, ew mirovên hundir qawişê yên derve nedidîtin, lê ew kesên li derve dikarîbûn xweş li kesên li hundir mezê bikirana, ji xwe derdê girtiyan yê hey giran jî, yek ji ber wan qulikên di şibakan de bûn, ji ber ko ew her dem di wir de dihatin, kontrolkirin, gelek tiştên wan bi saya serê wan qulan dikete destê me) Em ê dudu jî herin ber derî, eger me nobedar bi sucekî girt, ji xwe ne pêwîst e, lê na her tiştên wî nîzamîbe, wê demê ez ê avê ji wî bixwazim, dema ko neda ez ê li ber wî bigerim, zikê wî bi xwe bişewitînim, ez ê weha bikim ko ew avê bide min, ji xwe dema wî av dirêjî min kir, serê sibê wê çi bê serê wî diyar e.

Me gişa bi hev re got:

— Wele ev ne fikireke xerab e, ji xwe em acizin, da ka em vê jî biceribînin.

Di wê qawişê de çar şibake hebûn me çar kesan xwe dane ber şibakan û me li hundir mezê kir, du kes ji me çûn ber derî. Nobedarê girtî, nobedariya xwe nîzamî digirt, tu qusura wî jî tunebû, dema ko şibaka di derî de vebû, wî bazda hat, qederê metrekê xwe dûrî derî girt, berê silava niga, dûre ya serî da û got:

— Ez, S.A. nobedarê saet 01.00 - 03.00-an, qawişa me ji 52 kesan pêk tê, di towaletê de tu kes tune ye û herkes razaye, tu vuqûat jî tune ye komutanê min.

Ji xwe her kesekî girtî baş fêrî komûtdanê û nîzamî nobet girtinê bû bûn. Hevalê qardiyan berê li wî mezê kir û got:

— Biner ez jî weke te nobedarê vê saetê me, ji te û min pêve tu kesekî şiyar tune ye. Ez gelekî tî bûme, eger tu bikaribe qedehek av bide min, ez ê gelekî kêf xweş bibim.

Nobedarê girtî got:

— Komutanê min emrê te li ser çav û serê min, lê weke tu jî dizane ko dan û stendina tiştan di dema nobedariyê de qedexe ye, ez nikarim vê daxwaza te pêk bînim.

Piştî vê bersîvdana nobedarê girtî, ew hevalê me yê gardiyan, gelek şeytaniyên wî hebûn, car-caran ew weha diaxifî, ko mirov di bin tesîra axaftinên xwe de dihişt, ji xwe ew bi vî awayî bû bû qardiyanê girtîgehê. Wî bi awayekî dilşawatî axaftina xwe domand:

— Bi rastî ez gelekî tî bûme, ger tu qedehek av bide min, ez ji tu kesî re nabêjim.

— Na komandanê min na, ez nikarim bidim, got nobedarê girtî.

Lê carakê wî xistibû serê xwe ko tiştekî bîne serê nobedarê girtî û got:

— Bi rastî gelekî tî bûme, ez soz didim te ko ez ê ji tu kesî re nebêjim, ev tenê, wê di nava min û te de bimîne. Û hin fen û fûtên din kir, wer kir ko bi rastî zikê nobedarê girtî bi wî şewitî. -Ji xwe, ew mirovên girtî, mirovnî gelek qenc û baş bûn, wan tu carî xerabiya kesên qenc nedixwestin û wan her car dixwestin alîkariya kesên ko pêwîstiya wan ji alîkariyê re heye bikin. Lê me ev yeka wê demê nizanîbû. Loma nobedarê girtî got:

— Bi rastî ev ê di nava me de bimîne?

— Belê, belê.

— Baş e, ez ji te re qedehek av bînim. Got û çû qedehek av anî û dirêjî gardiyan kir, dema gardiyan av girt destê xwe hema weha avît ser çavê wî û got:

— Min .....te, ez ê serê sibê çi bînim serê te, tê bibîne, ker kurê kera, ma tu nizane ko di dema nobedariyê de her tişt qedexe ye. Me şibake bi hêrs girt û em çûn.

Me ji xwe re lîstikek nuh derxistibû, lîstikên weha li ba me pir bûn. Wan mirovên girtî gelek caran diketin dafikên ko me li ber wan vedidan. Ev nobedar jî yek ji wan bû. Wî bi xwe nema dizanîbû ko serê sibê wê çi bête serê wî.

Serê sibê me ew kiryara xwe ji hemû gardiyanan re got. Loma jî sibê zû, di dema derxistina qarewanan de em qederê 10-15 gardiyan ketin hundirê wê qawişê û wî gardiyanê me î fenek ko ew kes xapandibû qêriya:

— Nobedarê saet 01.00 - 03.00 ê, ko av dabû gardiyan bila derkeve.

Bi xelasbûna gotara wî, ew kes, ew reben, ew mirovperwer, sê gav avît pêş û komuta xwe da:-«S.A. Mêrdîn emir bike komandanê min!

Em weke gurê har û birçî li dor wî civiyan, gardiyanê ko ew xistibû vê dafikê, gelekî bi kêf bû, ji ber ko wî nêçirek bi destxistibû, loma serê wî bilind bû, destê xwe da paş qûna xwe, bi awayekî devliken got:

— Hooo hevwelatiyê min tu çawa ye? Naxwe te av da min ha, ji dêlva avê te karîbû tiştekî din jî bida lo.

Bi xelaskirina gotara xwe, wî weha kulmek lê xist ku, girtî ket û ranebû. Bi ketina wî kesî kêfa me gişan hatibû, loma gardiyanê li wî da, keniya û got:

— Hela rabe, rabe tu îro bi vî awayî, nikare ji nava destên min xilas bibe.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Di dema rabûna girtî de, îcar Sergardiyanê me yek lêda, berî ko ew bikeve erdê me hemûya êrîşî ser wî kir, te digot qey, mişkek e ketiye nav lepên 10 pisîkan, me jî li wî weha kir. Me yekî ew bi lêdanê diavît ba yekî din. Te digot qey em bi topê dilîzîn. Qêrîn û warîna wî diçû ezmana, hevalên wî yên girtî hemûya weha li me mezê dikirin, lê wan nikarîbûn hevalê xwe ji nav destên me xilas bikin, kesekî newêrîbû dengê xwe derxe. Me lêdana xwe domand ta ko ew ket û ranebû, lê bi rastî me nizanîbû ko ew mir an ji xwe derbas bû, ji ber ko her tişt ji bo me serbest bû, me dikarîbû, mirov di vir de bikuşta ko kesekî nikarîbû tiştek bi me bikira. Em tu carî ji mirin an jî seqetbûna girtiyan neditirsiyan, ew dijmin bûn, ji bo lêdana wan em bi her awayî azad bûn.

Piştî ko girtî ket û ranebû, dilê me kete cih, me dizanî bû êdî kesekî din, wê weke wî neke. Berî derketina me, gardiyanê qawişa wan xweste, mêraniya xwe rê girtiyên qawişa xwe bide, loma wî bi hêrs got:

— Qawiş.

Hemûyan bi hev re gotin:

— Emir bike komutanê me.

— Divê hûn sê rojan xwarinê nedin vî kesî ko ev sûçê giran anî ser qawişa we, baş e. Hemûyan dîsa bi hev re gotin:

— Tu emir bike komutanê me.

Ew emirê ko ji alî me de dihat dayîn, pêk dihat, eger hin caran girtiyan gelekî bi dizî bi ya me nekirana jî, bi piranî tiştên me digot pêk dihatin, ji ber ko wan baş dizanîbû ko ew her dem di bin çavan de ne û tên kontrolkirin. Wan em nedidîtin lê me ew baş ditîn. Eger tiştên ko ji alî me de nehata dîtin hebana, bi saya serê wan muxbîran, li kîjan qawişê çi biqewimiya ji mere dihat gotin. Me di her qawişê de hevalbendên xwe yanî muxbir dabûn çêkirin, bi saya serê wan ew tiştên di qawişan de li dijî emirên me dihat kirin, an jî axaftinên hin kesên ko hîn nehatibûn rê, ji me re dihat gotin. Ez ê di pêş de li ser kesên muxbîr jî rawestim

Ji wan muslîxên di hundir qawişan de dilopek av nedihat, ji ber ko yuzbaşiyê me weha dixwest loma wî her dem digot:

— Pêwîst e, ev girtiyên li vir her dem tî û birçî bin da ko zû werin ser rêya rast.

Tu rastiyê bixwaze em jî weke wî difikirîn, gelek caran em ji yuzbaşî jî xerabtir difikirîn. Loma di meha tebaxê û di wê germa bajarê Diyarbekrê de, me bi girtiyan ve meşa leşkeriyê ya herî zor dida kirin, cihê meşê bi xwe beton bû, ew betonê di nav çar dîwaran de, dema tavê (rojê) lê dixist

dibû weke êgir, dema wan meş dikir, me xwe dida ber siyê. Piştî çend saetên meşa li ser wî agirî, zimanê wan di devê wan re derdiket, devê wan zuha dibû, hesreta herkesekî ko qurtek av vexwin, lê ava wan baş nedihat dayîn, ev jî bi zanebûn wer dibû, eger yuzbaşî bixwesta di hemû mûslixên qawişan de dikarîbû av biherikiya. Lê wî tiştekî weha qet ne dixwest. Em tenê bi vê yekê jî razî nedibûn, dema ko av hindik dihat dayîn, wê demê me hîn bêtir xwarin ji wan re dibir, ji ber ko qedandina xwarina ji qawişan re diçû mecbûrî bû, eger mêr hebana wê ew xwarin neqedandina an jî bavêtana. Hin caran me gelek xwê dixist nava xwarina wan, di demê weha de kêf dibû kêfa me, me dizanîbû ko çi dikeve halê wan, di tunebûna avê de, xwarina şor û zêde ji bo wan diçû.

Dema girtî li avê digeriyan me bêtir, xwarin ji wan re dibir, dema ew li xwarinê digeriyan wê demê jî me av dida wan. Ji xwe daxwaza me ne ew bû ko ew tu carî li girtîgehê têr bixwin û vexwin. Têrxwarinî ji bo wan qedexe bû. Ma çawa dibû ko em ê dijminê xwe têr bikin, ma çawa dibû ko em ê komunista têr bikin, ma wê çawa biba ko ew kesên ko dixwestin welatê me perçe bikin, zikê wan bi xwarinê dagirin, di bin van bîr û baweriyên weha de mirov nikarîbû bi awayekî zelal bifikiriya. Ji xwe mirovekî her roj serxweş, mirovekî araqvexwar û mirovekî heşhaşkêş yan jî esrarkêş wê çawa bikarîba bi awayekî rast bifikiriya, li me gardiyanan jî weha hatibû, me çi bixwesta yuzbaşî ji bo me dianî, heta car-carna me û wî li gel hev vedixwar, wî qedeha xwe li ya me dixist û digot:

— Bi kêfa ko em ê van kesan bînin rê.

Bîr û baweriyên me, bû bû weke yên yuzbaşî, heta car carna em bi xwe ji wî hîn xerabtir û hîn xeddartir difikirîn. Her tiştê me, hebûna me bû bû jiyana wê girtîgehê, jiyana girtîgehê jî, lêdan û işkence bû. Di jiyaneke weha de mirovê çawa nebe sadîst, mirov ê çawa ji însanetiyê dernekeve«.

Dema wî digot, carna hêsir ji çavê wî dihat, carna sor û mor dibû, carna jî krîz dihatinê û carna weha hêrs dibû ko min digot niha ew ê li min bid e.Weha xuya bû ko ew êdî aciz bû bû, loma cixareyek pêxist, ew ji îzahkirinê, ez jî ji guhdarîkirinê westiyabûm. Ez bi xwe jî ketim wan xem û xeyalên girtîgehê yên ko min jî tê de derbas kiribû. Gotinên wî ew serpêhatiyên girtîgehê yek bi yek dianîn bîra min. Lêdan û nebaşiyên wan gardiyanan dikete bîra min, carna ez jî wer dibûm, ko min digot hema ez ê rabim û vî bikujim ko tola xwe hêlînim, lê dûre ez li xwe hay dibûm ko tol hilanîn wê bi kuştina leşkerekî nebe, kesên bixwazin tola xwe hilînin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

divê gelê xwe azad bikin, heta gel azad nebe, ma wê çawa tol bête hilanîn.

Di van ramanên hûr û kûr de min xwe wenda kiribû. Ez çûbûm wê girtîgehê, ew tiştên ko dianîn serê me, ew lêdanên li ber çavên me ko li hevalên me dikirin, yek bi yek dihatin bîra min, bi dengê wî ez hatime ser xwe ko ew dibêje:

— De ka ez ê dîroka cixare kişandina girtîgehê jî ji te re bêjim, dûre em herin malê, ez bi xwe vestiyam, wer xuya ye ko tu jî ne kêmî min e.

— Baş e, de ka bêje.

"Bi îcateke nû me kişandina cixarê jî ji bona girtiyan qedexe kiribû. Ev îcata leşkerekî jî hêla Derya Sipî bû. Tiştê ko me dikir ev bû: berê me gardiyanan di nava xwe de biryara cixare topkirinê dida û em ji hev bela dibûn, em her yek diçûn qawişên xwe, dema me kapaxa şibaka ko di deriyê qawişê de vedikir, hemû girtî diketin sekina nîzamî, berpirsiyarê qawişê direviya ber derî, komûta xwe ya nîzamî dida. Piştî komûta wî min digot:

— Berpirs,iyarê divê tu cixareyên di qawişê de hemûyan bide hev. Eger yek cixare di qawişê de bê dîtin, tu zane wê çi bê serê we.

— Tu emir bike komutanê min. Me şibake digirt û em derdiketin, me dizanîbû ko emirê me wê bê cih, piştî qederekê dema em li qawişê vedigeriyan, berpirsiyarê hemû cixare li ber deriyê qawişê berhev dikir û li benda min bû. Hemû cixare li ber derî li hêla hundir dida serhev, carna jî dema cixarên me diqediyan, pakêtên wan li derve didan serhev û me kê çi şikil cixare bixwesta ji xwe re derdixistin. Ji xwe di dema qedandina cixareyên me de, me ev yeka hanê dikir. Bi vê yekê him me tiryakiyên qawişê tespît dikir,in him ew disîplîna ko me dixwest, tesdîq dibû. Tu karî bêje »gelo çima we dixwest tiryakiyên qawişê tespît bikin« belê ji xwe ya girîng jî ev bû, ji wan kesê tiryakî gelek bi saya serê cixaran, bûne alîkarên me, gelek ji wan kesên tiryakî, nikarîbûn bê cixare kişandinê bisekinin. Me ew kesên weha derdixistin, cixare dida wan û peyv ji wan digirt, ev jî bû bû îcata me ya nû. Bi vê metodê em gelekî bi ser ketibûn.

Her qawiş pêwîst bû ko lîsteya xwe ya cixarekirînê, rojên duşema hazir bikirana û bidana gardiyanê xwe. Dîsa rojeke duşemê bû ko me gardiyanan gazî hev kirin Çi ye, ne çiye, hate gotin ko qawişa ...... ketine grewa cixare nekişandinê em çûne vir, gardiyanê wê qawişê dest pê kir û got:

— Hevalno! qawişa min lîsteye xwe ya cixarekirînê, nedan, dema min xwest, berpirsiyarê wan ji min re got: »kesek cixare naxwaze« bi rastî jî li

gor nîzama girtîgehê ev grewa cixarenekişandinê bû, hema berpirsiyarê me yê gardiyan ê bloka D bi awayekî zirt deng li berpirsiyarê qawişê kir:

— Berpirsiyar zû were. Çi ye ev halê we? Çima we lîsteya xwe ya cixarekirînê nedaye gardiyan?!

— Komutanê min kesekî ko cixarê bikirin tune ye, hemûyan gotin em nakirin, em ê êdî cixarê nekşînin.

Berpirsiyarê me fitilî ser gardiyanê wê qawişê û got:

— Gardiyan zû derî veke û hemû girtiyan derxin derve, em binerin bê hela cixarenekirîn çawa ye!

Gardiyan derî vekir, girtî yeko yek derketin derve, em li wir qeder 20 gardiyanan top bû bûn. Ji xwe di bûyerên weha de em newêrîbûn bi tenê biçûyana ser wan. Girtî giş derketin derve. Me hina dar û hina jî jop kirin destên xwe û ketin nav wan,. Te digot belkî em di nava kerîkî pez de ne, tiştê ko me anî serê wan nayê gotin. Yên serê wan hate şikestin, yên destên wan û yên nig û parsuyên wan. Tu kes bi halekî saxlem venegeriya qawişê. Dema me li wan dida, yuzbaşiyê me li jor li me dinerî. Me girtî giş xistin halekî din, ew dîsa xistin hundirê qawişê, derî girt û gardiyanê wan deriyê şibakeyê vekir û got:

— Berpirsyar!

Berpirsiyarê qawişê reviya hate ber derî, komûta xwe da û got:

— Emir bike komutanê min!

— Heta saetekê divê tu lîsteya cixarekirînê hazir bike.

— Tu emir bike komutanê min!

— Ha îro xwarin ji we re tune ye, hûn sûcê xwe dizanin.

— Tu emir bike komutanê min!

Me karê xwe yê muqedes qedandibû, bi lêdana wan em jî hebekî rehet bû bûn, hîn em ji hev belav ne bû bûn, yuzbaşî hate ba me û got:

— Aferîm, zarokên min aferim. Ez li her derê dikarim bi serbilindayî pesnê we bidim. Îro xwarina we ya nîvro li ser min e. Divê hûn herin bajêr, li loqanta ko hûn dixwazin xwarina xwe bixwin û araqê jî vexwin. Gazî sergardiyan kir got:

— Sergardiyan.

— Emir bike komutanê min!

— Ji te re pere û van hevalan bibe, li bajêr xwarinê bide wan.

— Tu emir bike!

Bi vî awayî em fêrî lêdanê bû bûn, bi vî awayî zikê me bi kesî nedişewitî, ji ber berjewendiya xwe ya şexsî me dikarîbû her tişt bikira. Li hem-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ber wan bûyerên me, yuzbaşî hertişt pêşkêşî me dikir.

Dema nîvro em hemû li erebê siwar bûn, çûn ber loqanta ko di bin gokdelana Diyarbekrê de, ya bi navê »Asim Kebab Salonu« dihat naskirin, xwarin û vexwarina ko me bi lêdana wan girtiyan heq kiribû, xwar. Bi zikekî têr, bi çavekî sor em vegeriyan girtîgehê, ma kes hebû ko berjewendiya xwe nede pêş. Li me jî weha hatibû, ji bo pariyek nan, ji bo kevçiyek xwarin, ji bo rojek îzîn an jî ji bo qedehek araq, tiştê me dianî serê wan kesên girtî dûrî aqila bûn...«

Dema gardiyan behsa cixare û qedexerina wê kir tiştekî ko di hucran de hatibû serê qawişa me kete bîra min. Bi rastî jî tiştekî gelek eceb bû ko gelek caran ji bo cixareqişandinê gelek bobelet dihat serê me girtiyan.

Ji rojan rojeke reş bû ko bi ser qawişa me de hatibû. Em, ew kesên ko li qawişa (...)-ê diman, fermana me ya çûyina hucran derketibû. Ev yek ji bo çi bû, me pê nizanîbû. Ji xwe dema tiştekî ne li gor aqilê gardiyanan di qawişê de bihata kirin, ew sûcekî mezin û gunehkariyeke giran dihat hesibandin. Cezakirina wê jî di hucrayan de dihat dayîn. Weha xuya bû ko li gor wan me jî gunehkariyeke mezin kiribû ko em birin hucrayan.

Sê rojên me qediyabû ko ne xwarin û ne jî çay bi devê me bû bû, cixarên ko bi me re bûn roja ewilî qediyabûn. Ji bilî cixarê tiştên din hewqasî nediket bîra me. Lê bêyî wê mîrata cixarê jiyana girtîgehê gelekî zor bû.

Em di hucreyên qatê sisiyan de bûn. Di rastiya xwe de ew hucrana ji bona kesekî hatibûn çêkirin, lê em her 10-12 kesê di hucrayekê de bi cih bû bûn. Di her qatekî de pênc hucre li kêleka hev hatibûn rêzkirin. Hucreyên kêleka hev, bi awayekî dizî dikarî bûn, bi hev re qise bikin û tişta bidin û bistînin. Bi vê yekê hemû hucre dikarîbûn ji hebûna hucreyekê fêde bidîtana. Lê pêwîst bû gardiyan, ji têkiliyên me yên bi hevre haydar nebana. Dema cixareyên me diqediyan, me gazî hucra kêleka xwe dikir û digot:

— Hevalno, cixarên me qediyan, gelo hûn dikarin ji me re çend cixara bişînin. Bersîva wan ev bû:

— Na, heval na, yên me jî qediyane.

Bi dengkirin û pirsê em têdigihîştin ko cixareyên hemûyan qediyane. Me nema dizanîbû êdî em ê, bê cixare çi bikin, weke gelek caran me wê carê jî kesere xwe berra hundirê xwe da. Ji tehamulê pê ve tu tiştekî ko me ê bikira tune bû.

Dem dema nîvro bû, gardiyan gazî kir:

— Ker kurên keran, çend kes zû werin jêr, em ê îro xwarinê bidin we. Piştî birçîbûna sê rojan, xwarin wê baş û xweş ba, loma jî hema çend hevalan bi lez û bez xwe hazir kirin û li benda gardiyan rawestiyan. Hatina gardiyan, vekirina derî û derketina pênc hevalan bû yek. Xwarin li me hate belavkirin, hevalan ew qerewanên vala birin jêr, di vegerê de çend sandoixên porteqalan bi wan re hebûn. Dema çavên me li wan sundiqokên porteqalan ketin, kêfa me hemûyan gelekî hat ko piştî xwarinê em ê portakalan jî bixwin. Her hucreyê sandixek bi para wan ket. Di her hucreyekê de em 10-12 kes diman. Dema ko sundoqa porteqalan dirêjî hundir dibû, kêfa me gelekî dihat û me di dilê xwe de digot: »em ê îro têr porteqalan bixwin û bi vê kêfê me duaya xwarinxwarinê bi dengekî gelek berz xwend. Piştî qedandina duayê hema gardiyan gazî kir û got:

— Binerin kurên keran ew porteqalên ko min ji we re anî ne, pêwîst e, ko hûn hemûyan tevî qalikên wan bixwin, eger ez qalikekî li derûdora we, li erdê bibînim, hûn dizanin bê wê çi bê serê we. Bi vê gotina gardiyan re kêfa me hate şikestin û şûna wê kêfê tirsek û xofeke nû kete nava me. Em difikirîn ku; »gelo em ê çawa van qalikan hemûyan bixwin, gelo em ê çawa lezeteke ji van porteqalan bigirin«.

Di her hucrayekê de doşekek hebû, piştî qedandina xwarinê me ew sindioqên portokalan danîn orta xwe û me xwe li dor wê da hev, ko gelo em çi bikin ko ji van qalikan xelasbin, ji xwe bê cixaretî yê jî li serê me xistibû, em saxmirî bûn. Di vî haletî de hevalekî bi kêf got:

— Hevalno min rê dî, min rê dî....

Me hemûyan bi yek dengî:

— Te çi rê dît kuro, de ka zû bêje, berî ko gardiyan bê em van bixwin. (Di cihê teng de serê mirovan gelekî dişuxule hele hele di girtîgehan de, li hember her tiştê qedexekirî mirov rêyên xweş didît)

— Hevalno ka em portekalên xwe bixwin û qalikan jî têxin nava vê doşekê, eger pê bihesin wê demek dûr û dirêj bigre ,wê demê kes nizane ko ev ji alî kê de ketine vir.

Ew keşifa wî hevalî bû bû wek keşîfa Kiristof Colombo ko dema Emerîka keşif kiribû...

Me bi awayekî rehet hemû porteqalên xwe bi kêf û eşq xwarin, me porteqalên xwe qedandin, lezeteke xweş jê girt û dû re dest bi çirandina doşekê kir. Heval destê xwe tije qalik kir û xiste nava doşekê ko wan bi cih bike, hîn wî destê xwe bi şûnde nekişandibû ko weha li me mêze kir, mizmizî, em ji wê rewşa wî î bikêf şaş bûn ko gelo çima ew weha mizmizî,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hema wî bi awayekî devliken got:

— Mizgîniya min li we hevalno, ez ne şaş bim tiştê ko destê min çûye ser, cixare ne.

Ji ber ko car carna me tinazê xwe ji bo wan tiştên me yên xilasdibûn bi hev dikir. Me digot dibe ko ev heval henekê xwe dike û me gotê:

— De qeşmeriyê xwe bi me neke, ji xwe halê me ne besî me ye, îcar tu jî tinazê xwe dike. De zû karê xwe biqedîne ko hîn gardiyan nehatiye.

Wî qet bersîva me neda, hema hêdî hêdî destê xwe ji nava doşekê kişand ko pênc cixare di nav destê wî de bûn. Çavê me hemûya bi hevre çûbûn ser wan cixareyên ko di destê heval de bûn. Kêfa me gelekî hat, bi rastî ew kêfa, ji kêfa keşîfkirina Emerîka xweştir bû. Me hema zû bi zû hemû qalik di nav duşekê de bi cih kirin û gazî hevalên hucreyên din kir ko ew hucreyên ji qawişa me pêk hatibûn, me cixare dirêjî wan kir. Serê her hucreyekê cixareyek ket.

Piştî belavkirina cixareyan em, ew kesên di hucra me de hemû li hev kom bûn. Me cixara xwe pêxist û yekî ji destê yekî din digirt, hilmeke kûr lê dixist, em bû bûn weke wan kesên esrarkêş, me yekî cixare dirêjî yekî din dikir û me her yekê hilmek bê îman lê dida. Ji xwe heta dor hate hevalê dawî cixare jî qediya. Wî hevalî jî bi lêvşewitandina xwe, xwe gîhand hilma dawîn.

Piştî nekişandina cixarê ya bi çend rojan, ew hilma ko me lêxist, weke em hemû fêkî, mêwe û xwarinên dinyayê bixwin bû. Mirov digot belkî ev cixare xusûsî hatiye çêkirin, ew hilma wer bêhneke xweş da me ku, qet nebên...

Belê, me bicîkirina qalikan di nava duşekê de, him xwe ji xwarina wan azad kir, him jî bi saya serê qalîkan me cixare dît, lê dûre çi bû an wê hîn çi biba me nema pê dizanîbû. Dibe ko ew qalikên me di doşekê de bî cîh kir bibe bela serê hin girtiyên din...

## VII

»Her lêdan û dîtina babetekî işkencê ji yên berê hîn zortir dibû. Ji ber vê bû ko em her gav, di lêgerîna dîtina metodekî işkenceyên nuh de bûn. Her roj babetekî din yên îşkanceyê ji alî me ve dihate dîtin. Me her carê babetekî lêdan û metodên nû peyda dikir. Ji wan yek jî hevdîtina girtiyan û ziyaretçiyên wan bû. Me dixwest ko em weha li wan bikin, êdî kes nexwaze ziyaretçiyên wî werin. Lê em di vê de qet biserneketin. Me ji kesên diçûn ziyaretê re digotin divê tu ji ziyaretçiyên xwe re bêje:

— Êdî bes werin ziyareta min!

Dema girtiyan weha ji merivên xwe re digotin, wan jî lê vedigerindin:

— Ji bona çi, êdî em neyên, bêyî dîtina te sebr û hewiya me nayê.

Girtiyan nikaribûn bigotina »Gardiyan weha dixwazin û dema hûn tên bêtir tadê li me dikin« ji ber ko di dema hevdîtina wan de ji me yek em li ba ziyaretçî û yek jî li ba girtî radiwestiyan. Ev jî bû bû weke biryarekê ko em girtiyan û ziyaretçiyên wan tenê li ba hev nehêlin, dema ew bi tenê diman tiştên ko girtiyan ji ziyaretçiyên xwe re digotin, wan jî hinekên din li ser dikirin û derdixistin derve. Ew işkence û tadeya ko di girtîgehê de dibû, digîhandin her derê, heta gelek caran ji Ewropa heyet dihatin, ji bo vê bû ko êdî me girtî û ziyaretçiyê wan bi tenê nedihiştin û em bi xwe li hinda wan disekînin. Dema wan tiştekî li dijî girtîgehê bigotina, me ew dibirin hucran li wir heta tu bêjî me li wan dixist, çend caran ziyaret, ji bona kesên weha qedexe dikir. Daxwaza yuzbaşiyê me ew bû em bi van metodan ziyaretçiyan kêm bikin, lê nebû, tenê çend kesên tirsok û li gor gotina ne komunist û kurtçî bûn ji tirsa lêdanê ji ziyaretçiyên xwe re digotin:

— Eger careke din hûn werin em ê neyên dîtina we.

Di vir da daxwaz û hêviyên ko yuzbaşî dikir pêk nehatibûn, loma wî serê xwe li ser metodekî nuh diêşand, difikirî û hêrs û ecêpmayî dima, ko piştî ewqas lêdan, bi hejmareke zêde ziyaretçî dîsa têne girtîgehê. Car carna yuzbaşî çend operasyon li ziyaretçiyan jî çêkir, di wan operasyonan de, wî çend kes jî dida girtinê, lêdan û işkence bi wan dikir, ko ew êdî bes


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

werin, lê wî çi dikir, hatina ziyaretçiyan ji girtîgehê kêm ne dibû.

Rojên ziyaretê, ji heftê carek bû û qasî 20-25 saniye para mirovekî diket. Di wê dema kurt de tenê girtî û ziyaretçiyên xwe dikarîbûn li hev mêze bikin. Ji xwe me axaftina, ko li gor me fuzûlî, ji holê rakiribû, tenê girtiyan dikarîbûn, ji mirovên xwe re bigotina: »tu bi xêr hatiye, tu çawa ye, ez baş im.« Li gor wê kêmwextiyê, dîsa ziyaretçî gelek dihatin. Em bi xwe gelek caran ji ber vê rewşê şaş û matmayî diman ko wan girtiyan çawa tehamula lêdan û işkencên weha dikirin. Ew çawa ji vê çûyin û hatinê zivêr nedibûn. Em ji ber vê rewşa wan î çûyin û hatina ziyaretê şaş mabûn, gelek kes êdî me dinasîn ko ew her rojên ziyaretê li girtîgehê amade dibûn. Rojên ziyaretê ji bona me him dawet û him işkence bûn. Dawet bû, ji ber ko wê rojê me lêdanek taybetî dikir û em li wan kesên xwenda û zana siwar dibûn. Ew roj ji bona me işkenceyeke taybetî bû. Ji ber ko em gelekî diwestiyan, ji birin û anîna girtiyan, ji serê sibê heta êvarî rûniştina me tunebû.

Di destpêka ziyaretê de me ew lîsteyên ko ziyaretçiyên wan dihatin digirt û diçûn qawişan û navê wan dixwendin, ko ew xwe hazir bikin. Dema me ew derdixistin derveyî qawişê, ji bo ko em wan bibin, me ji wan re digot:

— Binerin divê hûn tu îşaretan nedin, an axaftinên zêde nekin. Eger hûn di cihê ziyaretê de bi awayekî nîzamî nesekinin, hûn ê bi saxî venegerin qawişê. Berî ko em wan bibin bi fortên weha me ew li salonê, li benda dora wan didan sekinandin. Li wir carna me li wan dida, carna jî xeberê nebaş digot, ji ber ko hin kes hebûn, ji lêdanê zêde xuy nedikirin, lê dema me çêr (axaftinên nebaş, xeber) dida, bi wan gelekî nexweş dihat, gelek pê diêşiyan. Dema dora wan kesên ko wê biçûyina ziyaretê dihat, me ew dixistin rêzê û em her yek li wan siwar dibûn, ko ew me hetanî ber cihê ziyaretî hilgirin. Em her yek 70-80 kilo li wan kesên hestî û çerm mabûn siwar dibûn, bi zorê em hildigirtin, ji ber hemû bê teqat û bê hêz ketibûn. Me kêfeke gelekî xweş dikir, me gazî hevalên xwe dikirin, tinaz û henekê xwe bi wan dikir, carna hin hevalna digotin :

— Hespê min ji yê te baştir e. Yekî din digot:

— Hespê min yê rewan e,

— Na wele hespê min ji yê we xurttir e, binerin ez li wî didim, lê ew nakeve erdê.

Ji bilî zimanê tirkî, bi zimanekî din axafin qedexe bû, eger kesekî ev pêk neaniya, me ew dibir hucran û li wir her babet işkence bi wan dikir, ne

tenê girtî, pêwîst bû ko ziyaretçiyên wan jî tenê bi tirkî qise bikirana. Gelek ziyaretçiyan ya bi tirkî nedizanî bûn, yan jî haya wan jî biryareke weha tunebûn ko ev pêk nedianîn. Wê demê me, ew girtiyê ko ziyaretçiyê wî, bi tirkî qise nedikir, ji cihê ziyaretê derdixist û dibir cihê lêdanê. Bi vî awayî me rojên ziyaretê li wan kiribû rojê agir, roja lêdan û işkencan. Lê me çi dikir û ne dikir, ziyaretçiyên wan kêm ne dibûn, ji bo nekêmbûna wan, em û taybetî yuzbaşiyê me, gelekî aciz dibûn«.

Dema gardiyan behsa sûcan kir rewşa hevalê Nûrî, ko çû bû ziyaretê kete bîra min. Rojeke ziyaretê bû, ko bi dîtina merivekî xwe kêfa me gelekan dihat, hele hele dema gardiyan navê hevalê Nûrî xwend, kêfa wî ji ya me bêtir hatibû, ji ber ko mala wan li Mêrdînê bû û her hefte mirovê wî nikarîbûn bihata dîtina wî, dema ziyaretçiyaekî Nûrî dihat, ken bi rûyê wî diket, bi kêfeke weha bi xwendina navê xwe wî jî xwe li ber derî amade kiribû ko gardiyan were û wî jî bibe cihê ziyaretê.

Saeta wê gruba ko hevalê Nûrî jî di nava wan de bû, hatibû ko gardiyan hate banî wan kir, hemû heval bi kêf derketin, lê yê herî bi kêf Nûrî bû. Gardiyanan ew derxistin û birin, piştî ko ji cihê ziyaretê vegeriyan herkesek bi nizamî û bi serhejmar ketin hundir, tenê Nûrî li der di nava wan gardiyanan de ma bû, gardiyan gazî kir:

— Nûrî.

— Emir bike komutanê min.

— Kurê kerê, ma min çend caran ji we re gotiye ko qisekirina bi kurdî qedexe ye? Çima te bi kurdî li gel bavê xwe kiseqir, te got »bavo lûfik«.....

— Komutanê min wele ez bi kurdî nepeyivî me.

— Ha tu min derewçîn derdixe ha. Û bû tepe repa joban.

— Na komutani min na, tenê min got bavo ji min re lûfikekî bîne.

— Aha biner dîsa tu bi kurdî axafî.

Tiştê ko em tê gihiştin gardiyan ji bona wê bêjeya »lufik«ê li Nûrî dida. Nûrî jî tê gihişt ko sedema lêdanê ev e, Nûrî çi kir ko gardiyan ji wî bawer nekir ko »lûfik« bi tirkî »lîf«e, loma gardiyan gazî hevalê mesûl kir:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

— Zû derkeve derve. Hevalê mesûl bi lez û bez derket wî jî komûta xwe bi awayekî nîzamî da. Gardiyan got:

— Biner tiştê ez ê ji te bipirsim, divê tu bi awayekî rast bêje, ya na tu dizane wê çi bê serê te jî.

— Emir bike komutanê min.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Lûfik çiye?

— Komutanê min »Lûfik« bi kurdî ye û tirkiya wê jî »Lif« e, ji bilî vê ne tu tiştekî din e.

Dîsa rojeke ziyaretê bû, navê min hate xwendin ko herim ziyaretê. Ji xwe tu hefteyên ko ziyaretçiyên min nehatana tune bû. Ji ber ko pîreka min her hefte rojên ziyaretê li ber deriyê girtîgehê amade dibû, heta carina hevalan henek dikirin û ji hev re digotin:

— Gelo hefteyekê xwişka me Hava neyê wê çi be?

Yekî din digot:

— Wele ez ji vê duayê re nabêm amîn, ne mumkune ko Hava neyê. Hatina wê gelekî baş e, moralê dida hevalê Sîdar, rojên ziyaretê Sîdar çiqa lêdanê bixwe jî ji bona wî ne ewqas girîng e.ûhw.

Dema navê min hate xwendin ez jî weke hevalan, li benda dora çûyinê rawestiyam, piştî ko gardiyanê me got:

— Ew kesên min navên wan xwendin bila derkevin.

Me hemûyan bi hevre got:

— Emir bike komutanê me.

Dema min xwe gîhand cihê ziyaretê, tenê diya min li benda min bû. Bi hatina diya xwe tenê tirsekê ez girtim ko gelo çima ew tenê ye, ji ber wê bi tirkî nizanîbû, ew ê çawa bi min re qise bikira! Ez jî ketim hundir kabînê, hema diya min bi tirkî got:

— Kurê min tu çawa ye?

Ez weha tê gihiştim ko diya min bi tirkî fêr bû ye, loma vê carê ew bi tena xwe hatiye ziyareta min ko hunerê xwe nîşanî min bide, hema min jî bi tirkî û bi kêfa ko ez yek ser bi wê re qise bikim, lê vegerand.

— Ez başim dayê, tu çawa ye?

Bi vê gotina min re çavê diya min tije hêsir bûn, devê xwe venekir, hinekî ponijî û dûre bi kurdî got:

— Ez başim lawo, hema bila tu û hevalên xwe ji min re sax...

Hîn gotina wê neqediya bû, gardiyan bi milên min girt û ez ji wir durxistim û birim salonê. Li wir têra min li min da ko çima diya min bi kurdî peyiviye.

Piştî ji girtîgehê derketim, rojekê diya min li kêleka min rûniştîbû. Destê xwe da ser serê min bi porê min lîst û nişkave got:

— Wa Sîdar, tew aniha kete bîra min ko rojekê ez bi tena xwe hatibûm ziyareta te.

— Belê dayê, belê.

— Kurê min, hîn min axaftina xwe neqedandibû ko hema tu bî carekê veji ber çavên min wenda bûyî, min nema dizanîbû çi bi te hat. Ma xêr bû?

Min bi awayekî bi ken bersivand:

— Dayê dema te bi kurdî gote »ez başi m« gardiyan bi milên min girt û ez birim cihê lêdanê li wir heta tu bêje li min da.

— Wey ez bi qurban, ma min nizanîbû lawo, tirkiya min jî hew ew du bêje bûn, piştî ew qediyan min nexwest ez qise bikim,. Min got tenê ez ê ji xwe re li te binerim. Lê min xwe negirt û bêhemdî bi kurdî ji nava lêvê min derket.

»Rojên ziyaretê ji bona me karekî zehmet bû. De were girtiyan bibe û bîne, ji serê sibê hetanî êvarê rûne ne. Me gelek caran bi rehetî firavîn nedixwar, em ji vê yekê gelekî hêrs dibûn û me hêrsa xwe di serê girtiyan de derdixist. Bi lêdan û işkenceyên taybetî dixwest ko ziyaretçiyên girtiyan kêm bibein. Me dixwest ko girtî ji kesên xwe re bêjin bes werin. Lê me çi kir û nekir em bi vê yekê bi ser neketin. Me li wan kesên ko ziyaretçiyên wan dihatin, dixistin û ji wan re digot: »ji bo çi ziyaretçiyên te tên« û li wan kesên ko ziyaretçiyên wan nedihatin jî dixist ku«çima ziyaretçiyê nte nayên« êdî girtî ji me zivêr bû bûn, wan jî êdî ne dizanibû ko ew ê çi bikin, ji ber ko me aciziyên xwe bi lêdana wan derbas dikir«.

Rojek ji rojên ziyaretê bû. Ji xwe êdî em jî fêrî wê rojê bû bûn, ko ji alî gardiyanan de, têra xwe û bi lêdaneke taybetî dihatin cezakirin. Ew aciz bûn ko »çima ziyaretçiyên me tên«. Lê me jî dixwestin ko ew werin. Ji ber ko gardiyan wê rojê gelekî diwestiyan, ji destpêka ziyaretê hetanî qedandinê, ew jî bi me re diçûn û dihatin, gelek caran jî ji ber deriyê qawişê hetanî cihê ziyaratê li me siwar dibûn. Ji xwe ew tiştên ko ji me re dihatin gardiyanan yên bi kêrî wan dihat, ji xwe re dibirin, tiştên digîhandin me jî, ne bi awayekî saxlem bûn. Weke; gomlek hustukira wan dihat çirandin, çakêt astarê wan dihat derxistin ûhw.

Belê gruba qawişa me ya ewilî çûbûn ziyaretê, di vegerê de, li ber deriyê qawişê, gardiyan got:

— Têkevin hundir. Hemûyan bi hevre weke elokan deng derxistin û gotin:

— Tu emir bike komutanê me.

Piştî qederekê deng bi gardiyanê me ket û got:



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Ew kesên çûne ziyaretê û tiştên xwe ne girtine bila werin û bêjin. Bi qedandina wî hema hevalê Azîz ji nava me derket çû ber derî, berê silava bi niga, dûre ya bi serî û dawî jî got:

— Azîz Mêrdîn emir bike komutanê min. Piştî komûtê, Azîz domand. Komutanê min, bavê min ji min re çeqmaq anîbû, lê ew çeqmaq ne di nava tiştên min de bû.

Ji me yekî weha bigota xelasiya me ji destê gardiyan tune bû, ji ber ko bi vê gotarê gardiyan dibûn diz, ma gardiyan tucarî dîziyê dikin, li gor gardiyana tucarî tiştên xerab dikin.(!) Na, na, lê îro hevalê Azîz, bi wendabûna çeqmaqê xwe ew kiribûn diz(!) . Ev ji bona gardiyanan kêmanî bûn, ma çawa dibe ko ew diziyê bikin(!) Ma ev gotara hanê, wê çawa ji Azîz re bi ma. Loma gardiyan bi hêrs got:

— Baş e, derkeve derve

Heval Azîz bawer dikir ko wê gardiyan çaqmaqê ko bavê wî, jê re aniye lê vegerîn e. Derketina Azîz û tepe repe lêdanê bû yek. Axîn û qêrîn bi Azîz ket. Em, ew kesên di hundir de, me nedizanîbû ko êdî wê çi bê serî wî. Piştî lêdanê gardiyan rawestiya û got:

— Kurê min çi yê te wenda bû ye.

— Azîz Mardîn emir bike qomûtanê min, bavê min ji min re çaqmaq anîbû, lê min hîn ew negirtiye.

Di xelasbûna gotara Azîz de hema gardiyan çend kulmên din li wî xist, dîsa bû tepe repa wan (Ji dengê lêdanê em têgihiştin ko ne tenê gardiyanê me li ber derî bû, bi wî re çendên din jî hebûn) li ser serê Azîz. Gardiyanê me bi zirt got:

— Kurê kerê, tu çawa me dike diz? Tu çawa ew Mehmetçikê ko namûsa we diparêzin dike diz. Naxwe tu xayîn e, yanîtu dixwaze hemû Mehmetçîkan dîzek bide naskirin? Naxwe tu ye, yê mejiyê kesên nezan dişo.

Wan weha sûcê hevalê Azîz giran kirin ko ew bi xwe jî poşman bû bû, lê êdî tiştek ji destî wî nedihat. Ev kiryarên wan î weha ji bona ko kesên din nebêjin tiştê me wenda bû, dihate kirin. Bi rastî jî ji wê rojê pê de, çi tiştên me kê wenda biba, me nema diwêrîbû bigota. Dûre gardiyan got:

— Naxwe te em hemû gardiyan kirin diz ha!

— Na, komutanê min na, estefxuralla qesta min ne ew bû, ko ez komutanê xwe bikim diz, na heşa, ew kesên namûsa me diparêzin, ma wê çawa tiştên me bidizin. Ne mumkun e ko ew tiştekî weha bikin, dibe ko ketibe, dibe ko bavê min bi şaşî gotibe.

Bi lêdaneke baş, hevalê Azîz him bavê xwe derewçîn derxist û him jî ew çeqmaqê ko bavê wî ji wî re diyarî şandibû girt(!).

»Piştî rojên ziyaretê me girtîgeh dikir du beş, beşek serê sibê û beşê dudiyan jî piştî nîvro, saxtiya qawîşa û girtiyan dikir. Serê sibê piştî taştê û serhejmarê me hemû qawîş derdixistin salonê, hemû girtî li wir tazî dikirin, yeko-yek kincên wan kontrol dikir, bi jobên xwe me car carna li qûna wan jî mêze dikir ko bê hela tiştek heye yan na. Ew weha tazî li wir dihatin sekinandin, carna lêdan carna jî meşa di cih de dikirin ko heta lêgerîna qawişê xilas bibe.

Di qawişê de me tiştek li ser tiştekî nedihişt, cilên wan diçirandin, pere û saetên wan ji xwe re dibirin, doşekê wan diçirandin ew pemboyê nava doşekan hemû bera ser hev didan, yek doşek saxlem nedima, bi mebesta ka hela bê wan tu tiştên xwe yên bi dizî di hundir doşekê de veşartine an na. Me bobelatdianî serê wan, piştî saxtîkirinê, me ew dixistin hundir û pêwîst bû ko wan berî serhejmara êvarê qawîşa xwe weke berê kiribana, doşekê xwe dagirtibana, kincên xwe ji nav hev veqetandibana. Bi vî awayî jî dilê yuzbaşiyê me ne dihat cih loma wî dixwest ko em hîn bêtir tiştan bînin serê wan.

Ji ber pirbûna ziyaretçiyan, di seranserê girtîgehê de me hemû karên xwe yên şexsî bi girtiyan didan kirin. Di destpêkê de me kincên xwe û gelek karên xwe yên şexsî bi wan da kirin. Weke: Şûştina kincan, şûştina firaxên mitfaxê, haziriya xwarina hemû girtîgehê ûhw. Ji bona karên weha me hemû qawiş xistibûn dorê. Me weha li wan kiribû ko dema hîn em li derve bûn, me gazî qawişekê bikira, pêwist bû ko hemûyan bi hev re bigotina »emir bike komutanê me«an jî dema me bigota bila kesek xwe ji bona derve hazir bike, pêwîst bû ne yek, ber derî ji girtiyan bihata dagirtin û dema vekirina derî li gor pêwîstiyê me çend kes derdixstin, yên din vedigeriyan cihê xwe«.

Qawişa ko ez tê de bûm, dora me ya hazirkirina malzemeyên xwarinçêkirinê hatibû, ji bo vê, dema gardiyan hîn li derve gazî qawişê kir û got:.

— Qawişa ...

Me hemûyan bi yek dengî got.

— Emir bike komutanê me.

— Bila çardeh kes xwe ji bona derketina derve hazir bikin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Tu emir bike komutanê min.

Ew dengê me î weha bi hev re weke dengê Elokan derdiket. Dema mirov dihare nava wan û difikîne, hemû bi hevre deng derxin: Gul, xul gul, xululu.

Li me girtiyan jî weha hatibû, dema gardiyana li derve bigotina qawiş, me jî bi yek dengî bersîv didan.

Gava gardiyan hate ber derî, em gelek kes ji bona derketina derve li benda wî bûn, bi vekirina derî re, me yeko û yek xwe jimart û em derketin derve, hevalê dawî jî got:

— Çardeh û dawî ye komutanê min.

Wî derî girt em dudo dudo ketin rêzê, nig fer û nig çot bi me da kirin. Dûre bi meşa komando û xwendina sirûdên leşkerî, berê me da matbaxê. Dema me xwe gîhand matbaxê ,li wir çardeh telîsên tije hebûn, gardiyan emir da û got:

— Qawiş bisekine. Em bi yek tepînê û repînê re sekinîn. Wî domand:

— Her kesek li ber telîsekî bisekin in. Em ji hev belav bûm, zû bi zû em her yek li ber telîsekî sekinîn, me bi lez û bez dikir ko dereng nemînin. Eger kesên dereng bimana têra xwe lêdan dixwarin, ji bo ko em lêdanê nexwin, em fêrî zûbûna kar bû bûn. Dû re gardiyan got:

— Her kes weziyeta telîshilgirtinê bigir in. Me devê telîs li hev dipêça û destên xwe li dor devê wî dişidand, me hebekî xwe bi ser telîs de xwar dikirin û li benda emirekî din radiwestiyan. Wî got:

— Hilgire.

Bi dayina wî emirê re jî pêwîst bû ko me hemûyan bi hev re û bi yek carê, barê xwe daniya ser pişta xwe, me ev karê xwe jî diqedand îcar wî dîsa digot:

— Qawiş bi awayekî nizamî ber bi pêş de bimeşin. Dibû tepa repe me, bi yek dengî, bi yek nîzamê, me dest bi meşa xwe dikir, li ser pişta me ew telîsê giran û bi awayekî nîzamî meş û xwendina sirûdên leşkerî dixwendin, di bin barê giran de, em diketin rewşeke ecêp, ji xwe kêf û zewqa gardiyana jî, ji rewşên me î weha re dihat. Car carina jî wî digot:

— Yek. Me digot:

— Dudo.

Ew telîsên tije fasuliyên kesk ê taze û ne ji bo xwarina girtiyan bû, jî bona gardiyanan bûn. Dema ko em dihatin ber deriyê qawişê me yek bi yek hejmarê xwe digot û diketin hundir qawişê û yê dawî digot:

— Çardeh û dawî ye, komutanê min.

Piştî serhejmara girtîgehê ya êvarî, pêwîst bû ko ew tiştên ketine hundir hemû bihatana paqijkirin. Paqişkirina wan fasuleyan ji bona qawişeke biçûk, heta serê sibê didomand, piştî wê demê êdî kesek nikarîbû razan Ji ber ko dema rabûna sibê bû. Bi vî awayî gelek caran wan hin qawiş weha heta serê sibe nedidan razandin. Ji xwe ev kar ne karê me girtiyan bû, ji bona ko gardiyan ji xwe re vexwîn û kêf bikin, wan ev bi me didan kirin. Yuzbaşî jî ji vê rewşa ko gardiyana dianî serê me, agahdar bû bû, loma kêfa wî jî ji vê yekê re dihat.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# VIII

»Hêdî hêdî dawayên girtiyan dihatin dîtin. Ev ji bona me, him karekî nû, him jî awayê lêdanê yên nû derdixist holê. Ew kesên ko dawayên wan vedibûn, ji alî dadgehê dihatin bankirin, gelek kes bi hev re diçûn û dihatin. Di her vekirina daweyekê de, ne kêmî 10-20 kesî heta gelek caran hîn jî bêtir dibûn, birin û anîna wan ne weha rehet bû, ji xwe dema dawevekirinê yuzbaşî em hemû top dikirin û dîgot:

— Hevalno, (wî di rewşên nazîk de weha xîtabî me dikir) binerên ji îro pêde ev karê we yê muqades dikare hîn zortir bibe, ji ber ko êdî hûn ê van kesên dijminên gelê me bibin dadgehê û bînin, di birin û anîna wan de divê hûn gelekî agahdarî xwe bin, hevalên wan, yên li derve dikarin bi çek werin pêşiya we, we bikujin û wan birevînin, ya dudyan ew bi xwe jî dikarin li we bidin û xwe ji makînan bavên û birevin. Ji bo vê yekê ye ko divê hûn gelekî agahdarî xwe û wan bibin, pêwîst e ko hûn, hîn bêtir agahdarî xwe bin.

Dema kuştin an lêdana me dikete holê, me nema tu tişt dinasî, ji dilva ko em ê bêne kuştin, bila hinên din lêdanê bixwin çêtir e. Bi van bîr û baweriyan dema me ew dibir û dianîn tiştê ko dihat serê wan, ji bona me bû bû işkence û lêdaneke taze.

Me çûyîn û hatinên dadgehê, li wan kiribû rêya işkencê. Ji ber wê işkenca ko me li wan dikir, gelek ji wan nedixwestin herin dadgehê, ji xwe armanca yuzbaşiyê me jî ev bû. Daxwaz û biryara yuzbaşiyê me ew bû ko dema riyeke ji kesên girtî re bihata vekirin, wî bi her awayî dixwest wê bigire. Tiştê yuzbaşiyê me jê ev bû, ko gelek kes di neticeyên dadgehê de, dikarîbûn bê suç bihatana dîtin û azad bibana, bi rêya berdanê, girtiyên me kêm dibûn, ev kêmbûn jî ne dihate hesabê yuzbaşiyê me. Zêdebûna girtiyan kêfxweşaya me û wî bû.

Serê siban berî belavkirina taştê me li hemû qawişan navên kesên ko wê herin dadgehê dixwend , da ko ew jî piştî taştê xwe hazir bikin. Ji xwe tu haziriya wan î zêde tune bû. Haziriya wan ew bû ko dema me gazî wan bikirana, ew zû bi zû derbiketina der. Li wir tiştên xweş(!) me dianî serê

wan. Piştî xwarinê em gardiyan li qawişan belav dibûn, her qawişek em çend gardiyan diçûnê, navê wan kesên ko wê herin dadgehê dixwend û ew derdixistin derve. Me, li wir bê gotin û pirs têr li wan dida, ev ji bo çavtirsandina çûyina dadgehê bû, dûre me ew şûtî tazî dikirin, bi sedema ko em wan kontrol dikin, bê ka bi tu kesekî re tiştên qedexekirî heye ya na. Ji xwe me dizanî bû, ko kes nikare tu tiştekî bi xwe re derxin. Girtiyan jî ev yeka baş dizanîbûn. Lê dîsa jî me li wan weha dikir, ji ber ko yuzbaşiyê me gelekî ji wan ditirsiya. Her dem tirsa girtiyan di dilê yuzbaşî de bû, her gav wî digot: »Evana dikarin xilas bin û me hemûyan bikujin«. Ev tirs qet ji dilê wî dernediket.

Piştî me kontrola xwe ya ber deriyê qawişê diqedand, ew dixistin rêzê û em her gardiyanek li yekî ji wan siwar dibûn, heta cihê ko hemû girtî lê diciviyan. Li wir diviya bû ko serê hemûyan di ber wan de ba. Lewra yuzbaşiyê me ji me re di got : »Binerin hevalno, vana mirovên gelekî fêlbaz in. Dema ew li hev binerin, ew dikarin bi çavan îşareta bidin hev, yekîtiya xwe li hember we pêk bînin û li we bidin, ji ber vê yekê ye ko divê hûn rê nedin wan ko ew li hev mêze bikin.« Dema lêdana me diket ortê, me çi dikir û çi nedikir, me nedihişt yek serê xwe rake û zêdeyî pêşiya xwe bibîne, zêdeyî nîv metro, pêşiya xwe dîtin, ji bona wan qedexe bû, eger ji wan kesekî serê xwe hema bi şaşî çenekî zêde rakiribana, dibû tepe repe joban li ser serê wî. Me dîtîn û nerîna wan li gel hev qedexe kiribû. Herkesê ko ji alî gardiyanê xwe dihat wir, pêwîst bû li wir bisekiniyana ko heta hemû girtiyên ko wê biçûna dadgehê bihatina. Sekina li wir ji xwe lêdan û işkence bû, ji bilî vê jî, meşa di cihê xwe de bi wan dihate kirin û sirûdên leşkerî me bi wan didan xwendin. Ji her çar aliyên salonê de dengê ledan û qêrînê dihat, roj dibû roja me. Piştî hemû girtî ji alî gardiyanên xwe dihatin wê meydanê, dûre sergardiyanên me diketin nav gartiyan, têra wan li wan didan. Ji xwe cihê ko sergardiyan hazirbana hertişt ji alî wan de dihat meşandin, karê lêdanê û zirtan ji me re nedima, sergardiyana fort û zirtên xwe jî dikirin û digotin:

— Binerin li dadgahê, çûyîna toweletê, pozê xwe kişandin, av xwestin, li dereke din nêhêrtin, ji bilî pirsên sawcî û hakîm, tiştên din gotin qedexeye. We fam kir?

Kesekî vê famneke tune bû, loma jî hemû girtiyan bi hev re digotin:

— Tu emir bike komandanê me.

Biryara yuzbaşiyê me ew bû ko hemû girtî, bi kincênyek rengî herin dadgehê û werin ko kesek bireve, ew dikare di nava wan kincên de zû bête


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

girtin. Loma jî em ketibûn ambarên ordiyê ji bona girtiyan, ew kincên ko bi salan e ji alî leşkeran de nedihat li xwe kirin, dianî û li wan dikir, bîhneke gelekî pîs ji kincan dihat. Me nikarîbûn xwe nêzî wan kincan bikira, lê girtî di nava wan de rojekê disekinîn, ji wê bêhna genî gelek ji xwe derbas dibûn. Me ew kincên weha pîs didan ser hev, komî cîhekî dikirin, piştî ko hemû girtî diketin rêzê, me gardiyanan her bedlek ji bo kesekî datanî nêzîkî wî û sergardiyan digot:

— Waziyeta kinc li xwe kirinê bigrin!

Bi rastî dîtin û gotin ne weke hev e, dema ew emir ji wan re diçû, gavakê bi pêşde dihat in, li ber cilên xwe radiwestiyan û xwe hebekî bi ser cilan de ditewandin. Waziyeta kinc li xwekirinê weha bû, eger kesekî destê xwe bi kincanbikirana, an jî kesekî xwe netewanda, delîl li halê diya wî kesî bû. Piştî emirdayînê, sergardiyan serê xwe radikir weha bi awayekî ji xwe bawer li girtiyan dinerî, bê hela her kesekî emir tam bi cih anî ye ya na. Girtiyên reben carna di wê rewşê de qederê 5-10 deqîqeyan radiwestiyan û li benda emirê dudyan ya sergaridyan dipan. Dûre emirê dudyan bi dengekî berz û ji xwe bawer ji alî sergardiyan dihat dayîn:

— Li xwe bikin. Bi gotina wî û lixwekirina kincan dibû yek, loma piştî emirê dudyan, sergardiyan dom dikir:

— Divê heta hejmara sisiyan, bi awayekî bê qusûr kincan li xwe bikin.

Dest bi hejmartinê dikir.

-Yeeek..Dudoooooo û sisêêêêêêê.

Eger piştî qedandina hejmara sisiyan, hin kes dereng bimana, lêdana xwe dixwarin.

Bi vî awayî girtiyan ew kincên gemarî li xwe dikirin. Piştî lixwekirina kincên emirekî din dihate dayîn »nigfer û nigcot« kesê girtî bi yek dengî û bi yek tepe -repê ew jî pêk dianîn. Dû re sergardiyan bi dengekî hîn berztir digot:

— Rewşa zîncîrkirinê bigrin!

Bi dayîna vê fermanê, girtiyan xwe daqûl dikirin, destê xwe didan pişt xwe û radiwestiyan. Girtî weha radiwestiyan ko em wan bi hev re, bi zincîrên qalind girêbidin. Ji xwe yuzbaşiyê me, bi zanebûn zincîrên qalind û giran hilbijarti bû.

Me her 15 kes dikirin grûbek û ew bi yek zincîrê bi hevdu va didane girêdidan, dûre bi wî halê girêdayî, meş bi wan dikirin û sirûdên leşkerî bi wan didan xwendin. Tam di haziriya çûyinê de pêwîst bû ko yekî serê xwe daniya ser milê kesê pêşiya xwe ko ew ji ber xwe pêve tu dereke din

nebîne. Di rewşên weha de, serê xwe rakirin an jî pozê xwe kişandin qedexe bû, bi vî haletî me ew dibirin ber makîna dadgehê, ew jî hema erebebûn(!), gelekî kevn û weke tabûtan bûn. Yuzbaşiyê me digot: »Divê em makînên nû ji van heyvanan û dijminên miletê xwe re, bi kar neynin. Makîneyên weha ji serê wan û yên bavê van jî zêde ye. Di pêşiya wê de tenê şibakeyeke biçûk hebû. Ew şibake jî, ji alî me de dihat girtin. Yanî me xwe dida ber wê. Ew tirimbêla ji bona 5 an jî 6 kesan hatibû çêkirin, lê ji bona ko em zêde eziyet û tadê bidin wan me qederê 20-30 î kes li wan makînên kevn û xerabe dikirin, bi rastî carna hîn zêdetir jî dibû. Ji bona kesekî an du kesan me nikarîbû makîneyeke din amade bikira, loma çend kes zêde jî bana me ew dixistin wê erebê.

Piştî ko hemû hazirî dihat qedandin, me ew li tirimbêlan siwar dikirin, em qederê 6-7 gardiyanan jî bi girtiyan re li wan tirimbêlên weke mezelan siwar dibûn, da ko ew bi hev re qise nekin, tiştan ji hev re nebêjin û fêrî agahdariyên nû nebin, eger em li gel wan siwar nebana, wan dikarîbûn gelek tiştên li dijî me ji hev re bigotana û dikarîbûn yekitiya xwe pêk bianiyana, ji bo ko ew ji hev haydar nebin, em diketin nav wan, di wê makîna ko ji bona çend kesan hatibû amadekirin de, him em li wan siwar dihatin, him jî heta ber deriyê dadgehê me li wan didan, eger bi şaşî jî bêjeyek ji devî yekî derketa yan jî pozê xwe bikişandana, xwe tev bidana, lêdan dixwarin. Xwe xurandin jî ji alî me de hatibû qedexekirin, ji ber ko her dem yuzbaşiyê me digot: »Van girtiyên komunîst, van kesên bê dîn û îman, van kurtçiyan, dema xwe dilivînin, duxrînin, ew dikarin îşaretan bidin hev«, loma me evtişt hemû li wan qedexe kiribû. Her çiqa me li wan dida, her çiqa wan bi ya me jî dikir, lê dîsa her dem yuzbaşiyê me ji wan ditirsiya. Sedema vê yekê hîn jî min bi xwe fam nekiriye! Wan kesên dest û nigê wan girêdayî, wan kesên ko heroj di bin darên zorê de bûn, dîsa jî yuzbaşiyê me gelekî ji wan ditirsiya.

Di wê makîna weke mezelekî û qedere 20-30 kesî tê de bi cîh dibûn, em di hundir de li girtiyan siwar dibûn, em rehet nedisekînin, di wir de jî me tade û işkenceyên mezin dida wan. Li gor gotina yuzbaşî »me çiqa li wan bida, ewqasî em welatparêz dihatin hesibandin.« Ji ber vê bû ko lêdana me bê ser û ber dihat kirin. Di wê makîna ko tenê şibakeyek bi çûk di pêşiya wê de hebû, ew jî ji alî me de dihat girtin. Em hildikişiyan ser serê girtiyan û me cixarên xwe pê dixist û me henek û tinazê xwe bi wan dikir, me gazî hev dikir:

— Lo lo ez çûm qatê dudiyan, çima tu nayê mêvanderiya min?

Ji me, yekî din jî weha bi ser girtiyan de diqêriya:

— Binerin pozkişandin qedexe ye, ew kî bû pozê xwe kişand?

— Ew kî ye hilma sert dide û dîstîne, ev tişt îşaretin, em dizanin, hûn weha bi hev re diaxifin.

Di rewşên weha zor de, me ew dibirin heta salona dadgehê, li wir me zincîrên wan vedikirin, ew didan rûniştandin, ew jî ne ji bo xatirê wan bû, ji ber ko emir weha bû, loma ew didan rûniştandin. Dema ew rûdiniştin, bi me tade dîhat, çawa dibû ko dijminê me li hember me û bê lêdan û işkence weha rehet rehet rûnên, ma qet ev çêdibe? Ji ber vê bû ko dema me ew didan rûniştandin, serê wan dixiste ber wan ko ew der û dora xwe nebînin. Rûniştina wan pêwîst bû bi awayekî nîzamî ba. Kesên berê diketin salona dadgehê weha radiwestiyan heta ko hemû hevalên wan yên din jî bihatana dûre me ew, bi awayekê nîzamî, weke me digot, didan rûniştandin.

Me her yek li ser kursiya ko ji bona wan hatibû hazirkirin, dida rûniştandin. Destên wan li ser çongên wan û pêwîst bû çavê wan jî tenê li dîwarê hember dîwarê pêşiya wan; di ser serê hakîm re weha nivîsandî bû: »Adelet, temelê mulk e« lê bi rastî çi adelet, çi adelet... Serê xwe hejandin çavên xwe li derên din gerandin an li hevalê xwe mêze kirin qedexe bû, kesên weha cezayên xwe dizanîbûn...

Dema navê kesekî ji alî hakîm de bihata xwendin, pêwîst bû ko wî bi dengekî gelekî berz bigota:

— Emir bike komutanê min.

Gelek caran hakîm, bi komûtdayina girtiyan ya weha aciz dibû. Ew emir emrekî ji alî yuzbaşiyê me de hatibû dayîn û tu kesî nikarîbûn ev biryara bidana guherandin, ji ber ko yuzbaşiyê me li girtîgehê û di biryarên wir de azad bû, tu kesî nikarîbû, têkilî karî wî bibûna.

Dema navbir ji alî hakim de dihat dayîn, gelek caran hin girtiyan digot in:

— Komutanê min, mîza min gelekî tê, tu nemaye ko ez bi xwe de berdim, ez nema dikarin xwe bigirim, musade te hebe...Hîn wan peyva xwe nediqendin, bersîva ko ji wan dihat dayîn tenê û bi tenê ev bû:

— Bi xwe de berde, ma tu nizanî ko li vir her tişt qedexe ye.

Dema şûnde hatinê de delîl li halê diya gelekan bûn. Ji bo me jî daweteke nuh bû. Me sûcên ko wan kirine, tespît dikir an jî li sûcên wan ko pê dihatin sûcdarkirin hay dibûn. Eger di nava wan de, kesên ko leşker û polîs kuştî derketibana ne hewceye ko ez bêjim, êdî tê zanîn ko wê çi

bihata serê wan. Ma tenê ev, na, na, hele hele ew kesê ko bi serokatiyê bihata ithamkirin, heta girtîgehê lêdan dixwar, car carna jî bi awakî ji xwe derbasbûyî me ew dixiste hundir qawişa wî«.

Belê vegera ji dadgehê kete bîra min, bi rastî jî çûyin û hatina wê bi serê xwe işkenceyeke nû bû.

Em ji serê sibê hetanî piştî nîvro û car-carna jî hetanî êvarî li dadgehê, tî, birçî, bê cixareqişandin û îstirehetkirin diman. Derdê her tiştî dihate kişandin lê neçûyina tuwaletê qet nedihat îdarekirin. Carna me hina bi xwe de dikir û me hina jî hetanî vegerê xwe digirt. Eger hin hevalên ko bi îshalê (zikêş) di nava me de hebana, ya herî xerab rewşa wan bû. Di vî haletî de, dema em vedigeriyan girtîgehê, hin kesên ko hîn di bin xwe de nekiribana hebana jî, hina ji wan bi saya serê wê lêdana li ber deriyê qawişê, bi xwe de dikirin.

Hevalên ko saxlem xwe digîhandin hundir qawişê jî bi ketina me ya hundir û çûyina me ya çar-çar bi hevdû re ya towaletê dibû yek. Ji ber ko di qawişa me de tenê towaletek hebû, taqeta me nema bû ko em li benda hevalê ko çûye towaletê rawestin, hema me çar bi çar qûnên xwe didan hev û pîsîtiya xwe di towaletê de berdidan. Em fêrî vê yekê jî bû bûn, carna jî me pêkenîn li ser vê rewşê çêdikirin. Carna me tinazên xwe bi hev dikirin, me navê vê danîbû towaleta bi çar qolî.

»Ji xwe veger ji bo girtiyan mirin û ji bo me gardiyanan şahiyeke nuh bû, di hundir wê makînê de 20–30 kes bi cih kirin bi serê xwe cefayeke mezin bû. Ji bo ko girtî di makînê de bi cih bibana ew mecbûr diman ko xwe bi hevdu ve bizeliqînin, îcar ji bona em wan bê şexsiyet bikin, me digot:

— Biner, binerin bê ev çi bi hev dikin, ji xwe ji bo komunîsta her tişt serbest e.

Bi van tade û işkenceyan me dixwestin ko ew poşmanbûnên xwe li dadgehê bêjin û hevalên xwe bidin dest, loma yuzbaşiyê me her dem ji me re digot: »Pêwîst e ko êdî hûn lêdanê li wan kesên poşman dibin û hevalên xwe yên mayî didin dest, nekin. Kesên weha êdî dibin, welatperwerekî tirk.« Ji xwe mebesta lêdana çûyîn û hatina dadgehê jî yek jê ev bû ko herkes poşmaniyên xwe bêje û hevalên xwe yên derve bidin dest, lê yuzbaşiyê me di vir de jî bi ser neket, her çiqa çend kes bi dest xistin jî, ew hemû ne li gor dilê wî bûn.

Ew kesên ko poşmaniya xwe li dadgehê digotin, ew bi makînên taybetî

û bi awayekî gelekî xweş diçûn û dihatin, ev rehetiya wan me weha ji girtiyên din re digot:

— Girtîno, eger hûn jî weke wan kesên baqil û serê xwe dan şuxulandin bibin. Li xwe bifikirin, hûn ê jî weha bi rehetî herin û werin. De êdî hûn dizanin.

Gelek caran jî me dixwest ko em nabiza girtiyan fam bikin, loma dema ko navber ji alî hakîm dihat dayîn, em diketin nava girtiyan û me bi wan henek û tinazên xwe dikir û bi awayekî tinazî me digot:

— Kesên ko dixwazin herin towaletê hene, eger hebin bila ew kes ji cihê xwe rabe ser niga.

Bi vê gotinê ken bi rûyê girtiyan diket, wan bawer dikirin ko bi rastî jî ew ê herin towaletê, loma jî çend kes ji cihê xwe radibûn ser niga û li benda me radiwestiyan. Me jî ew kesên rabûne, ji nav wan kesên din derdixist û dibirin saloneke din, li wan mêze dikir û me digot:

— Hûn dixwazin herin towaletê ha.

Hemûyan bi hev re digotin:

— Belê komandanê me.

— Ma gelo ew kesê leşker diçin towaletê?

Girtiyan mebesta me fam dikirin loma jî wan digotin:

— Na, komutanê me.

— Ê de baş e, ma çima hûn dixwazin herin?

— Me şaşî kir komandanê me.

Ew kesên ko ji bona toweletê rabûbûn, li wir me têra wan li wan didan, dûre me ew vedigerandin cihê wan. Çûyina towaletê weha pêk dihat. Di navberdayina dadgehê de, tiştên ko dihate serê kesên girtî, ne dihate serê wan kesên li gor me welatparêz û li gor girtiyan xwefiroş e, ji bona wan tu tiştekî qedexikirî tune bû. Wan çi û çawa bixwestina weha dibû. Me ew ji nava girtiyan derdixistin dibirin salonê didan rûniştin, li wir zikê wan têr dikir, çay dida wan û piştî ko wan cixareyên xwe jî dikişandin, dûre me ew dianîn salonê, devê wan bi ken serê wan rakirîbûn. Bi vê yekê yuzbaşiyê me dixwest ko kesên çav li van bikevin, ew jî bibin mirovê wî û ew jî her tiştî bêjin.

## IX

»Ew girtiyên wê girtîgeha bi navûdeng ya Diyarbekrê tu carî têr av venedixwarin, ji ber ko me av bi zanetî nedida wan. Sedemê nedana me ya avê jî ev bû, dema ava girtiyan heba, wan xwe û hundirê qawişên xwe paqij dikirin. Paqijî jî ji bo wan, dermanê nedîtî bû, ji bona ew her dem gemarî û pîs bin, av ji bo wan nedihate dayîn. Yek sedem ev bû, ya dudan jî ew bû ko me dixwest ew her dem, tî bin da ko em karibin ji wan hina bi saya serê tîbûnê fêdeyekê bibînin. Me baş dizanîbû tîbûn, ji birçîbûnê zortir e. Em vê yeka hanê ji yuzbaşiyê xwe fêr bû bûn.

Me gelek caran qederê 4-5 bîdonên avê êvaran didan wan, me dizanî bû bi êvarekê wê nikaribin wê avê hemû xilaskin, ji xwe me av piştî xwarinê dida wan, dûre serhejmara tevayî, çûyîn û hatin, saet dibû 17.00 - 18.00. Ji xwe pêwîst bû ew saet 19.00-an de razên. Yanî bi kurtasî ew ava ko dihate dayîn, heta serê sibê di haletê xwe de dima. Serê siban jî berî xwarina taştê me gazî qawişên xwe dikir û digot:

— Qawiş!

— Emir bike komandanê me.

— Çiqa ava we heye, li gel pênc kesan derxin derve em ê vê salona gemarî bişon.

Tu tiştekî wan bigotana tune bû, tenê wan dikarîbû bigotina:

— Tu emir bike, komandanê me.

De bifikire ko qawişa herî biçûk 40-50 kes tê de dijiyan. Van kesan rojên xwe bi qedehek an nîv qedeh av derbas dikirin, ev ji alî yuzbaşiyê me de bi zanetî dihate kirin.

Pênc kesên girtî, li gel melkis û ew bîdonên tije av, xwe ji bo derketina derve li ber derî amade dikirin ko heta em bihatana, me derî vekira ew jî derketina û salon bişûştana. Şûştina salonan jî awayekî işkencê bû, ez vê jî ji te re bêjim, bê me çawa ew salon bi wan didan şûştin:

Dema ko me derî vedikir, ew kesên xwe ji bo derve amade kiribûn yeko yek jimara xwe digotin û derdiketin, kesê dawî weke her dem digot pênc û dawî. Li salonê diketin rêzê û li benda emirê me radiwestiyan û me digot:



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Tiştên xwe bigrin!

Bi yek dengî û yek demê de hemûyan tiştên xwe hildigirtin û digotin:

— Tu emir bike komutanê me.

Ji xwe armanca me, ne şûştina salonê bû, du armancên me hebûn, yek ji bo ava wan biqede ya dudiya njî me tinazê xwe bi wan dikir. Demên xwe î vala bi wan re derbas dikir, dema wan tiştên xwe digirtin, digotin:

— Emirê te hate cih komutanê me.

Me digot:

— Rewşaşûştinê bigirin. Rewşa şûştinê jî weha bû, kesên melkis di destên wan de bûn, serê melkisên xwe digîhand erdê û bi awayekî daqûlkirî li benda emirekî din dipan. Ew kesên bîdonê avê di destê wan de bûn jî, pêwîst bû wan jî him xwe daqûlbikirina û him jî bîdonê xwe, diviyabû dilopeke av jê nehata rijandin, ji xwe mebest ew bû ko hin di demê vê emirdayînê de xwe şaş bikin da ko em jî li wan bidin. Piştî emirdayin û bi cih hatinê, me weha li wan dinerî, bê hela kesekî xwe şaş kiriye heye an na. Dema kes tuneba, îcar me digot:

— Dest bi şûştinê bikin, heta hejmartina sisiyan, divê hûn salonê biqedînin û me dest bi hejmartinê dikir, yeeek, dudooo û sisêêê.

Him me dizanî bû, ew nikarin wê salona dirêjaiya wê di ser 50 metreyî de di dema ko me digot bişon û him jî wan dizanîbû. Lê dîsa wan bi awayekî ecele dest bi karê xwe dikirin, lê salon di dema xwe de nedihat qedandin. Wan tenê dikarîbû dermanê şûştinê bera erdê bidin û ava xwe jî lêbikin, ji bilî vî karî tiştekî din kirin dûrî aqilan bû, îcar me zirt û fort li wan dikir, weke wan karê xwe di demê de temam nekirine û bi awayekî sert bi ser wan de diqêriyan û digot:

— Razên!

Piştî vî emirdanê wan hemûyan bi yek carê û bi yek dengî xwe li ser wê avê û dermanê şûştinê dirêj dikirin û li benda emirekî din radiwestiyan û me digot:

— Bişon!

Wan dizanîbûn, îcar wê salonê çawa bişon, wan xwe di nava wê av û dermanî de dibir û dianîn ko heta salon ziwa bikirana, dûre radibûn ser xwe û digotin:

— Emirê te hate cih komutanê me.

Me weha awirekî xerab diavêt salonê û bi awakî hîn hêrstir digot:

— We ev salon baş paqij nekir, cezayê we hîn girantir bû, de îcar rewşa lêdanê bigirin.

Rewşa lêdanê jî weha bû, pêwîst bû ko girtiyan destekî xwe bidana ser yê din û li benda dora xwe radiwestiyan ko heta dor bihatayê. Ew destên şil dema jop jî lêdiketin, ji bona me kêfeke xweş ji bona wan işkenceke zor bû. Ava ko me dida wan bi vî awayî dihate qedandin«.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# X

»Ji bona em şikil û metodên lêdanê yên nuh îcat bikin, em bi hev re ketibûn, musabakeyekê Di dema razanê de em bêtirîn li ser tiştên weha difikirîn, loma jî dê, bav, jin û zarên me, êdî nema diketin bîra me. Loma êdî me bi rehetî rojê metodekî lêdanê peyde dikirin. Lê ew metod çend rojan tesîra xwe rê dida, pişt re girtî fêrî wê jî dibûn, êdî tesîra wê jî zêda nedima. Lewra me pêwîstiya dîtina cûrên lêdanê yên nû hebûn. Ew awayên lêdanên kevnar êdî zêde tesîra xwe li girtiyan nedikir, îcar tiştekî nuh ji alî hevalekî din ve hatibû dîtin. Ez wer bawerim ko wê tesîreke dûr û dirêj li ser girtiyan hişt, ji ber me tam li hedefê xistibû. Ji bona girtiyan tiştê herî girîng, têkiliyê nava wan, bi hev re axaftina wan bû, me dixwest ko em vê jî ji nava wan rakin. Loma emir ji hemû qawişan re hate şandin:

— Girtîno, divê ji îro pêde, di hundirê qawişê de, axaftina du kesan bi hev re, yanî sohbet di nava we de qedexe be. Kesê weha wê bêne cezakirin. Û wan baş dizanîbû ko ew ji alî me de çawa têne kontrolkirin û cezakirin.

Ev yeka hanê me weha pêk dianî: Weke berê jî hatibû gotin, girtî her dem di hundirê qawişên xwe de ji alî me de dihatin kontrolkirin, îcar dema me di wan qulikên, şibakên di dîwêr de li wan mêze dikir û kesên li gel hev qisedikirin bidîta, hema zû bi zû me hina hîn kontrola xwe didomand û gardiyanê qawişê li gel çendên din jî, derî vedikririn û em dîçûn hînda ranzeyên wan li ser qise kiribûn, disekinîn û me gazî wan dikir:

— Ew kesên li vir bila derkevin derve. Her kesekî dizanîbû ko ew kesên bi hev re qise kirine dernekevin wê hemû qawiş bête cezakirin, ji bona hemû qawiş neyê cezakirin ew kesên sûc dikirin(!) bi riza dilê xwe derdiketin, eger derneketina jî, piştî cezakirina qawişê, me ew kesên bi hev re diaxifîn dibirin hucreyan û bi rojan li wir dihiştin. Gelek ji wan êdî venedigeriyan qawişên xwe, loma wan zêde li ber xwe nedidan. Dema ew kesên li gor me sûcdar derdiketin, em jî li dû wan diçûn derve û me deriyê qawişê digirt. Dûre em, ew gardiyanên salonê li ser serê wan diciviyan û me digot:

— De ka bêjin, we çi plana revê çêdikir, we çi haziriya serîhildana dikirin, de ka zû bêjin.

Ew tiştê me bi xwe digot, em pê nebawerbûn, tu kesekî ko bikaribûna ji wê girtîgehê birevin tune bû, ew girtîgeh weha hatibû çêkirin ko ne mumkun bû kesek bikaribe xwe ji wir azad bike. Lê ji bona em çavên wan bitirsînin û ji bona ew bi hev re qise nekin, me ev yeka hanê dikir û digot, hevalekî me yê din jî beşdarî nava axaftina dibû û digot:

— De ka zû û rast bêjin, yan na em ê we têxin nava du metre paçikên sipî û bişînin malê.

Gotina girtiyan pere nedikir, ji xwe wan çi bigotana, me bawer nedikir û lêdana xwe dikir, me gelek caran digot: »kuro te çi digot, eger tu nebêje ez dizanim«. Bi xêra van axaftinên me gelekên tirsok diketin feqa me û dibûn zilamên me, dibûn, muxbîrên me, bi saya serên kesên weha ew tiştên di qawişê de dihat axaftin, em jê haydar dibûn.

Gelek caran me ne dikarîbû ew kontrol bikirana, ji bona vê pêwîst bû, ko em li ber şibakan bisekinin û li girtiyan mêze bikin. Ev jî ne karekî hêsan bû. Loma êdî ji bo rehetiya xwe me, piştî taştê û serhejmara giştî, hin qawiş derdixist derve li wir meş û sirûdên leşkerî bi wan didan kirin û xwendin, lê yên di hundir de diman, pêwîst bû ko ew jî têketina sekinandina nîzamî û heta xwarina nîvro, ya ew pirtûka ko ji 102 rûpelan ya »Ataturk îlke ve ‹nkilaplari« bixwendana yan jî di cihê xwe de meşa di cih de bikirana û sirûdên leşkerî bixwendina. Bi vî awayî bi hindikayî be jî, me têkiliyên nava wan kêm dikir. Di rewşên weha de çûyuna toweletê û vexwarina avê li gor destûra berpirsiyrê wan yê ko ji alî me de hatibûn hilbijartin, dihate kirin.

Xwendina wê pirtûkê jî weha dihat kirin: Kesek ji girtiyan dihate orta kesên din li ser niga û nîzamî disekinîn. Berê yê li ortê rawestiyayî bi dengekî gelekî berz dixwend û yên din li wî vedigerandin. Ev hal heta navrojê didomand, berî ko em firavînê bidin wan, me dengê wan girtiyan yeko yeko kontrol dikir û kesê ko dengê wî neketiba, delîl li halê diya wî jî bû. Ji xwe ew kesên ko dengê wan ketibûn, rewşa wan hîn xirabtir dibûn, qirik û gewrî li wan perçe dibû.

Bi saya serê wan şibakên di dîwarên qawişan de, me bi awayekî rehet dikarîbû girtî bidîtana, ew kontrol bikirina, lê wan nikarîbûn em bidîtana. Loma jî her gav ew di bin kontrola me de bûn, wan ne dizanîbûn ko em çi demê, li wan dinerîn. Loma bi piranî daxwazên me pêk dihatin. Eger ne bi tevayî be jî me ew têkiliya nava wan kêm kiribû«.

# XI

»Roj bi roj şikil û metodên işkenceyan zêde dibûn, Girtiyan bi xwe nema dizanîbûn, êdî çiyê bête serê wan. Loma wan nema dikarîbûn, li hember işkence û metodên nû, xwe hazir bikirana, çi bihata pêşya wan ew mecbûrî bi wê razî dibûn. Hingî metod û şiklê işkencan peyde dikirin, em bi xwe jî aciz bû bûn, êdî em û yuzbaşiyê xwe gîhêştibûn wê baweriyê ko kesên girtî bi darê zorê teslîm nabin. Tenê tiştek di destê me de mabû, ew jî ev bû ko em bikaribin bi darê zorê ji nava wan hin alîkarên xwe çêbikin û bi saya serê wan em kesên ko hîn li dij me yan jî kesên li dijî girtîgehê qise dikin, yan jî morala berxwedanê didin hevalên xwe tespît bikin, da ko em êdî li ser kesên weha rawestin. Ji ber vê bû ko êdî me ji bilî hin caran lêdana tevayî rakiribû, her roj me hin kes ji qawişê derdixistin û lêdan li wan dikir ko em rewşa wan û cesareta wan î li hemberî lêdanê fêr bibin û pirsên li gor xwe ji wan bipirsin. Ev bû bû karê me yê rojane, bi dor me hin kes derdixistin derve û pirs ji wan dikir, ko bê rewşa kesên lêdan li wan dihate kirin çawan ne? Ew ê bikaribin xwe li ber lêdanê rabigrin an na. Bi vê metodê, me gelek kes kirin alîkarên xwe. Bi vê metodê êdî mirovên me, alîkarin me di qawişan de peyda dibûn, bi saya serê wan êdî me ew kesên hîn nehatibûn rê û li dijî me qisedikirin, derdixistin derve û işkence bi wan dikirin û ji wan re digot:

— Biner e, kurê min, derketin an jî mayîna te î li vir girêdayî rewşa te ye. Yuzbaşiyê me dikare kesan berde û bigire, eger tu daxwazên me bîne cih, tu dikarî di demekê kurt de ji vir azad be. Sucê te çi dibe bila bibe, berdan an jî mayîna te di destê yuzbaşî de ye. Dema em ji wî re bêjin ko tu alîkariya me dike, wê ji îro pê de tu lêdan li te nebe. Karê te wê tenê di hundirê qawişê de be. Tê guhdariya axaftina şexsan bike, bê ka ji hev re çi dibêjin. Eger hin kes li dijî me qise bikin, tê navên kesên weha bi dizî bide me û pêwîst e ko girtiyên din ji rewşa te agahdar nebin. Em ê hewl bidin ko tu kes bi vê rewşa te nizanibin. Ji du rojan carakê em ê banî te bikin û te derxin derve, tê jî her tiştî ji me re bêje û dema vegerê tê bike axîn û ofîn weke ko me gelekî lêdan li te kiribe. Ji girtiyan re bêje

»gardiyan ji bo lêdanê bangî min kir« bi vî awayî him tê ji lêdanê xilas be, him jî tê zû ji vir bête berdan. Lê, eger tu tiştên rast nebêjî, tiştên ko wê werin serê te jî divê tu pê bizanibe. Bi vî awayî me hin kes bi dest xistin, hin kes jî qet nehatin rê, qasî ko me lêdaneke zor û giran li wan dikirin, dîsa kesên weha tu tişt ji me re nedigotin.

Ew kesên bûn alîkarên me, ne ji wan kesên kurtçî û komunist bûn. Ji xwe hinên din di qawişan de hebûn ko ew bi xwe dijminê komunist û kurtçiyan bûn, kesên weha dema dîtin, em xwedîtiyê li wan dikin, gelek ji wan bi xwe hatin û digotin : »Ez dixwazim bi her awayî alîkariya we bikim« erê me ew guhdarî dikirin, lê rûmeta kesên weha zêde tune bû, dema karê yuzbaşî bi wan diqediya, êdî wî jî guh nedida wan.

Mirovên muxbîr zû dihatin deşifrekirin, me nema dizanîbû ko çima ew weha zû deşifre dibûn. Em weha têgihiştin, ko mirov nikare di nava kesên zana de, li dijî wan, demeke dûr û dirêj kar bike. Dema wan zilamê xwe yên muxbîr nasdikirin, nikarîbûn tiştekî bi wî bikirana, ji ber wan dizanî bû ko ew kes ji alî me de têne parastin.

Heta ez bi xwe li wê girtîgehê gardiyan bûm, min nedît ko rojekê ji rojan wan kesên girtî têr av vexwarin û xwarin xwarin, ji bilî wan kesên alîkariya me dikirin, yên din hemû tî û birçî bûn. Ew kesên girtî yên alîkariya me dikirin, rewşa wan gelekî baş bûn, lê wan kesên ko di berxwe didan, rewşa wan jî gelek xerab bûn. Ji bilî van, girtiyên din hemû kêm zêde, mirov dikare bêje wek hev bûn. Ji bona wan serşûştin, kincşûştin hatibû jibîrkirin, me cihê xweşûştinê yanî ew hemama ko ji bo wan, hatibû çêkirin, kiribû cihê işkencê.

Tenê dema hin heyet ji Ewropa, an hin kesên ko digotin em mafên mirova diparêzin dihatin girtîgehê, wê demê him hemam vedibû, him xwarineke xweş ji girtiyan re dihate çêkirin û belavkirin, ew jî tenê ji bona rojekê bû ko ew kesên ji Ewropa dihatin, rewşa girtîgehê baş bibînin. Lê piştî çûyina wan, me him heqê xweşuştinê û him jî heqê xwarina xweş ji bêvila wan derdixist.

Niha jî ez dixwazim li ser rewşên weha, ji te re çend mînakekê bidim.

Dema di medya tirkiye de, di derheqê girtîgeha Diyarbkerê bi awayekê negatif propaganda dihat kirin, wê demê yuzbaşiyê me ji bona ko wan tiştan, bi awayekî nerast bide diyarkirin wî Televizyon dawetî girtîgehê dikir, hemû filmên girtiyan yên li gor dilê xwe me dida kişandin û li hember wan ew didan weşandin. Roja wê Televizyon bihata, wê rojê me hemama girtîgehê dixiste halê xweşûştinê, û dibû xuşe xuşe ava germ û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

sar, te digot belkî ev hemama tucarî nebûye cihê lêdan û işkencan. Piştî me hemam hazir dikir, berê televizyon dibir wir. Ew hemama, ava germ û sar jê dihat, rê wan dida û wan jî fîlm dikişandin. Dûre me çend qawiş dixiste rêzê ko werin serê xwe bişon, me girtî li qawişên wan tazî dikirin, tenê li ser wan derpê dihişt û taseke hamamê dixiste destekî wan û destê din jî de xewliyên wan û bi terlikan me ew ji qawişên wan derxistin, di salona mezin nîşanî dibirin hemamê, televizyonciyên me jî filmê wan dikişandin. Fîlmkêş dîçûn hêleke din. Dema ew diçûn me jî weke her tim dest bi hejmartinê dikir. Yeeek...diidooo...sisêêê, ji xwe kesî nikarîbû xwe di demeke ewqas kurt de bişûşta. Me jî nedixwest ko ew serên xwe bişon. Bi vî awayî, him me li hember medyaTirkiyê û hin caran, jî li hember raya giştî ya dinyayê rûyê xwe spî dikir(!)...«

# XII

»Di gelek rojên bîranîn û cejnên neteweyî yên me tirkan de, me tiştên ecêp dianî serên girtiyên wê girtîgehê. Ji bîranînên wan rojan yek jî bi taybetî, roja 12 îlonê bû. Ew roj, dibû roja lêdan û işkenca girtîgehê bi tevayî. Ji xwe me gelek caran dîtinên lêdanê, metodên nuh di rojên 12 îlonê de bi kar dianîn. Di wê roja pîroz de pêwîst bû ko me hin girtî, seqet bikirana û gelek caran jî ji bo vê roja hêjayî bîranînê de me hin qurban jî ji bona wê dida. Hatina wê rojê di rûçikên wan kesên girtî, yên komunîst û kurtçiyan de bû, loma jî divê me kesekî an hin kes anji bona wê roja pîroz bikirana qurban.

Serê siban dema me ew xwarina, ji nîv qedeh çay, an jî ji nîv tas şorbe dida wan, bi dayînê re me digot:

— ‹ro 12 îlonê ye, pêwîst e ko hin ji we di nava du metre paçê sipî de herin malê. Mana vê ew bû ko diviya bû hin bihatana kuştin. Ne ko me ev ji ber xwe digot, serê sibê, dema em diketin kombûnê, yuzbaşiyê me Esat Yildirim, digot:

— Hevalno weke hûn dizanin, îro roja 12 îlonê ye, ev roj ji bo her welatparêzê tirk rojeke pîroz e. Eger ev roja nehatiba, belkî niha ji me gelek tunebana, belkî welatê me biba du perçe, ew kesên wê ev bikrana jî, ji wan hinek niha di vir de girtî ne. Pêwîst e ko zikê we bi wan neşewite, eger ev îmkanên di destê we de, di destê wan de ba, wê hûn hemû di nava yek saniyê de bidana ber gulan, lê em weha nakin. Em wan nakujin. Xwarinê didin wan, avê didin wan û em wan xwedî dikin. Lê ji bona xatirê vê roja ko welatê me ji destê wan hatiye azadkirin divê hûn jî weha li wan bidin ko heta taliya emrê xwe ew jî vê rojê di bîra xwe de bihêlin ûwh.

Me rebenê xwedê tu tişt nedizanî bû, piraniya me, em rastî û çepitiyê li vir fêr bû bûn, me gelekan navê kurtçitiyê li vir bihîst. Em gelekî di bin tesîra yuzbaşî de diman. Wî di gelek axaftinên xwe de weha propaganda li dijî girtiyan dikir ko girtî li ber çavên me kiribûn dijminê herî mezin. Eger wî destûra me bida me yê ew hemû di vir de


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bikuştina, lê wî her dem digot:

— Na, hevalno na, divê em wan nekujin, em ê wan xwedî bikin, em ê wan bînin rê, bila ew baş bizanibin ko miletê tirk li gel ordiya xwe çiqa bi merhamet û însaf e ko dijminê xwe nakuje.

Di bin tesîra axaftina yuzbaşî de, li me weha dihat ko em bê mejî û heş dibûn, dema yuzbaşî têdigîhişt ko em bi wan axaftinên wî gelekî muteesîr dibûn dûre digot:

— De îro roj roja we ye, ez we bibînin hevalno, ev roja roja xêrê ye. Ev roj roja xelasbûna gelê me, ji destê komunîst û kurtçiya ye. De siba we bi xêr.

Em jî weke gurê har, her yek ber bi qawişa xwe de direviyan, nêzîkî li qawişê dikir û diqêriyan.

— Qawiş! xwe ji bona derve hazir bikin. Wan bi yek dengî digotin:

— Tu emir bike komutanê me.

Ez wer bawer im ko wan jî dizanîbû, di vê rojê de wê hin ji wan, ya wê herin nexweşxanê yan jî wê di nava du metro paçê sipî de herin malîn xwe.

Ji bona du qawişan tenê cihekî me û kombûnê hebû, kîjan qawiş berê derketa ya din jî li hundir weke yên derve meşa di cih de dikirin û sirûdê leşkerî dixwendin heta ko dora wan î derketina derve bihata.

Qawişa ko ewil, derdiket derve, li wir me berê meşê, xwendina sirûdê leşkerî bi wan dikir, li dû vê jî em bi daran diketin nava wan ko weke mirov dikeve nava naxira dewaran. Ji xwe ji bo me ferqa wan û heywanan ji hev tune bû, heta yuzbaşiyê me digot: »heywan ji van kesên di vir de ne baştir û bifêdetir in« loma jî em di rojên weha de qet, ne difikirîn, ev çav e, ev poz an jî serî yê. Ev jin ev ciwan, ev seqet an jî kal e, kî çawa dikete ber darên me, me weha li wan dixist. Loma gelek kes diketin û ranedibûn, me ew dişandin malên wan û gelek kes ji wan dişandin nexweşxaneya ko ji wê girtîgehê zortir bû. Lêdana me berdewam dikir ko heta kesek bihata kuştin an jî me bizaniya va ye yek ket û êdî ew ê bimre, dû re me dev ji wan berdida«.

Rojek ji rojên 12 îlonê bû, gardiyanê me em derxistibûn derve ko meşê bi me bidin kirin û sirûdan bidin xwendin. Di dema meş û xwendina sirûdan de me ji destê gardiyanê xwe gelekî lêdan dixwarin, ji ber ko ew roj roja 12 îlonê bû, pêwîst bû, her tiştên wê rojê bi awayekî taybetî bihatana çêkirin. Di nava wê meşê û lêdanê de hevalekî nigê xwe berî me avît pêş

û gardiyan dît. Wî em dane sekinandin û li ber wî hevalî sekinî û heta jê hat, kulmek li wî da, ew ket û xwîn ji dev û pozê wî hat, ket û ranebû, gardiyan û me got belkî mir. Loma jî piştî ketina wî, gardiyan em dane sekinandin û got:

— Qawiş rahêlin cenazê xwe û herin hundir heta ez werim.

Wî em xistin hundir û çû, em weha tê gihiştin, ew ê mizgîniyê bide yuzbaşiyê xwe ko ew jî xelatekê bigire. Piştî qederekê ew bi kêf û bi bazdan li gel çend garidyanên din li qawişê vegeriya, derî vekir keniya û got:

— Mesûl ka wî kesê mirî bîne.

Hevalê mesûl li wî vegerand û got:

— Komandanê min ew kes ne mir, wî niha çavên xwe vekirin.

Bi xelaskirina gotara hevalê mesûl, rûçikê gardiyan tirş û tal bû, sor û zer bû, deriyê qawişê girt û di ber xwe de got:

— Naxwe ew ne mir ha, ne mir ha, ne mir ha!

Gelekî hêrs bû bû, ji ber ko dema ew kesê girtî nemira wê yuzbaşî tu xelat neda wî, loma hêrs bû û bi zirt got:

— Têkevîn rêzê ez ê qasî du-sê deqîqên din verim.

Wî derî girt û çû, di vegerê de li gel çend gardiyanên din li me vegeriya û got:

— Divê ez jî îro yekî ji we bikim qurbana vê roja delal.

Piştî qederekê, li gel çend gardiyanên din, bi hêrs deriyê qawişê vekir û ketin hundir, li dora me çûn û hatin, dibû nuçe-nuça gardiyanê me, bû kufe kufa wî, difikirî ko ji dilva xelatê dibe ko yuzbaşî, wî bişîne cihê wî yê ecemîtiyê, weha jê dihate famkirin ko tirsa wî ya herî giran ev bû, bi vê tirsê ew di ser me de qêriya:

— Nabe, nabe, divê îro ji we yek di nava pênc metre paçê sipî de here mal. Eger yek ji we nere yuzbaşî wê min ji dilva we bişîne malê.

Bi vê tirs û xofê, wî darê xwe rakir û dest bi lêdana me kir, bû axîn û waxîna me, bû qêrîn û warîna me, carna hin ji me diketin erdê, dîsa radibûn, serê çend kesan jî me hate şikandin, heta emirê yuzbaşî hat û gotibû, »min ew azad kir, îro têra me kes ketine, hin mirine û hin jî li ber mirinê ne«.

Belê her çiqa nava wan û yuzbaşî xweş bû jî lê dîsa ew gelekî ji wî ditirsiyan. Dema wan jî şaşitî bikirana, an jî tiştekî ne li gor yuzbaşi bihata dîtin , rewşa wan wê ne kêmî ya me ba. Her çiqa ew hatibû azadkirin jî diviyabû li hember qenciya yuzbaşiyê xwe tiştek bikira ko ew jî kêfxweş biba, loma hema wî çavê xwe li nava me gerand, wî bi destê hevalekî me


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

girt, ji nava me derxist bire derve. Piştî derketina gardiyan û heval, dengê joba dihat ko ew li wî didin, qederekê weha dom kir dûre bêdengiyek çêbû, piştî wê bêdengiyê qêrîneke gelek berz ji heval hat, çer bû, çi bû me nema dizanî bû. Deriyê qawişê hate vekirin heval ji navê û berjêrtir tazî bû, dema ew ketin hundir gardiyan bi awayekî devliken ji heval re got:

— De ka bêje, min li derve çi anî serê te, yeko yek bêje, bila hevelên te jî bi rewşa te bizanibin.

Heval dest bi axaftinê kir, ji xwe wî tiştên ko gardiyan anîbû serî negota, rewşa wî dikarîbû hîn xerabtir biba, ew dikarîbû di nava du metre paçên sibî de biçûya malê jî, loma heval got:

— Komutanê min ez derxistim derve, li wir berê li min xist, dûre got: »Jina te heye« min got: »belê« wî got:«Ez bi.... jina te«Min got: »di oxire te de ye.«Wî got, »diya te heye«min got: »belê« wî got«Ez di diya te jî.....«min got »di emirê te de ye.«Piştî van xeberdanan, wî bi alîkariya hevalê xwe pantolonê min ji min kirin, serê min berbi jêr û qûna min berbi jor hildan û job rada min, dûre ew jobê bi gû, min bi zimanê xwe dalast.

Dûre heval li gardiyan nerî û got:

— Emirê te hate cih komandanê min.

Piştî wê bobeleta gardiyan anîbû serê wî, him gardiyan hebekî rehet bû bû, û him jî yuzbaşiyê wî dema ko ev bûyer bihîst kêfa wî jî hatibû, loma gardiyan êdî ne deyndarê yuzbaşî bû...

## XIII

»Ji du mehan carekê, ji alî sawcî de kaxizeke ko sûcê girtiyan tê de nivîsandî dihate girtîgehê û di demên hatina wan kaxezan de, me lêdaneke rind û qenc li wan dikir. Ji ber ko tu xwendina me kesî ewqas tune bû, ko em bikaribin tiştan ji hev derxin. An jî bizanibin ko ew kaxez ji bo çi ye. Tenê tiştê ko me pê dizanîbû, qasî ko me karîbû bixwenda, ew bû ko me li gor sûcê li wir nivîsî qîmeta wan baş dizani bû(!). Di demên hatina wan kaxizan de me kêf li ser serê girtiyan dikir. Me berê kaxieên kesên sûcê wan sivik belav dikirin. Dûre dor dihate wan kesên ko bi kuştina leşker û polîsan dihatin sûcdarkirin, an jî ew kesên ko rêxistin damezirandine, li gel çend gardiyanan kaxezên wan li wan dihate belavkirin.

Me ew şibaka di deriyê qawişê de vedikir û banî wan kesên weha dikir û digot:

— Filankes. Wî jî di hundir qawişê de bersiv dida û digot:

— Emir bike komutanê min.

— Derkeve derve!

— Tu emir bike komutanê min.

Wî hîn nedizanîbû ko wê çi felek bête serî, dema derdiket, dinerî ko em 4-5 gardiyan li benda wî ne, wê demê ew tê digihişt ko rewş ne baş e. Loma wî dixwest ko hertiştê xwe bi baştirîn, nîzamî bike ko bi awayekî rehet azad bibe, lê tu xelasbûna wî tune bû. Dema ji derî derdiket bi dengekî bilind digot:

— Yek û dawî komutanê min.

Bi derketina wî re hema me êrîş dibir ser wî, yek li vî alî, yek li wî alî, dar û jop weke baranê bi ser serê wî de dihat. Rebeno nema dizanîbû ko wî çi kiriye. Piştî lêdaneke bi dilê me, îcar, gardiyanê qawişa jê dipirsî:

— De ka bêje, bê te di jiyana xwe ya sivîltiyê de çend leşker an polîs kuştine û daye kuştin?

Ji xwe wî çi bigota me bawer nedikir, ji ber ko kaxeza ji alî sawcî ve ko sûcê wî tê de nivîsandîbû, di destê me de bû, li wir ya sûcê wî »rêxistinek bi çek damezrandiye« ya jî »wî li gel polîs û leşkeran şerê çekdarî kiriye û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

di wî şerî de hin şehît ketine. Vê yeka hanê têra me dikir ko em wî bidin ber dar û joban. Qasî ko em tê gihiştin polîs, leşker, sawcî an jî her kesekî karmendekî dewletê tu carî derewan nakin, yên derewçîn ev kesên girtî ne. Bi vê bîr û baweriyê, me ji tu tiştên girtiyan bawer nedikir, eger wan rast jî bigotana. Carna girtiyan digot in ko »Komandanê min, ew tiştê li ser wê hatiye nivîsîn, tenê îdîayek e, dibe ko ev li dadgehê bête rastkirin. Ew tiştên ko hatine nivîsîn, ne min kiriye û ne ez dikarim bikim. Kesek, hatiye girtin, di işkencê de tehemul nekiriye û gelek tiştên ne rast him xistiye hustiyê xwe û him jî xistiyê hustiyê hevalên xwe. Hûn ê jî bibînin ko di dadgehê de gelek kesên ji sûcê giran têne îthamkirin wê bêne berdan«.

Dema wî axaftina xwe diqedand, ken bi ber rûyê me diket, ko ew çi xweşik dereweyên xwe bi cîh dike, loma em jî fêr bû bûn ko ji wan re bêjin:

— Ji xwe hûn hemû bê sûc û bê guneh in, hûn bi şaşî hatine vir. Ew kesên sûcdar, em gardiyan bi xwe ne(!)

Dema wî axaftina xwe diqedand, wan gardiyanên din ko xwe dabûn benda qedandina gotara wî, weke xwe dabûn benda nêçîrê, hema me bi job û darên xwe dest bi lêdanê dikir. Carna jî di navbera wê lêdanê de yekî ji me weha digot:

— De zû bêje, sûcê te çi ye? Te çend kes kuştine an jî daye kuştin?

Di nava dar û jobên me de dibû qêrîn û warîna wî, gazî dikir digot :

— Wele tu sûcê min tune ye, ev îftîra ye!

Ma kê bawer dikir, lêdana wî dom dikir heta ko me çend dar di canê wî de bida şikandin. Şikandina daran di canê wan de dihat wê manê ko ew kes wê çend rojekî di nava nivînan de razê.

Ma kê ji wan gotarê wî bawer dikir, baweriya me qet bi wan tune bû, lê bi rastî ji gelek tiştên wan digotin rast derdiket. Di dadgehê de min bi xwe jî dît ko ji wan kesên bi sûcên giran dihatin îthamkirin hin ji wan, hatin berdan«.

Dema wî, ev tiştên ecep digot ew bûyerên ko ez bi xwe di nav de jiyabûm, yeko yek dihatin ber çavên min.

Rojekê ji wan rojên lêdanê bû ko hate serê min jî, ji ber ko ew kaxeza min ya ko ji alî sawcî ve dihat, sûcê min tê de weha dihate lêkirin. »Rêxistineke çekdarî ava kiriye û karûbarê navendî daye meşandin« ev gotar têra gardiyana dikirin. Ji bona lêdanê ev yeka têr dikir û zêde bû jî.

Rojeke ji wan rojên felekê bû ko kaxeza min ji alî sawcî de hatibû

şandin. Garidyanê me kaxeza min di dest wî de û çend gardiyanên din jî dabûn dor xwe û bi awayekî bi kêf deriyê qawişê vekir û qêriya:

— Sîdar!

— Emir bike komutanê min.

— Zû derkeve derve, em ê îfade te bigirin.

Dema wî behsa îfadegirtina min kir, ez gelekî tirsiyam, ji ber ko îfade girtina girtîgehê ne weha rehet bû, ya diviya bû em hertiştî weke yuzbaşî dixwest bêjin, yan jî mirov dihate kuştin.

Ez bi bazdan derketim derve, bi derketina derve ez çi bi bînim, ne tenê gardiyanê me li derve bû, li gel wî çendên din jî hebûn. Di destên hina de jop û di yên hinekan ji wan jî kalas hebûn. Dema çavên li wan ketin, tirsekê ez girtim, ji tirsa, min komûta xwe ya nîzamî bi dengekî berz da: »Sîdar Mêrdîn, di emirê te de hazirim komutanê min« wî bi awirekî tûj li min nerî û got:

— Sûcê te çi ye?

— Ez bê sûc im, komutanê min!

Keniya û domand:

— Niha tu bê sûc î?

— Belê komandanê min.

— De rast bêje, te heta roja îro çend kes dane kuştin an te bi xwe kuştine?

— Wele komutanê min, min ne tu kes kuştiye û ne jî daye kûştinê. Tiştên weha ji min nayê, ez, bê sûc im.

— Niha tu bê sûc î?

— Belê komutanê min.

— Ji xwe ev kesên li vir hemû bê sûc in, yên sucdar em gardiyan in.

— Na, heşa komutanê min.

Weha xuya bû ko ew ji bersîvên min aciz bû bû loma bi hêrs li min zîvirî û got:

— De baş e, ka em binerin. Li hevalên xwe nihêrt çav da wan û êdî min nema zanî bû ko derb ji ko tên, te digot qey wan, dahn xistiye (cûnî)qafivik û bi mîrkutan dikutin, yekî radikir yê din lêdida betilandina wan, min ji bêhnvedana wan fam kir. Gava lêdana xwe dan rawestandin gardiyanê me dîsa li min mêze kir û pirsî:

— De ka bêje, te çi kiriye? Rastiyê ji me re bêje ko em te bişînin qawîşê. Bersîva min yek bû.

— Wele û bile, komandanê min ez bê sûc im.

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ew baş tê gihiştin ko ez ji bilî vê tu tiştekî din nabêjim, loma gardiyanê me gazî hevalê berpirsiyarê qawişa me kir û got:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

— Zû benekî bîne û derkeve der.

Min bi xwe ewilî tu mane neda ko ew ji bona çi ben dixwaze, lê dema ko hevalê mesûl derket û ben di destê wî de bû, gardiyan weha li min mêze kir û bi hêrs pirsî, êdî diyar bû ko ew dixwaze çi bike;:

— Tu zewicî ye?

— Belê, komandanê min.

— De baş e, eger tu rastî ji me re nebêje, ez ê weha li te bikim ko êdî tê nikaribî herî cem jina xwe, ez ê te ji mêranî de bixim.

— Tu emir bike komutanê min.

— De ka bêje, sûcê te çi ye?

— Wele û bileh, tu sûcê min tune ye, komutanê min.

Ew hîn bêtir hêrs bû û gazî hevalê mesûl kir û got:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

Gardiyan bi awayekî ji xwe bawer û bi kêf bû, ji xwe her dem wan li ser serê me kêfa xwe dikirin. Weha xuya bû îro wê kêfeke hîn cûda bikirana. Dibû ko wan tiştekî nû peyda kiribûn, yanî îcateke nû. Wî dîsa li mesûlê me mêze kir û got:

— Vî benî, bi awayekî qasidî, bi kîrê (mêraniya) vî kurê kerê ve girêbide. Û gardiyan li min mêze kir û got:

— Zû pantorê xwe derxe!

Min ew emirê wî pêk anî û da destê hevalê mesûl, lê wî jî bi awayekî gelekî qasidî girêda û ji gardiyan re got:

— Emirê te hate cih komutanî min.

Gardiyan berê li rewşa min nihêrt, çavên xwe xiste nava çavên min û got:

— Sûcê te çi ye? Bersivdayina min weke berê bû, ji hevalê mesûl re got:

— Mesûl, ben bigre destê xwe û bikşîne ko heta ez bibêjim bes e.

Ji xwe ji vir pêde ne hewceye ko ez bêjim, tiştê ko hate serê min divê meriv texmîn bike.

Ez û ew hevalê berpirsiyarê qawişa me, em ji yek rêxsitinê bûn. Lê wî jî mecbûrî, ew emirê gardiyan bi cih anî, ya na, him mesûl û him jî min ê lêdaneke teybetî bidîtana û taliya talî wê daxwaza gardiyan jî pêk bihata.

Ji ber vê yekê bû ko em berê di nava xwe de axivîbûn ko di rewşê weha de divê bi ya gardiyan bikin ko hevalên din lêdanê nexwin. Ji xwe çawan ba wê yekî ji me lêdan bixwara.

Piştî qedandina karê xwe gardiyan çûn, em jî ketin hundir, heval li dor me çûn û hatin, halê me pirsîn, hina got:

— Ma çi bi we kirin.

Min bi henekî got ku:

— Wele wan tiştek nekir, lê vî camêrî -min hevalê berpirsiyar nîşan kiragir bera nava min da, yê işkence bi min kir, ev bi xwe bû, gardiyan ji wî re got, girêde, lê wî weha girêda ko ji gardiyan xerabtir kir, lê ya baş ew ko min jî xiste destê wî. Hevalan êdî rewş fam kirin, loma bi halê min û hevalê mesûl keniyan.

Gardiyan axaftina xwe didomand.

»Weke berê jî min gotibû ko me şev û rojên xwe ji bo ko em metodekî nû yê işkencê îcat bikin, şiklekî taze bibînin, dibuhurand. Lê tu demê jî ew fikirinadinên me vala nediçûn, her û her me rojê metodekî işkencê didît, rojê babetekî lêdanê me li ser girtiyan diceriband.

‹car me îcateke nû û gelekî modern(!) peyda kiribû. Bêyî ko em zêde zehmetê bixwin, bêyî ko dereke girtiyan ji lêdanê reş bibe, an jî bişkê û bêyî ko qêrîn çibibe, me ew şikil dixiste pratîkê. Çi bû ev, çi bû ev şiklê işkenca nû, çi bû ev metodê delal. Ew mûmên ko 10-15 cm. dirêj û me bi girtiyan didan xwarin bû. Te digot belkî xiyar e ko em didin destên wan. Dema me ew dixiste devê wan û dest bi cûtina wê dikirin ko wê bixwin, cûtin û tama wê gelekî zahmet bû, loma di dema cûtinê de wan çavê xwe digirtin, dema çavgirtina wan de me weha digot:

— Kurê kerê, ma qey xiyarê te tal e. Çima tu çavên xwe digire, ma tu nizane ko cezayê çavgirtinê, nîv mûma din e ûwh.

Ew girtiyê mûm dixwar, heta demekê dilê wî diçûdihat, serî lê gêj dibû, her serê pênc deqîqan carekê direviya towaletê li wir verdişiya. Dema verşiyê me digot belkî aniha wê dil û kezaba merivan di devê merivan de were. Wan kesên mûm dixwarin qederê hefteyekê him nexweş diketin û him jî wan nikarîbûn xwarin bixwarana.Tiştê herî xerab ew bû ko di demên meşê de, xwarin û vexwarina mûm, dermanê kincşûştinê an jî murekebê bû. Ji ber ko ew kesên ev nîmet(!) dibû qismetê wan, bi emel (îshal) jî diketin, kesên bi emel nikarî bûn bi seatan li der ve meş bikirana, gardiyan jî ew ne dibirin towaletê, gelek caran kesên weha di bin xwe de berdidan.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Belê ev babetekî nû bû, ma tenê ev, na, na em bi vê tenê nedihatin ser, biner e ez ji te re vê jî salix bidim:

— Carna em hin gardiyan li salona sînemayê, an jî li salonên din diciviyan, li wir me masayek, hin kursî datanîn çend sûretê orosipiyan jî li dîwêr dixist, muzîkek jî dida ser, te digot qey meriv li meyxanê ye. Dûre me çend gardiyan jî dişandin pê wan kesên sûcê wan giran, yan jî ew kesên ko di wê kaxeza ji alî sawcî ve ji wan re diçû ko di wir de sûcê giran tê de dihat nivîsandin, dikir.

Ev hevalê gardiyan yê ko me dişand pê wan kesê ko sûcê wî giran an ew kesê ko yuzbaşî ji mere digot »divê hûn filankesî têxin işkencan« dikirin. Gava gardiyan dihatin yek an jî du girtî bi wan re bûn, di hatina wan de em radibûn ser xwe diçûn pêşiya wan û me weke garsonê aşxanakê, gazî dikir:

— Fermo fermo, kerem bike, kerem bike.

Ji xwe wî keremî vir dikir, lê mebesta me ew bû em têra xwe tinazê xwe bi wî bikin. Me ew kes li ser masê dida rûniştandin, hevalekî gardiyan jî paçek di destê wî de û ser masê paqij dikir, ew diçû kesekî din weke garson, di dest wî de qelem û deftereke biçûk, dihat ba girtî û digot:

— Fermo ez benî, tê çi bixwe û çi vexwe? Dest pê dikir, navê xwarinê û vexwarinê rêz dikir, te digot belkî mirov li aşxanê ye. Pişt re jî weke girtî xwarin xwestibe, garsonê me li deftera xwe dinivîsand û diqêriya:

— Kebabek, qedehek şerab û hinek meze li ber.

Garson diçû piştî qederekê bi şûnde vedigeriya, di destê wî de tepsiyek, li ser wê mûmek û qedehek tije murekeb an jî dermanê firaxşûştinê dianî dida ber wî kesî girtî û digot:

— Tu daxwazên te yên din hen e?

— Estefxurullah komandanê min.

Ji xwe kesên girtî çi bigotana pere nedikir, him wî dizanîbû ko wê çi bê serê wî û him jî me dizanîbû, ko tiştên ji bo wî hatiye, ew mecbûr e hemûyan bixwe. Loma em hemû gardiyan dihatin li dora wî diciviyan, mûm dikir destê xwe û digot:

— Zû bixwe û vexwe!

Ez bi xwe niha difikirim ko çawa wan kesan mûm dixwarin,! Ew tiştên pîs jî vedixwarin. Ji ber ko ew mecbûr bûn vê yeka hanê pêk bianîna, ev emirekî jor bû, eger ew li dij vê derketana an jî serî li me bigerandina, wê têketina nav çend metre paçê sipî û wê biçûyana malên xwe, wan jî ev yeka dizanîbûn. Mirina girtiyan li wir ji bo me tu problem dernedixist,

loma em ji kuştina wan neditirsiyan. Ji ber ko doktorê me yên li wir yên nexweşxana leşkeriyê bûn, li gor daxwaz û raya yuzbaşî raporên xwe dinivîsandin.

Ev jî bû bû tiştekî nû di jiyana girtiyên wê girtîgeha bi nav û deng ya li bajarê Diyarbekrê de. Carna jî em diçûn ber deriyê hin qawişan û banî kesê ko me dixwest lê bidin, dikir. Dema ew dihat berî derî û komûta xwe dida, me digot:

— Dengê te baş derneket, me negotibû ko di dema komûtdayinê de divê heta ji we bê hûn dengê xwe derxin, naxwe hûn naxwazin emirê me bînin cih.

Him em di ser wan de diqêriyan û him jî me destê xwe diavît bêrîka xwe ko mûmê derxin û bi wî bidin xwarinê, ji xwe êdî her gav mûm di berîkên me de peyda dibûn. Dema ko me mûm derxist, em bi ser girtîde diqêriyan û digot:

— De, devê xwe veke!

Ew jî mecbûr bû ko devê xwe vekira, dema wî devê xwe vedikir, me jî ew mûma weke xiyarekî dixiste devê wî û digot:

— Baş bicû û bixwe ko ji bona careke din tu baş, bi nîzamî û bi dengekî berz komûta xwe bide, bila ev yeke ji hemû kesên qawişê re bibe ders, kesê baş komûta xwe nedin, an jî baş neqêrîn, wê tikevin vê rewşê.

Em li benda wî kesî disekînin ko heta ew mûma ko me xistiye devê wî dixwar, dûre me deriyê qawişê digirt û em diçûn, lê me dizanîbû ko li dû xwarina mûmê wê bîkeve çi halî.

Mebesta me bi vê kirinê ne deng nederxistin an jî baş komût nedayîna wan bû, ji xwe her kes bi awakî baş fêrî her tiştekî bû bûn. Di vir de mebest ev bû ko bi van metodên hovane çavê wan bêtir bitirsînin. Wan ji doz û welatperweriya wan sar bikin û dûr bixin û eger ne hemû bin jî, hina jî wan bikin mirovên dewletê. Ji ber ko yuzbaşiyê me her dem digot: »kurê min eger hûn hina ji girtiyan bikaribin, bikin mirovê dewletê, wê gelek fêda wî bighê dewletê, ji ber ko ew her tiştê kesên, komunîst û kurtçiyan dizanin, li gor agahdarî û nerînên wan em ê bikaribin di demeke kurt de hêlîna wan hilweşînin.

Di virde tucarî ew daxwaza yuzbaşiyê me pêk nehat, eger hin mirov ji ber hukmê lêdanê kire zîlamê xwe jî, lê ji ew tiştê ko wî dîpa pêk neanî. Jî ber ko kesên weha di bîr û baweriyên xwe de ne têrgihîştîbûn. Ji wan kesên ko yuzbaşî dixwest, bi tu rê û rêbazî me nikarîbûn bikirana peyayên dewletê. Kesên weha gelekî bi hêz, quwet û bîrûbawerî bûn. Me çi dianî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

serê wan, ew ji ya xwe danediketin. Mirov şaş û matmayî dima ko çawa kesên weha dikaribûn li ber işkenceyan îdare bikin. Wan kesên ko dibûn mirovê dewletê jî, hin kesên ko dijminê komunîsta bûn, hin xwefiroş û hin jî ji kesên bîrûbaweriyên wan hatibû şikandin, pêk dihatin.

## XIV

»Rojekê min girtiyên qawişa xwe derxistibûn meşê û sirûdên leşkerî bi wan didan xwendin.ê Lêdan û işkencên min jî berdewam bûn, ji ber ko em her gav ji alî yuzbaşî de dihatin kontrolkirin,. Di demên meşê de, dema me lêdan nekira, em ne li gor dilê wî bûn, loma kesên işkence û lêdan li girtiyan nekirina yuzbaşî ew dişandin cihê wan î ecemitiyê.

Hey tepe-repa jopê min û qêrîn û warîna girtiyan bû ko dîna min dît gardiyanekî din gazî min kir, ez çûm ba wî û wî got:

— Gardiyan! îcateke nuh ya işkencê hatiye dîtin, ka tu jî li qawişa xwe biceribîne. Û wî ji min re hemû şiklên dîtina işkenceya nû şirove kir. Li wê salonê bi hindikî, qasî 20-30 gardiyanî jî, ji bona ceribandina vê metoda nû sekinîbûn. Di vegerê de em bi hev re hatin nava girtiyên ko meş dikirin, min ew dan sekinandin. Di demên seknê de kêfa wan dihat ko ew ê bikaribin, hinekî hilma xwe vekin, ma wan ji ko dizanî bûn ko ez ê metodeke nû di serê wan de biceribînim. Loma min emir da û got:

— Qawiş, li ser çar rêza û bila di nava her rêzekê de qasî du metre navber hebe, rawestin.

Wan derhal ev yeka pêk anîn, çar rêz û di nava her rêzekê de qasî du metre navber vekirin û li benda min rawestiyan.

Min gazî berpirsiyarê girtiyan kir û got:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

— Here qawişê û çar pakêt cixare bîne, zû!

— Tu emir bike komutanê min.

Piştî hatina mesûl û cixaran, îcar min emir da û got:

— Qawiş! heta sisiyan divê ji navê û berjêrtir tu tiştek li ser we nemîne, dê heydê zû. Yeeek, dido... û sisêêê.

Herkesekî ji navê û berjêrtir xwe tazî kiribûn, tenê fanîleyekî tenik tenê li wan mabû , îcar min dîsa gazî mesûl kir û got:

— Mesûl!

— Emir bike qomûtanê min.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Her girtiyekî cixarakê bidê û cixara wan ji wan re vêxe.

— Tu emir bike komutanê min.

Êdî di destê her girtiyaekî de cixareyeke vêxistî hebû, dor hatibû, ceribandina wê îcata nû.

Min li dora xwe nêhirt û dît ko yuzbaşî di şibaka jor de li min mêze dike, kêfa min hat, loma ez bêtir har û dîn bûm, ko işkenceyek baş bi wan bikim, aferîmekê ji yuzbaşiyê xwe bigrim.Hema ez bi ser qawişê de qêriyam:

— Qawiş xwe daqûl bikin,

Herkesî xwe daqûl kirin, serên wan, bi ber erdê de û qûna wan li jor bû, ez jî bi rêzê ketim û min ew cixara ko di destê wan de yek bi yek xiste qûna wan, piştî ko min cixare di qûna wan de bi cih kir û got:

— Qawiş divê hûn îro cixarên xwe bi qûna xwe vexwin, eger cixara we yekî bikeve, ji xwe ne hewcweye ko ez ceza we bêjim. Hûn bi xwe dizanin. Dê heydê zû vexwin.

Ez wer bawerim ko bi qûnê cixare vexwarin, li cîhanê cara yekem bû ko me di girtîgeha Diyarbekrê de pêk anî. Dema me li wan mêze dikir, kenekî em digirtin, em him dikeniyan, him jî me dikir qîrewîr, da yuzbaşî me bibîne ka em çawa lêdanê û işkencê bi dijminên miletê xwe dikin. Bi rastî jî di demên weha de kêf kêfa me bû, him yuzbaşî li me û rewşa wan girtiyan temaşe dikir, him jî me dizanîbû ko ew ê aferîmeke qenc bide me. Ew dîmeneke (manzara) gelekî xweş û delal bû, hemû girtiyan qûnbelotkî kiribûn, di qûna wan de jî cixare hebû, dûman bi ser qûna wan diket. Di rewşên weha de kêf dibû kêfa me û ya yuzbaşiyê me.

Di bin vê tirs û xofê de cixara yekî îxtiyar ji qûna wî ket, dema cixara wî ket hema me gelekan bi hevre êrîşî ser wî kalî kir, me her yekî ji alîkî de dest bi lêdanê kir. Temenê wî li dor 50-60-bû, dibû ko ji ber temenê xwe wî nikarîbû, qûna xwe baş bigirta, loma jî cixara wî ket û lêdana ewilî jî wî bi xwe xwar. Him me li wî dida û him jî min ji wî re digot:

— Çima cixare te ket? Wî got:

— Komandanê min, hundirê min gaz kir û ji ber wê cixare ket. Eger hûn wê dîsa bi cih bikin, ez ê hîn bêtir lê mîqate bim ko nekeve.

De îcar lê bide û lê bide hetanî ko ew kes, di nava destên me de ji heşê xwe ket, dûre me dev jê berda, lêdan bi dilê yuzbaşî bû ko wî hîn jî li me temaşe dikir. Piştî ketina wî kesî, qawiş êdî xilas bû bûn, me ew xistin hundir, du kesan jî rahiştin mirovê kal û birin hundir.

Ma me kê guh dida kalo, em bi dar û joban bi kesê ko di şûna bavê me

de bû ketibûn, qet ne dihat bîra me, ko niha hinek weha li bavê me bikin, em ê çi bikin. Yuzbaşî em çavsorî kiribûn, me nema dikarî bû tu tiştekî baş û însanî bikira. Niha ew bûyer têne bîra min, ez bi xwe şaş dimînim ko çawa min ew tişt dikir, gotin zor e, lê bawerîkirin zortir e. Gelek tişt weke xeyala ne, lê rast in, min bi xwe jî tiştên weha gelek kirine.

Hingî me sosretê giran bi serê wan girtiyan de anî bû êdî me jî nizanî bû em ê çi tiştên din bînin serên wan. weha li wan hati bû ko wan çawa bikirana diketin feqa me ya ko me ji bo lêdanê her gav vedida. Hingî me şikil û metodên işkenca ji bona wan îcat kiribû ko êdî li gor me tu tiştekî zor nemabû, îcar em bi tiştên hûrîk û rindik ketibûn, lê dîna ko me dît ew tiştên hûrik, ew qedexekirinên ko em qet li ser nedifikirîn tesîrekê nebaş li ser girtiyan dihîşt. Dema me wan tiştên hûrik xiste jiyanê, me dît ko wana ji lêdanê, ji tî û birçîbûnê bêtir tesîr li ser wan dihişt, em baş têgihiştin ko ji bona wan, ne ew lêdana fizîkî, lê işkencên pisîkolojîk bêtir tesîra xwe dihêle, êdî heta ji destê me dihat, me dest bi ûsul û metodên weha kir.

Me li wan weha kir ko êdî di hundirê qawişan ji bilî hin pêwîstiyan, axaftina bi hevre hatibû qedexekirin, ken û henek hate rakirin, çûyina toweletê an ji cihêkî hetanî cihekî din ya hundir qawişê, bû bû nîzamî. Dema kesek biçûya toweletê pêwîst bû ko ew kes bi nîzamî ji cihê xwe raba, herdu destê xwe bi nigên xwe ve bizeliqanda, ne bi meşeke serbest, lê bi meşa nîzamî biçûya û bihatana. Razan jî bû bû bi nîzamî, weke; dema kesên radizan, pêwîst bû ko li ser piştê razana û her du destê xwe bidana ser sînga xwe, eger kesek ji vî halî de biketa halekî din an jî hin kesan xuraxur bikrana pêwîst bû, nobedarê şevê ew hişyar bikirana û ew bi nîzamî bidana razandin. Eger girtî ji ne nîzamî razanê û xure xurê nehatana şiyarkirin û kesên weha ji alî gardiyanekî de bihata dîtin, ji dilva kesê razayî, ew kesê nobedar ceza dikşand. Lê ew kesên di xewê de dikirin xurexur tebata wan ji destê nobedaran tune bû, her ko deng bi wan diket nobedaran ew hişyar dikirin, gelek kesên weha ji bê xewbûnê aqilê xwe wenda kirin.

Bi roj, di demên îstirehetê de pêwîst bû ko herkes bi awakî nîzamî rûnişta û çongên xwe bikirana zikê xwe, destên xwe bidana ser hev, da ko ew bi awayekî nîzamî rûniştana. Nig dirêjkirin, nig avîtina ser hev, cezayê wê hazir bû, me kesên weha du saeta dixiste lexeba (li derve li cihê talîmê karêz, cihoka ko ava gû yê toweletê tê re derbas dibû, hebû).

Dîtina wan tiştên li gor me ne nîzamî, rehet bûn, ma me ji bo çi heval-

bendê xwe di qawişan de dabû çêkirin, bi saya wan agahdariya me ji her tiştên hundirê qawişan çê dibû. Ya jî, dema me qawiş di wan qulikên di dîwaran re kontrol dikirin, didît. Tenê ew qawişên ko hîn me zilamên li gor dilê xwe têda nedabûn çêkirin, wan ji herkesî kêmtir lêdan dixwarin û me qawişên weha jî ji hemûyên din bêtir kontrol dikirin.

Weke berê min di hin gotinên xwe de anîbû zimên ko ew kesên ji bin çav (cihê lêdan û işkencê) derdiketin dianîn girtîgehê, bê çi dihat serê wan. Pêwîst bû wan berê, »Sonda me, marşa milî û hîtaba serokê me Ataturk ji Ciwanan«re ezber bikirana û dû re jî hin sirûdin leşkerî jiber bikirana ko bikarîbana ji hucran derkevin û herin di qawişekê de bi cîh bibin. Ji bo çûyîna qawişan, gelek kesan ev tiştên me zû pêk dianin, ev jî li gor dilê me bû, me jî aferîma xwe ji yuzbaşiyê xwe digirt.

Tiştekî din ko ji bona min hêjayî bahskirinê ye, ev bû: Kalepîrek anîbûn hucrê, sûcê wî çi bû, ne min û ne jî tu kesê dîn pê nizanîbûn. Tenê zanebûna me di derheqê sûcê girtiyan de, gava hatina wan kaxezên ji alî sawcî ve dihatin çêdibû. Em gardiyan li dor wî kalepîrî diçûn dihatin. Her roj me henek û tinazê xwe bi wî dikir, lêdan û işkencên xwe jî ji ser serî wî kêm nedikir, ji ber ko yuzbaşiyê me her dem digot: »Binerin kurên min, divê zikê we qet bi kesên weha kalepîr neşewite, çi hate serê me ji derdê wan e, ma van xortên cahil ji ko rêyên weha dizanîbûn, tevde kalên weha rê û rêbazî pêş wan kirine. Hemû fen û fêlbazî ya wan e. Loma jî hûn çiqa li wan bidin, kêm e.« Yuzbaşî bû ko ev digot, gotin ji yuzbaşî û lêdan jî ji me bû.

Ew kalapîr, mecbûr bû ko weke herkesekî »sonda me, merşa milî û gotara Ataturk ya ji bo ciwana ezber bikira, ya na ew nikarî bû biçûya qawişê. Kalepîrê me gelek di hucrê de mabû, wî dikir û nedikir, nikarî bû ew ezber bikirana, loma me ji wî re got:

— Eger tu »sonda me û du qitayê (çarînên) marşa milî ezber bike em ê te bişînîn qawişekê.

Kêfa wî hatibû, şev û rojên xwe bi ezberkirina wan dibuhurand. Qet sekinîn li wî tune bû. Wî êdî »sonda me« ezber kirîbû, dor hatibû marşa milî, lê wî çi dikir û nedikir nikarîbû ew ezber bikra.

Rojekê dema ez ketim hundirê hucrê, dengê kalo hate min ko wî karê xwe yên ezberkirinê didomand, wî û ezbekirina sirûda mîlî di ber hev didan, weha li wî zor hatibû ko nema dizanî bû çi bike. Hevalên wî çû bûn qawişan, ew tenê di wê hucra sar de, tî û birçi bi ezberkirinê ketibû. Dema min dengê wî bihîst, ez sekinîm û min guhdarî kir, wî digot:

»Korkma sonmez ez bi qurbanê
Da ka zû xwe bi min bide ezber kirinê,
ya na ez ê bixwim lêxistinê
Eger tu zû xwe bi min bide ezberkirnê.
Ez ê jî zû herim qawişê«

Ew weke bi mirovekî re biaxife, wilo bi wê sirûda milî re, bi sond û xitaba Ataturk re diaxifî. Ji wî hebû ko dema ew li ber sirûdê bigere, wê ew sirûd an jî merşa milî xwe zû bi wî bide ezberkirin. Lê dîsa ez karim bêjim ko jî dengê wî xuya bû ko bê ew çiqas bi kîn û nefret bû. Te digot qey ew xwe bike qurbana wê, sirûd jî ew ê xwe zû bi wî bide ezberkirin, kalê me ketibû rewşeke nebaş. Lê wê demê ez qet li vî halê wî hay nedibûm, ko ew di şûna bavê min de ye. Tew kêfa min bêtir dihat, min deriyê hucra wî vekir û lêda, lêda û lêda ko çima ew nikare zû ezber bike...

Ez di rewşeke weha de qederê 16 mehan jiyam, ma ez dîn nebim kî ê dîn bibe, piştî fêrbûna jiyaneke weha kî êdî dikare bi awakî normal di nava civatê de bijî, em jî bi wan kesên girtî re hatin şewitandin. Ew di rêyeke li gor wan baş û li gor yuzbaşiyê me nebaş de bûn. Gelekan di wir de ser dan û sir nedan, lê ez û yên weke min, ma em di çi riyê de bûn, piştî qedandina leşkeriyê kî wê li me mêzeke, kî wê alîkariya me bike. Karbidestên girtîgehê karên xwe bi me qedandibûn. Em ew kesên feqîr berra hev dan, lêdana wan kesên girtî bi destên me dane kirin. Dema ez wan bûyer û kiryarê ko min bi xwe jî kiriye, difikirim, ji xwe fedî dikim. Ez ji xwe nefret dikim, ko min çawa ew bêheşiya mezin kir! Lê niha tiştek nema ji destê min tê, ez bûme malê avîtinê. Ne dewlet û ne jî tu kes ne li min û ne jî li rewşa min dipirs in. Me digot belkî piştî qedandina leşkeriyê jî dewleta me wê xwedîtiyê li me bike. Tew ez û yên weke min, roja ko me leşkerî qedand em hatin jibîrkirin. Ma xwediyê mirovê feqîr kî ye! Ez weha bawer dikim ko ew bi xwe ne. Dema ew jî ne li hev bin, dema ew jî işkencê bi hev bikin, halê teva wê weke vî halê min be. Ma ev hal e, ma ev jiyan e!..

De ka em îro jî gotara xwe li vir biqedînin, min soz daye te ko ez ê her tiştê ko ez dizanim ji te re bêjim, bila qet şik ji te ra çênebe. Min carekê biryara xwe daye ko ez ê bêjim, serê min jî here, ez ji ya xwe venagerim. Ez dixwazim ew tiştên di tariyê de derkevin ronayiyê. Tu jî tiştên ko ez ji te re dibêjim bi awayekî rast, weke ko em bi hev re axifîne di rojnameya xwe de biweşîne. Bila hemû cîhan ji bûyerên girtîgeha Diyarbekrê agahdar bibin. De rabe qurban, de rabe, tu jî bi min re perîşan bû, te dev jî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mala xwe berdaye û tu bi dû dînekî mîna min ketiye. Ne tu dersên xwe dixebite, ne jî li keçika xwe dinêre. Binêre bê ez çiqas zerarê didim der û dora xwe. Piştî ko ji leşkeriyê hatim û heta niha tu kesî ji min fêde nedîtiye. Her gav ez bûme weke agirekî û min dora xwe şewitandiye, zerar daye xwe û malbata xwe. De rabe qurban de rabe îro bes e, sibê em li vir dîsa hev bibînîn.

# XV

Roja din dinê ew berî min çû wî girê li hemberî nexweşxanê û li bin dara hijîrê rûnişt û li benda min rawestiya. Min jî xwe gîhand ba wî, me xêrhatin li hev da, dûre wî domand:

»Xwarin û vexwarina girtiyan li gor pêwîstiya wan bi zanetî ne dihat dayîn. Xwarina ko ji alî karmendê girtîgehê de ji bona girtiyan dihat dayîn, çemçikek şorbe bi çar kesan bû, ava ko me dida wan qasî ko rojê qedehek para kesekî bikeve, dihat dayîn. Nayê bîra min ko tu carî girtî bûne xwedî du qedeh av (Ji bilî hin îcaran). Tenê rewşa kesên xwefiroş û muxbîran cûda bû. Ji bona pêwîstiya girtiyan li kantînê çay jî dihate firotin. Eger yuzbaşî bixwesta tenê ji firotina çayê, wî dikarîbû pereyekî zêde qezenc bikira. Lê ji bona ko girtî her dem, di hasreta çayê de bin, wî ev yeka jî nedikir. Lewra wî digot: »Divê her dem çavê girtiyan tî û birçî bin ko em bikaribin, hina ji wan bikin zilamên xwe.

Me baş dizanîbû ko vexwarina qedehek çay ji bona girtiyan hertişt bû, ji ber vê bû ko berî dayîna çayê, me lêdanek baş li wan dikir, dema em diçûn ber deriyê qawişan me gazî wan dikir û digot:

— Qawiş!

— Emir bike komutanê me.

— Ma hûn çay dixwazin.

— Eger tu emir bike belê.

— Ma hûn dizanin ko berî vexwarina çayê wê çi bê serê we.

— Belê qomûtanê me, emir emirê te ye.

— Baş e, bîdona çayê li gel du kesan derxin derve.

Li girtîgehê tiştên cam, hesin û metalên hişk hatibûn qedexekirin, me çay ji wan re di bîdonên naylon de dianî û wan jî bi qedehê naylon ew çay vedixwarin. Ma em weha bê heşbûn ko em qedehên cam bidin wan û ew tamekê ji çayê bibînin. Bi qedehên cam çaya germ vexwarin, ne li gor nîzama wê girtîgehê bû. Ji bona ko em lêdana tevayî bikin, ji heftê carakê, carna jî ji 15 rojan carekê, me çay ji wan re dibir. De îcar binere bê me çay bi çi awayî dida wan.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Carekê ew du kesên li gel bîdonê derdiketin, ji herkesî bêtir lêdan dixwarin. Di hanîna bîdonê çaya germ têde carna destê wan jê dişewitî, pêwîst bû ko wan bîdon ji kantînê heya qawişê bê bîhnvedan û dest guherandin hilgirtana. Ya na, çay bi devê wan nedibû, ji xwe ew êdî fêrî vê yekê jî bû bûn. Her carê di anîna çayê de destên kesên derdiketin dişewitî. Lê her dem jî du kesan fedekarî dikirin, bêyî ko dilopek çay birjînin erdê an destê xwe biguherin ew çaya germ digîhandin hetanî ber deriyê qawişê. Eger dilopek çay jî bihata rijandin, wê rojê qawiş bê çay dima. Loma wan kesên radihişt bîdonê germ him agahdariya wan ji bîdonê hebûn ko çay nerije û him bi awayekî nîzamî li gel xwendina sirûda dimeşiyan heta ber deriyê qawişê. Ji bona çi ez dibêm ber deriyê qawişê? Biner bê ji bo çi!

Wan bîdonê çayê datanîn ber derî, lêdana xwe dixwarin û diketin hundur. Ew çay hîn germ bû. Ma dibû ko em çaya germ bidin dujminê miletê xwe? Na, na nedibû, ji ber vê yekê me gazî dikir:

— Qawiş!

— Emir bike komutanê me.

— Têkevin rêza lêdana bi tevayî.

Girtî fêrî vê yekê jî bû bûn. Loma hemûyan li hundir xwe li ber derî dixistin rêzê, wan kesên berê lêdan bixwarana çaya germ jî bi xêra wê lêdanê vedixwarin. De binêre bê me ew xistibûn çi rewşê ko ji bona vexwarina qedeheke çaya germ, herkesî dixwest ko berê ew lêdanê bixwin Me jî bi vê yekê dizanî bû.

Vexwarina çayê jî bi vî awayî bû. De were ji bona qedeheke çay him destê xwe bişewitîne û him jî lêdana xwe ya qenc bixwe. Bi ser vî halî de eger me ji wan re her roj çay bianiya jî wan nedigot na. Bi rastî carna em bi xwe jî li halê wan ecebmayî diman.

Roj bi roj, saet bi saet tade û işkencên me dianî serê wan zêde dibûn. Her rojekê babet babet şiklê lêdanê dihate dîtin, her saet jî şiklekî nû dihate ceribandin. Êdî her lêdan û işkencên me, bê berxwedan dihatin qebûlkirin û pêkanîn. Tu kes êdî li dij kiryarên me ranedibû. Kesên ko ev tişt qebûlnedikirin ew ji xwe di hucran de debûn, halê wan xerabtirîn hal bû. Ew kesên di hucran de û serî ji kiryar û biryarên me re danetanî, me yeko yek di hucran da, bi darê zorê, bi wan dida qebûlkirin, eger wextê me jî zêde digirt, lê dîsa ji %95-ê girtiyan daxwazê me pêk dianîn.

Yuzbaşiyê me, ji me re digot: »Kurên min we firset bi dest xistiye, hûn çi dikin bikin. Pêwîst e ko hûn van girtiyan bikin welatperwerên tirk.

Hûn wan bikin tirkên baş, damarên wan î qels bigirin ko êdî ew bibin mirovên baş û hevalên xwe yên derve bidin dest.

Lê tu carî ev merama yuzbaşiyê me pêk nehat, ne ew bûn tirk û welatperwerên tirkan û ne jî tucarî serîhildan û berxwedan ji wê girtîgehê rabû. Her ko ew fêrî lêdanekê an jî şiklekî işkencê dibûn, me îcateke nû di serê wan de diceriband.

‹cateke nuh, kêfxweşiyeke li gor dilê me hatibû dîtin. Ev kêfxweşiya me jî weha bû: Me girtî hemû bi hukmê çend dar û joban zû fêrî vê yekê jî kiribûn. Dema ko em dihatin ber deriyê qawişê, bi dengekî berz me digot:

— Qawiş wenda bibin!

Hîn gotara me ne diqediya, hemûyan bi awayekî gelek lez û bez xwe diavîtin bin ranzeyan, dû re em diketin hundir, kê xwe tam di bin ranza da bi cîh nekiribana, wî him lêdan dixwar, him jî bê xwarin dima. Carna jî dema ko me digot »wenda bibin« . Di wê lez û bezê de, de du sê kesan xwe bi hevre diavîtin bin ranzeyekê, lê ji bona ew hemû di bin wî ranzayî de xwe wenda bikin û tu dereke wan ji derve nemîne xwe diavîtin ser hev û bi vî awayî dixwestin xwe veşêrin. ‹car me li wan mêze dikir, ji bo ko em rûmeta wan bişkînin, ji bona ko em wan bi nebaşî bidin nasîn û ji bona ko em şexstiyata wan rencîde bikin, em diçûn ber wê ranzayê ko dusê kes xwe di bin de bi cî kiribûn, me digot:

— Ji bilî vê ranzayê, yên din hemû derkevin.

Piştî derketina wan hemûya, me bi awayekî berz û bi ken digot:

— Qawiş! hemû li bin vê ranzayê binêrin, baş binêrin ko bê hevalên we li wir çi dikin, ew çawa dikutin hev, binêrin hela çi bi serê hev dikin. Ma heqê kesên bênamûs çi ye?

— Ceza li gor fermana te ye komandanê me.

Dû re jî tiştên dihate serê wan ji xwe diyar bû.

Car carna jî em gelek gardiyan diketin qawişekê, herkes diketin sekina nîzamî û li benda fermana me radiwestiyan.

Me banî mesûlê qawişê dikir. Ew dihat ber me komûta xwe bi nîzamî dida. Ji xwe gelek mesûl jî bû bûn hevalbendên me û yên ne weha jî, me zêde li wan nedixstin ko ew daxwazên me li gor me di qawişa xwe de pêk binin. Loma me gelek caran mesûl ji nav kesên girtî derdixistin. Kesên din hemû dixist sekina nîzamî. Em çend gardiyan diketin nav wan, li rewş û sekna wan mêze dikir dû re me digot:

— Sekina vê qawişê ne nîzamî ye. Pêwîst e hûn bêne cezakirin. Û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hevalekî din bi hêrs digot:

— Heta sisiyan her kes çar cixareyan têxin devên xwe.

Ev emir bi awayekî zû dihat cih, dûre yekî din digot:

— Mesûl!

— Emir bike qomûtanê min.

— Şibakan bigire.

— Tu emir bike qomûtanê min.

Piştî girtina şibakan jî îcar hevalekî din, digot:

— Qawiş, cixareyan têxin devê xwe û weziyeta pêxistinê bigrin. Di devê wan de çar cixare hebûn, di destê wan ê çepê de niftik û yên rastêde darikê niftikê, li benda emirekî din radiwestiyan. Emirekî din ji alî hevalekî din dihat dayîn. Li vir mebesta me ew bû ko hemû gardiyanên ko ketin hundir biaxfin loma her carekê me yekî emir dida.

— Pêxin.

Bi yek dengî hemû darik pêdiketin, ew kesên ko darikê wî pê neketa, halê wî diyar bû. Bi kurtasî wan çi bikrana jî nikarî bûn xwe ji ber destên me bi awakî bê şaşitî xilas bikirana. Heta cixare pêdixistin, gelekan lêdan dixwarin. Hina cixarên xwe zû pêdixistin, darikê hina pê nediket. Ew qawişên gelek kes têda dijiyan û her kesekî çar cixare pêdixstin, şibakê wan jî girtî, bûn. Dibû kufe kufa wan. Dûman bi ser serê wan bilind dibû, êdî weha dibû ko çav çavan ne didît, herkes dikuxiyan, me jî bi awayekî kêf li wê rewşa wan mêze dikir û di ser wî halê wan de, dikeniyan, tinazê xwe bi wan dikirin.

Ma tu dibê em weha disekînin, na vê yekê têra me nedikir. Gelek caran jî, me yek cixare bi kesekî dida vêxistin, li dora diçûn û diatin, me bi ser wî de dikire qêrînê û me digot:

— De bila dûmana cixarê di çavê te de derkeve, bila dûman di guhên te de derkeve!

Dûmana cixarê ji guh an jî ji çavan derxistin, ne tiştekî mantiqiye û tu kes nikare derxe, lê dîsa jî gelek girtiyan weha zor didan xwe ko te digot belkî niha ew ê dûmanê derxe, lê wî rebenî çi dikir û çi nedikir dîsa dûman dernediket, emirê me ne dihate cih û cezayê wî giran dibû,

Di demên weha de armanca me ew bû ko em lêdanê li wan bikin, lê me weha xwe û ew fêr kirî bûn ko em tucarî li kesekî bê sûc naxin. Loma jî me sûc ji wan re didît, sûc, ji ber xwe dernediket, dema wan dûmana cixarê di çavên xwe de dernexistina, wan bi vê kiryara xwe emirê me nedianîn cîh. Ji xwe dema me ji girtiyan pirsbikira:

— Em tucarî li kesên bê sûc dixin? Bersîva wan ev bû:

— Na, komutanê me.

Lewra berî ko em li yekî bixin, me ji wî re sûcek çêdikir û dûre lê dida.

Dîsa hêjayî gotine ye ko ez li ser vê yekê jî ji te re bûyerekê bêjim:

Rojekê me êrîş bir ser qawişekê. Em li dora girtiyan çûn û hatin ko sûcekî ji wan re peyde bikin, loma hevalekî got:

— Herkes çar cixaran têxin devê xwe. Dema herkesekî cixarên ko me gotibûn, di nava lêvên xwe de bi cih kirin, hevalekî got:

— Weziyeta pêxistinê bigirin.

Girtiyekî ev emir şaş famkir, cixara xwe pêxist û dema wî li dora xwe nerî ko hîn tu kesî pênexistiye. Xwest zû bi zû wê cixara ko pêxistiye vemrîne. Rewşa wî ji alî min de hate dîtin û hema min got:

— Ew kesê ko cixara xwe berî emirê vêxistinê, pêxist, bila du gava derkeve ortê.

Ew kes ji nava hevalên xwe derket, du gav pêş de avêt, komûta xwe ya nîzamî da. Wî baş dizanî bû ko rewşa wî nebaş e, dixwest vê rewşa nebaş bi komûta xwe ya bi dengê berz û nîzamî bide wendakirin. Lewra gelek caran me girtî ji bona komûta nîzamî azad dikirin, li wan nedida. Êdî weha bû bû ko him ew fêrî vê yekê bû bûn, him em. Loma vî kesî jî dixwest weha bike, lê em ji bo lêdana wan hatibûn, bê lêdan em nikarîbûn derketana, ez fitilîm ser wî û min gotê:

— Min got cixarê pêxin an waziyeta pêxistinê bigirin?

Vî bersivand:

— Te got waziyeta pêxistinê bigirin, qomûtanê min.

— Ê baş e, te çima pêxist?

— Min ji ber nezanî û cahiliya xwe emrê te pêk neanî. Di emirdayînê de ez şaş têgihiştim.

— Baş e, şaştêgihiştina emiran, cezayê wê çi ye?

— Ev girêdayî takdîra komutanê min e.

— Baş e, waziyeta lêdanê bigire.

Piştî lêdaneke delal min jî wî re got:

— Here cihê xwe?

— Tu emir bike komutanê min.

Wî silav da û çû cihê xwe. Tiştê di virde girîng , ew kes ne mirovekî cahil û nezan bû. Wî unîversîte dixwend, li gor gotina jî, wî kesî di işkenca polîsan de tu tiştek negotibû. Loma jî yuzbaşiyê me gelek ji wî aciz bû. Yuzbaşiyê me dixwest ko em her roj li wî kesê bidin, lê wî kesî, xwenda û



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

zana ji min re digot »ez cahil û nezan im« di rastiya xwe de wî ev ji min re digot, lê ma kê ev gotara wî fam dikir, ji ber yê »cahil û nezan« ez bi xwe bûm. Ez niha tê digêhijim ko wan gelek caran ji me re tiştên delal digotin, lê gelekî mixabin em tê nedigihîştin, dema wan digot: »ez cahil û nezan im« kêfa me dihat. Em diketin wê baweriyê ko em gelekî zana û aqilmend in.

Rojekê ji rojên havîna Diyarbekrê ya meha tebaxê bû. Kelekela germê û ji ber lêdan û meşê hal di girtiyan de ne mabû. Betonê derve bibû weke êgir.

Li ser wî agirî me girtî tazî dikirin û li wir bi zikkişkê, di ser wî »agirî« de dibir û dianîn. Rewşên weha carna bi saetan dom dikir, weha li wan dihatin ko êdî kesek ne dikarîbû ji cihê xwe bilive. Di Rewşên weha xerab de me dîsa meş bi wan didan kirin sirûdên leşkerî didan xwendin, rojekê dîsa ew gardiyanê hevalê me ko me navê wî »Gestapo« danîbû, qawişa xwe derxistibû meşê. Dema wî meş bi kesên girtî dida kirin, em bi xwe jî carna ji wî halî wî aciz dibûn girtiyan çawa ew tehamuldikirin ez bi xwe nema dizanim. Em vegerin ser kiryara wî ya wê rojê, wî hey lêdana xwe didoman û bi ser serê girtiyan de diqêriya digot:

— Deng dernakeve, deng dernakeve!

Her ko diçû dengê girtiyan hîn berztir dibû, tepe repa nigê wan hîn baştir dihat, lê wî dîsa gazî dikir:

— Deng dernakeve.

Ji xwe me dizanîbû ko ew ê wê rojê tiştekî bîne serê wan. Lewra dema em li girtiyan li manayekê digeriyan, mana di rastiya xwe de tiştekî bê mane bû, aciziya me bû, nezanina me bû û cahiliya me bû. Gestapo weha li qawişa xwe kir ko êdî hal di kesekî de nema. Em çend gardiyan jî li jor bûn me li wî û li qawişa wî mêze dikir, ji xwe çi dema gardiyanek qawişa xwe derxista meşê, her dem ew ji alî çend gardiyanên din ve dihat kontrolkirin. Yek ji bo ko tiştek bê serê wî, wî zû xelas bikin, ya dudiyan jî ew bû ko bê hela kîjan gardiyan zêde lêdanê dike. Ev emir jî ji alî yuzbaşiyê me de hatibû dayîn.

Di dema meşê de hew dîna ko me dît, Gestapo gazî dikir û diqêriya:

— Hawar, hawar, girtî li min dixin, gardiyan werin zû alîkariya min de.

Bi wî dengê wî yê berz, beyî ko em bifikirin, me gazî hev kir û got:

— Qawişê îsyan kir, qawişê îsyan kir. Bi rastî me jî nema dizanî bû, çi bû. Gaziya me li girtîgehê belav bû. Gardiyana dengê serîhildanê bihîstin, bi bazdan hatin cem wê qawişê. Her ji me çar gardiyana girtiyek

ket û me dest bi lêdanê kir. Gelek hevalan dizanî bû bi rastî jî qawişê îsyan kir. Di rastiya xwe de tu tiştekî weha tunebû. Tenê dayaxa girtiyakî ji meşê re nemabû. Çend caran li erdê ket, lê dîsa gardiyan ew radikir û dixwest ko nîzamî bimeşe. Ji ber vê yekê gardiyan li wî dida. Girtî jî gelekî hêrs bû bû û wî jî kulmek li gardiyan xisti bû. Nava gardiyan qetiya bû. Gestapo weha texmin kir ko hemû girtiyan li wî da. Ji ber em her gav bi tirs bûn. Tu rastiyê bêje, em ji wan kesên dest û niga wan girêdayî gelekî ditirsiyan, ma em tenê na, na, tirsonekê herî mezin yuzbaşiyê me bû. Ew, bêyî çend gardiyana tu carî newêrîbû biçûya qawişan. Her cara ko ew derketa gera qawişa me 10-15 gardiyana xwe dida dora wî.

Lê çi dibe bila biba yekî girtî li gardiyanekî xistibû. Lêdana gardiyana gelekî xeter bû, pêwîst bû me rê neda tiştên weha. Eger me cezayekî giran li kiryarên weha nebiriya, nedibû. Roja din yekî din dikarîbû, li hevalekî me yê din xe. Loma em ketin nava wê qawişê. Em her 4-5 kes li ser serê girtiyekî ko dest û nigê wî giredayî kom bûn. Me lêda û lêda, heta tu bibê bes. Lê wî gardiyanê girtî lê dabû, ji xwe ew har bû bû, bi hatina me re ew êdî mêrxas bû bû, wî çend kes bêhiş di erdê rakiribûn. Çend girtiyên, ko temenê wan biçûk ji nava girtiyan derxist û bir. Me fam kir ko wî ew kude birin. Piştî qederekê li qawîşê vegeriyan. Heta ew hatin me jî kesên dî qawişê de ji hal xistibûn, piraniya wan weke miriyan li erdê dirêjkirî bûn, wî hevalê gardiyanê me bi awayekî kêf, bi rûyekî ken û bi dengekî berz got:

— Girtîno we îro li min da, lê ev ji we re namîne, îro tiştê me anî serê we hindik e. Dî ber bêrêtiya we de min jî hevalên we bir in . Min çi anî serê wan ma hûnê ji ko bizanibin? Ez ji were bejim; min ew birin, yeko yek jop rada wan, ew karê xweş û delal bi wan kir. De zû têkevin hundir ko êdî em qawîşên din jî mîna we li wan bikin, bila cezayên wan jî bê dayîn. Dûre ez ê we bibim hucrê.

Ji wê rojê û pê de navê wî hevalê me bû »Gestapo«. Ji xwe me her gardiyanekî ji ber kiryarekê navek digirt. Navê wî jî weha lê hat kirin, kêfa wî jî ji navê wî re dihat.

Wê rojê tenê lêdan hebû, xwarin, av û tiştên din tune bûn. Me weha anî serê wan ko ew ji hemû girtîgehê re bû derseke qenc. Piştî wê bûyerê êdî kesekî nema diwêrîbû dengê xwe derxista, kesekî bi serê xwe jî nema diwêrîbû, bêemiriya me bikrana.

Dû re me ew qawiş bire hucrê. Li wir me bi dilê xwe cezayê wan li wan birrî. Me her roj lêdan û işkence bi wan dikir, ew derdixistin ser betonê û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bi daran bi canê wan diketin. Carna yuzbaşiyê me dihat, guhdariya lêdana wan dikir, gazî me dikir û digot:

— Ka dengê hestiyên wan yên şikistî nayê min, lêxe, lêxe, bila hestiyên sax di canê wan de nemîn e.

Ji xwe dema ko yuzbaşiyê me weha digot, lêdan ji bona me dibû, kêfxweşî, rehetî û karekî muqades. Lêdana li girtiyên qawişê teva, ji bona yekî destê xwe li gardiyan rakiribû. De îcar bifikire ko bê çi tişt hatin serê wî rebenê ko li gardiyan xistibû.

Tu zanî çima, dema kesekî girtî bi serê xwe şaşiyek bikira, emirekî gardiyana pêk neaniye, di rûyê wî de me li hemû girtiyên qawişê an jî li yên girtîgehê teva dida. Yuzbaşiyê me tim ji mere digot ku: »Binêrin hevalno, eger hûn bikaribin, van girtiyan xwe bi xwe berra hevdin, wê demê karên we rehettir û hêsantir dibe, De ez we bibînin, eger hûn di virde bi serkevin, mana xwe ew e ko em bi serketin, me rêya serhildanê ji wan girtiye, dema ew xwe bi xwe ji hev ne xweş bin, wê demê jî kes wê li kesî guhdarî neke.« Ew axaftina yuzbaşiyê me ji me re bû rehber. Me bi dest lêdanê kir û li şertê ko em ê wan berra hevdin, digeriyan. Lê me tu neticeyek baş ji tu metodên xwe ne girt.

Em bêjin ko dema meşê de eger kesî xwe şaş bikra ji bona xweşaşkirina wî kesî, hemû qawişê lêdan dixwar. Me weha dikir ko girtî ji wî re bêjin »kuro de bes e, êdî, em ji rûyê te lêdanê dixwin, tu jî xwe zû fêr bike«. Lê ji bêdela ko ew ji hev re gotinên weha bêjin, wan ew hevalê xwe yên nezan zû fêrî meş û xwendina sirûdên leşkerî dikirin. Ji bo ko hevdu fêrî tiştan nekin û alîkariya hev nekin me bi hevre axaftina wan jî qedexe kiribû, lê dîsa wan çi dikirin axaftina nava xwe, weke me dipa qut ne kirin. Carna jî me ji girtiyan du kes derdixist û me weha dikir ko ew li hev bixin.Me digot:

— ...... de pênc sîlan baş li ......bi xwe!

Eger ..... li .... nexista wê demê me lêdaneke baş li herduyan jî dikir, ji bona ko em li herduyan nexin wan weke me dixwest li hev didan û ji hevdu jî aciz nedibûn.

Di vir de me çi kir û çi nekir, me nikarîbû nakokî têxista nava wan. Ew weha bi hev hatibûn girêdan ko aqilê mirovan nedigihiştê. Ji hev hez dikirin, li hev guhdarî dikirin. Em jî êdî li wan heyirî bûn, me ne dizanî ko em ê çawa bikin, her roj yuzbaşî ji mer digot: »Ka we çi kir, ma qey hûn li wan nadin, ma qey zikê we bi wan dişewite. »Bînêrîn, ez heneka nakim. Jî dêlva wan, hûn dikarin ceza bixwin«. Bi vî awayî yuzbaşiî tîrs di

me de dîfirandîn. Bî van tirsên wilo me vedixwar, em serxweş diketin û em diketin nav girtiyan lê bê fêde bû...«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## XVI

»Ew kesê çavsor, yuzbaşiyê me yê devbîxwîn, Esat Yildirim ko nedixwest girtî zanibin biryar û metodên lêdanê, ew bi xwe derdixe. Wî dixwest kiryarên di girtîgehê de têne kirin, têkeve hustiyên gardiyana. Loma jî dema ko ew li qawişan digeriya, bi devekî nerm bi şefqateke mezinbûnê bi girtiyan re qise dikir ko mirov digot qey melek e, lê ew melekê xerabiyê, melekê dijminatiyê bû.

Yuzbaşiyê me Esat, mirovekî pir tirsonek û kêş bû, wî esrar dikişand, araq vedixwar, loma jî her dem çavên wî nepişî bûn, dixwest ko em ew kesên li wê girtîgehê de gardiyan bûn, weke wî bin. Wî her tişt ji bo me serbest kiribû, car carna jî wî em dawetî vexwarinê dikirin, wî bi destê xwe qedehên me dadigirt, cixareyên bi esrarê dagirtî dida me û wî bi destê xwe cixareyên me vêdixist. Piştî ko em serxweş diketin, êdî wî dest bi axaftina xwe ya ko li dij wan kesên girtî dikir, weha dikir ko me digot hema niha em herin û çend kesan ji wan bikujin, ji xwe biserketina yuzbaşî yek jî ev bû. Hele hele di rojên taybetî de (weke 12 îlonê) wî em baş serxweş dikirin û dişandin ser girtiyan ko em li wan bidin, dema me li wan dida wî jî di şibakan de mêze dikir, ji dengê hawar û lêdana girtiyan sermest dibû, kêf dibû kêfa wî, roj dibû roja wî. Di kêfxweşiyên weha de gelek caran ew ji bona ko baş ji me emîn be, hemû tiştên me ji alî wî de dihat kontrolkirin, baweriya wî bi me tu kesî nedihat, di demên lêdanên hucran de ew jî dihat ba me û wî weha digot:

— Qardiyan! niha ez jî weke girtiyekî werim, hûn ê çi bi min bikin?

Bersîvên me yek bûn, em ji wî fêr bû bûn. Me weha bersîv dida wî:

— Eger tu jî wekî girtiyekî bê vir ez ê di diya te jî.....

— Aferîm, eger te weha negota min ê di diya te...

De binere ko navbêra me û ya yuzbaşî ewqasî xweş bû, me jî dikarîbû ji wî re hertişt bigota, dema me digot kêfa wî dihat, ma di serbestiyeke weha de kî ê, wê ecêba ko me dikir, nekira. Kesî nedixwest ko ji wê rehetiyê derkeve û here li leşkeriyê de nobetê bigire, lêdanê bixwe. Li wir yanî li girtîgehê, me lêdan dikir. Di gelek waran de azadiya me hebû, yeka

me tu carî nedibû dido.

Me rojê du caran serhejmera qawişan dikir, carekê serê sibê û ya din jî êvaran bû, mebesta serhejmarê ev bû ko bê ka kî reviya ye, kî ne reviya ye, lê mebesta wan serhejmarên ko me di girtîgeha Diyarbekrê de dikir ne ev bû. Kesekî nikarîbû ji vir bireviyana, tu kesekî nikarîbû, xwe ji wir azad bikirana. Ji dêlva carakê me rojê du caran serhejmar dikir ko em bikaribin rojê du carên lêdanê garantî bikin. Gelek kesên efsar û sermend ko li girtîgehê polîs bûn lêdanên taybetî dikirin, li rewşa girtiyan mêze dikirin û li gor zanebûnên xwe qasî ko em tê gihiştin wan rapor didan, berpirsiyarên xwe.

Piraniya wan kesên efser yên di serhejmaran de beşdar dibûn polîsên sivîl bûn, em weha tê gihiştin ko ew kesên weha jî alî MIT´ê de dihatin şandin, wan kincên efseran li xwe dikirin û bi me re diketin qawişan, bi taybetî jî wan li ew kesên ko di işkencan de qise nekiribûn dixistin. Lê dîsa jî me, ji karê wan tu tişt fam nedikir, ji xwe yuzbaşiyê me digot ku: »Gardiyanên min divê hûn zêde aleqederên xwe ji van efserên ko serhejmaran dikin neynîn« loma jî em zêde li ser vê yekê ranediwestiyan.

Kesên weha bê lêdan tucarî ji qawişan dernediketin, ew jî fêr bû bûn ko divê berê ji girtiyan re sûcekî bibînin û dûre lêdana xwe bikin. Serhejmara qawişan diyar bû, dido dido diketin rêzê û weha jî dijmartin, lê carna efser tu kêmasî nedidîtin, îcar hina ji wan ji serê rêzê kesek derdixist, û digot »bijmêrî«, ji bona ko girtî fêrî jimartina weha ne bû bûn, gelekan xwe şaş dikirin, ew bêtirîn kesên nexwenda bûn, yanî dema kesek ji serê rêzê dihat derxistin, jimartin dibû fer, girtiyan digot in. »1-3-5-7« Şiklê vê hejmartinê ne weke ya din ko ew kesên ne xwenda fêrî wê bû bûn.

Di şevên nobedariyên wan efsaran de qawişan tu rehetî ji xwe nedikirin, cixarên piştî şîvê nedikişandin. Piştî xwarinê emir dihat dayîn ko hemû qawiş weziyeta serjimarê bigrin, di rewşên weha de jî çûyîna tuwaletê, cixare kişandin, av vexwarin, qedexe bû, pêwîst bû ko her kes li ser niga li benda kesên ko wê serjimarê bikin disekinîn. Me weha texmîn dikir, êdî girtiyan jî dizanibûn ko di şevên weha de ew efserên polîs nobedar in. Loma jî dema ko me deriyê qawişekê vedikir, mesûlê girtiyan qomûteke weha didan ko dîwar dihejandin. Em diketin hundir efser digot:

— Bijmêre.

Herkesekî serhejmara xwe bi nîzamî dikirin, kesî xwe şaş nedikir, loma


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

jî êdî efser kesek ji serê rêze derdixist û dîsa digot:

— Ew nebû ji serî de bijmêrin.

Di fer jimartinê de hina xwe şaş dikirin, wê demê jî ji bona wî kesê ko polîs bû û cilên efsaran li xwe kiri bû kêfa wî dihat. Di şaşkirina jimartinê de polîsê me lêdana ko dixwest dikir«.

Dema gardiyan ev bûyer weha ji min re şirovekir, wê demê hevalekî ko navî wî Hesen bû, hate bîra min. Dîsa di rojeke weha de bû, dema ko gardiyan û ew polîsê ko kincên efsera li xwe kiribû, ketin qawişa me, me jî gelek hevalên nezan û nexwenda weha xistibû rêzê ko hejmara wan bi wan dabûn ezber kirin, dema dora wan dihat wan jî hema wê hejmara xwe ya ko jiberkirbûn digotin.

Me serhejmara cara ewilî baş kir, li gor nîzam û qaîdan pêk hat, efser nerî ko nabe, îcar wî yek ji serê rêzê derdixist û ji dêlva cot em bûne fer, wî got:

— Ew nebû dîsa bijmêrin!

Heval dest pê kir 1.3.5 û ûhw. dema dor hat ser hevalê Hesen wî dîsa weke berê hejmara ko wî ezber kiribû got. Ji dêlva wî yê bigota 15 wî got 16 hema di cih de efser got:

— Bes!

Em hemû sekinîn, ew keniya berê xwe ber bi Hesen ve kir û got:

— Wer, wer, hela wer, ez ji te re serhejmara te bêjim.

Heval Hesen ji nava me derket, gavekê dûrî wî sekinî, berê silava niga, dûre ya serî û dûre bi dengekî gelekî berz got:

— Hesen! Mêrdîn, emir bike qomûta....!

Hîn wî qomût temam nekir, efser kulmek pê ve danî, Hesenê me bi wê kulmê ket û ranebû. Me dizanî bû, ko wî çawa li heval da, lê tiştekî ko ji destê me jî bihata tune bû, me nikarîbû rahişta wî jî, piştî ketina hevalê Hesen, dilê efser rehet bû û wî îcar serhejmar rast kir û derket, di derketandinê de got:

— Divê hûn wî zû bînin ser heşê wî.

Derketin û çûn, ew çûn lê hevalê »mirî« di nav destê me de ma, me hina av li ser çavên wî kir, me hina ew mesaj kir, me hina jî baweşîn dikir ko ew hênik bibe. Wel hasil piştî qederekê Hesenê me bi ser heşê xwe hat çavên xwe vekir, bi çav vekirina wî re kêfa me jî hat ko ew ne miriyê, dema wî çavên xwe vekir û li me mêze kir, em her yek dişibandin gundiyekî xwe, bi me re dixeyîdî û em hin jî dişibandin mirovên xwe carna bi destê me yekî digirt, jî yê din pirsî û digot :

— Kurapê min, ma gelo apê min û amojna min çawan e? Min ew ji zûde nedîtine. Di vî halî de hevalê me Hesen roja duda bi ser heşê xwe de hat. ‹car tiştên ko wî bêheşê xwe digot, ketibû devê me yên ko skeç û pandomîn çêdikirin, bi rojan me li ser wê bûyera hevalê Hesen pêkenîn û skeç, ji havalên din re amade dikir. Ji xwe malzemên skeç û pandomîmên me, ji nava wan bûyerên ko bi serê me dihate derdiketin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# XVII

Di demên meşê de, kesên ko xwe şaş bikrana yan jî dengê xwe baş dernexistina, an jî çongên xwe hetanî zikê xwe hilnekişandina jor, jî alî me de dihatin cezakirin.

Me baş famkiribû ko êdî girtî ji lêdanê natirsin û em bi wê lêdanê nagihên tu armancan. Loma me dixwest ko em her şikilên tadê û îşkancan di wan de bi karbînin. Me şiklekî weha dîtibû ko hemû girtî ji wê metodê gelekî aciz bûn, acizbûna wan her car ji alî me de dihat dîtin.

Li derve li cihê ko me meş bi wan dida kirin, cihoka (laxima towaletê, karêzê) hebû, ser wê cihokê bi kevirekî beton î mezin hatibû girtin, dema ko kesek ji alî me dihat cezakirin, me ew kevirê ser wê laximê bi wî dida rakirin, ew ê ko ceza heq kiribû dikete wir, xistina wi jî li gor şiklê cezayê bû, em bêjin ko cezayê girtî ne zede bû, wê dema me ew kes heta çongan dixist wir û bi vî awayî li gor giraniya sûcê wî me ew di nava pîsî de dida rûniştandin, an jî sekinandin. Ev metoda me ya nû him ji bona me rehet bû û him ji bona girtiyan cezayekî gelekî giran bû, ji ber ko ew di nava gû de diman, piştî derxistina wan ji wir bi rojan ew bêhna pîs ji wan ne di çû. Lewra av tune bû, ko ew xwe bişon, bêhna wî gûyî, di qawişê de belav dibû, herkesî nesîbê xwe ji wê bêhnê digirtin. Ji ber wê bêhna pîs me dizanî bûn ko girtî diketin çi rewşê, ev yek em kêfxweş dikirin, ew hevalê gardiyan ê ko ev îcat dîtibû, yuzbaşiyê me perakî baş û mehek jî îzin dabû wî.

Ji bona ko her qawiş bikaribin, toza xwe ya di hundir qawişê de bidin serhev û ji bona gemara xwe bavêjin, me her qawişê tenekayeke tozê dabû wan.

Valakirina wî tenêkeyî, ji heftê rojekê bû, ew roj jî ji alî me de hatibû beyankirin. Eger qawişekê berî roja valakirinê, teneka xwe dagirtibana û ew ji alî me gardiyanekî de bihata dîtin, me ew teneka tozê bi girtiyan dida xwarin, wer dida xwarin ko weke ew xwarineke xweş bixwin. Ma mêr hebûn ko nexwarina an jî mêr hebûn ko li dijî emirên me derketana.

Em bêjin ko qawişekê berî roja valakirina tenekê tozê, ya xwe dagirtiye

û me dît. Me xeber dida çend gardiyanên din û em qederê 9-10 gardiyanan bi hev re diketin wê qawişa ko tenekayên xwe ya tozê berî dema xwe dagirtiye.

Berî ko em ê têketana hundir, gardiyanê wê qawişê, gazî mesûlê wan dikir û digot:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

— Teneka we ya tozê berî dema xwe hatiye tijekirin. Loma jî divê îro em cezayekê li we bibirin, de zû têkevin rêzê, va ye em tên.

— Tu emir dike komutanê min.

Dema ko em diketin hundir, mesûlê girtiyan çend gava ji wan dûr diket, silaveke nîzamî dida û ji qawişê re digot: »Dîqat« yanî hazir be. Û em diketin hundir. Li dor girtiyan diçûn û dihatin, çend kesên ko li gor me ne nîzamî sekinîbûn, lêdan dixwarin û dûre gardiyanê qawişê digot:

— Hûn dizanin cezayê ko em ê îro bidin we çi ye?

Wan bi hev re digotin:

— Na, qomûtanê me.

— Belê, belê hûn dizanin, ma hûn nizanin ko dema tenekê tozê berî dema xwe bête dagirtin, hûn ê bêne cezakirin. Hûn emirê ji alî me de tê dayîn pêk naynin. Kesên ko emirê tê dayîn pêk neynin, wê bêne cezakirin. Ceza we jî wê ji bo vê yekê be, pêwîst e ko hûn wê toza ko di teneke de ye bixwin.

Wan bawer nedikirin ko em ê bi rastî tozê bi wan bidin xwarin, loma wan digot:

— Tu emir bike qomûtanê me.

Gardiyanê qawişê gazî mesûlê girtiyan dikir û digot:

— Mesûl!

— Emir bike qomûtanê min.

— Zû teneka tozê bîne vir.

— Tu emir bike qomûtanê min.

Bi awayekî bi lez mesûl diçû teneka tozê ji towaletê dianî û li benda emirê me disekinî. Gardiyanên wê qawişê ji wê rewşê gelekî kêfxweş dibûn, loma bi awayekî devliken û hebekî jî sert digot in:

— Tenekê valayî orta qawişê bike.

Mesûl teneke valayî ortê dikir û digot:

— Emirê te hatiye cih qomûtanê min.

‹car ne tenê gardiyanê qawişê em hemû gardiyanên wir gelekî kêfxweş


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dibûn ko em van mirovên xwenda, zana û gelekên wan di şûna bavê me de me bûn, weke heywana, wê toza ko wan avêtiye, bi wan bidin xwarinê. Ma tu nizane ko çiqa xweş bû ko dema wan bi hev re dest bi xwarina wê tozê dikirin. Ji vê kêfê xweştir tu tiştekî din tune bû. Bi vê kêfxweşiya ko em ê gemarê bi wan bidin xwarinê me digot:

— Xwe li dor tozê bicivînin û weziyeta xwarinê bigirin.

Girtiyan hema zû bi zû xwe li dora zibil didan hev dibûn weke bazinekî li dora wê, çongên xwe didan erdê, devê xwe nêzîkî zibil dikirin û li benda emirê din radiwestiyan.

Dema me li wî halê wan dinerî ji kêfa, em mest dibûn. Me bawer dikir ko tu kes nikare bi me, ji me mezintir tu kes tuneye. Kes nikare tu tiştekî ji me re bêje, ji ber wê jixwebawerkirina di wê demê de bû ko min dixwest, tiştên weha bînim serê malbata xwe û dost û hevalên xwe. Ji ber hin bûyerên weha mejiyê me hatibû şûştin ev tiştên weha ketin jiyana me ya sivîltiyê jî. Ma ne ji ber vana bûn ko ez ji alî herkesî de, dîn dihatim naskirin ko di eslê xwe de tu dînbûna min tune.

Emirê xwarinê me dida û digot:

— Bixwin!

Wan dest bi xwarina Tozê dikirin. Bixwe ha bixwe. Wan dixwar em dikeniyan Me hin dişibandin çêlekan, hin dişibandin, bizina û hin jî dişibandin mîhan. Girtiyan carekê her tiştên xwe xistibûn destê me, êdî wan bixwesta jî nikarîbûn bêemiriya me bikirana. Em li ser serê wan disekînin. Me carna li wan dida, carna jî tinazê xwe bi wan dikir. Ma tenê xwarina wê tozê. Na, na piştî qedandina tozê, wan ew erdê ko çop lê hatibû rijandin jî divê bi zimanên xwe paqij bikirana, piştî bi zimanan paqijkirina erdê, wan digot:

— Emirê te hate cih komutanê me.

De werin vê ecêbê, him toz, dixwarin, him bi zimanên xwe erd paqij dikirin û dû re jî digotin:

— Emirê te hate cih.

Her dem yuzbaşiyê me ji me re digot »Kurên min, hûn nikarin van mirovan bi lêdanê bîn in rê, li gel lêdana wan, pêwîst e ko hûn di warê pisîkolîjîk de jî wan têxin rewşên nebaş, ko bêmoralî têkeve nava wan ko ew hîn zûtir, têkevin destên me. Loma me jî her cûreyên lêdan û işkenceyên pisîkolojîk bi kar dianî.

Carna me şibake vedikir, girtî radibûn, me lê dixist û em diçûn, bi saetan şûn de nedihatin, pêwîst bû ew weha li benda me bisekiniyana ko

heta me bigota »rehet«. Tu karî bêje ko çima hemû girtî radibûn ser xwe. Ez vê jî ji te re bêjim, dema me gardiyanan ew şibaka di derî de vedikir, gelek gardiyanên din diçûn xwe didan ber wan şibakên di dîwêr de û li girtiyan dinerîn, kesekî ko raneba an jî neketa sekina nîzamî ji alî wan gardiyanan de dihatin dîtin, ew kes an kesan dihatin tespîtkirin û em diketin hundir, gardiyanê qawîşê digot, »ew kesên ranebûne ser xwe bila derkevin der«, ma gelo mêr hebû ko derneketana. Derneketina wan du alî bû, yek, eger ew derneketana hemû qawiş dihatin cezakirin, ya dudiyan jî ew bi cezayekî hîn girantir dihatin cezakirin. Me bi vî awayî herkesê girtî fêrî xwedî li sûcê xwe derketinê kiribûn.

Carna jî me kesên ko alîkariya me dikirin, yanî li gor gotina, ew kesên xwefiroş, re digot ko »binerin em ê îro werin şibakên qawişa ko tu lê ye vekin, divê tu ranebe ser xwe, dema me gazî jî kir, tu dernekeve derve ko em hemû qawişê cezabikin« Ew kesên alîkarên me jî, fêrî fêlbaziyên me bû bûn, piştî lêdana qawişê me ew kesên weha dibir, mutfaxê, li wir xwarin û çay dida wan.

Piştî plankirina vê fêlbaziyê, em çend gardiyan diketin ber deriyê qawişê û me çendan jî di şibakên diwêr re dinerî, me yekî jî şibaka di derî de bi hêl vedikir, ji bilî mirovên me, herkes radibûn ser nigan, lê ew kesên me ranedibûn, me derî vedikir, em çend gardiyan diketin hundir gazî dikir:

— Ew kesê ranebû ser xwe bila derkevin.

Kes dernediket, me xwe hêrs dikir, çend fort dikir, lê dîsa kes dernediketin, îcar me qawiş dixiste rêza lêdanê. Ji bona lêdanê me, dido-dido- sê-sê derdixistin derve û lê wan dida. Me ew kesên xwe yên xwefiroş dihişt dawî yê, dûre ew jî derdixistin, xwarin û çaya wan dida wan û weke me lê da be, bi axîn û waxîn diketin hundir, lê ez wer bawerim ko hemû girtiyan bi kesên weha dizanîbûn, lê nikarîbûn tu tiştek bigotana.

Êvaran piştî serhejmaran, me deriyê qawişan kilît dikir û kilîtên deriyan didan îdara girtîgehê. Ji ber ko di wê girtîgehê de kesî baweriya xwe bi kesî nedianî, herkes ji hev bi tirs bûn û bizdonekê me yê mezin jî yuzbaşî Esat bû. Sawa girtiyan her dem di dilê wî de bû. Di nava me de bêbawerî û di nava girtiyan de jî qasî ko me fam dikir baweriyeke xurt hebû, ji xwe tiştê ko em pê nerehet dibûn, ev bû. Ji xwe girtiyên wir bi saya serê wê baweriya di nava xwe de zû bi zû nediketin û baweriya wan qels nedibû. Di girtîgehê de pir hewldan hatin kirin ko em bêbaweriyê têxin nava wan, em toximên bêîtifaqiyê di nav wan de belav bikin. Me

gelek caran ew berra hev didan, me gelek caran tiştên ne rast li ser navên hevalên wan digotin û gelek caran jî me weha li wan dikir ko li ber hev bisekinîn û bi sîlan li hev xin. Lê dîsa bi hev re qisedikirin, dîsa di nava wan de hezkirin, berdewam bû. Qedr û qîmeta wan li hemberî hev hebûn. Wan bêhurmetiya hev nedikirin. Lê em ne weha bûn, em ji bo çend parî nanê xweş û ji bo çend quruşên heram bû bûn yek. Ji bo menfeeta şexsî me li girtiyan dida, ew birîndar dikirin. Hin jî ji ber lêdanê me hatin kuştin. ‹ro, tu halê min dibîne, ez weha bawer dikim ko ew kesên li wê girtîgehê gardiyan bûn, mirov dikare bêje, hema hema hemû weke min in. Lê ew girtiyên wê girtîgehê ne weha bûn, wan ji hev hezdikirin, wan bawerî bi hev dianîn«.

Dema wî behsa, êvaran û kilîtkirina deriyan kir, rewşa hevalê Yusuf kete bîra min, ko ew cixarqêşekî qawişa me î sereke bû. Ew ji nên bêtir li cixarê difikirî. Rojekê piştî serhejmara êvarî bû, ko êdî dema razanê hêdî hêdî dihat, me hina kincên xwe datanî û hina cixare dikişand. Ji ber ko piştî serhejmara êvaran mirov dikarîbû cixareyekê an jî dudiyan bikşîne. Lê cixarekêşên me yên qawişê heta sê û çaran jî dikişandin. Hin hevalan haziriyên xwe ê razanê dikirin û kesên nobedar jî hêdî hêdî xwe ji nobetê re hazir dikirin. Lê hay û bala hevalê Yusuf ji tu tiştî tune bû. Ew tenê bi cixara xwe ve mijûl dibû, wî weha ecele dikir, ko ew bikaribe, heta dema razanê çend hebean bikşêne. Di wê lez û bezê de xwe ji bîr kiribû, çû bû ser nivînê xwe. Him kincên xwe ji xwe dikir, him jî cixare di devê wî debû. Ma kê dizanîbû ko wê gardiyan hîn li ber şibakan rawestiyayî bin. Tu nabê wan qawiş kontrol dikirin, dema ew çav li wê rewşa hevalê Yusuf ketin, kêfa wan weke kêfa gurê ko nêçîra xwe bi dest xistibe, hatibû, loma wan şibaka di derî de vekirin û gazî kirin:

"Ew kesê ko li ser nivîna cixare dikişand bila were vir!«

Hevalê Yusuf qet bawer nekir ko gardiyana ew dîtine, loma ew derneket û xwe rê gardiyan neda. Piştî çend dengdanekî din, gardiyan mêze kir ko kes neyê, ko ew wî nas bike, loma wî bi hêrs got:

"Ez ê sibê vî hesabî ji we bipirsim. Got û bi şîdet şibake girt û çû.«

Ew çû lê bû gupe gupa nava me. Tiştên ko wê bihata serê me an jî yê hevalê Yusuf diyar bû. Em weha bi awayekî xemgîn û bi tirs razan, ji xwe razana me jî çi razan bû, dema çavê me dihat girtin, îcar di xewnên xwe de ya me lêdan ji destê polîs û leşkera dixwar, yan jî em ji ber wan direviyan û ew bi çekên xwe li dû me bûn. Bi bankirina nobederê serê sibê,

em rabûn ser xwe, me kincên xwe li xwe kir û haziriyên xwe ê din jî temam kirin. Dûre me hemû hevalan ji hev re gotin ko »Hevalno ji bo bûyera do êvarî, gardiyan wê li me mana bigerin. Ji bo vê yekê divê em îro her tiştên xwe ji yê her roj baştir bikin, weke meş, xwendina sirûda ûhw« Hîn em weha bi awayekî dizî bi hev dişêwirîn gardiyanê me qerewane anî ber derî û qêriya:

— De taştiya xwe bixwin û piştî serhejmarê em ê hesabê do êvarî ji we bipirsin, diyar e hûn hîn baqil nebûne. Got û çû, lê wer xwuya bû ko ew gelekî hêrs bû bû. Qawişa wî bêemiriya gardiyenekî kiribûn. Ev jî ji bona wî kêmasî bû ko wî hîn qawişa xwe neaniye rê.

Piştî serhejmara serê sibê, di demek gelek kurt de, deriyê qawişa me hate vekirin, gardiyanê me li pêş û li dû wî jî çend hebên din. Ew gardiyanê şevê ko dîtibû hevalê Yusuf li ser nivîna cixare kişandibû, hate ber nivînê wî, bi dengekî berz û bi kêf got:

— Kî li vêderê radizê (Bi tiliya xwe nivînê Yusuf îşaret kir).

Hevalê Yusuf du gav avît pêş, berê silava nigan, dûre ya serî û dûre jî bi awayekî gelekî berz komûta xwe da.«Yusuf Diyarbe...« Hîn komûta wî neqediyabû gardiyan kulmek li ser çavên wî danî, bi danîna wê kulmê re, hevalê Yusuf li erdê rast bû. Ne dev û çav. Xwîn ji pozê wî herikî. Gardiyana weha fam kir ko hevalê Yusuf mir, loma gardiyanê me bi awakî hêrs ji wî gardiyanî re got:

— Te ew kuşt, peyva me ne weha bû.

Em wer bawer bûn ko ew peyv bê hemdî ji devê gardiyanê me derket, ji ber ko wan tu carî li ba girtiyan, kêmasiyên xwe nedigotin û em wer bawer bûn ko ew kesên ko gotineke ji devê xwe derxista wî jî qasî me lêdan dixwar.

Wî gardiyanê ko li heval Yusuf dabû, bi awirekî tûj li gardiyanê me mêze kir û çend pêhînên din li erdê li hevalê Yusuf da û got:

— Cezayê, cixarekişandina ser nivînan weha ye, eger hin mêrên din hebin ew ê jî li ser nivîna cixarê bikşînin.

Ew derketin çûn, ji me re jî hevalekî mirî hiştin, me hîn nedizanîbûn ko rewşa wî çawa ye, bi derketina gardiyanan, em li ser serê heval civiyan, me hina av li ser çavên wî kir, me hina canê wî difirkand. Di qawişa me de hevalekî me î nîvdoktor jî hebû, wî li damara heval nerî û got:

— Hevalno metirsin dijî, lê ez bi xwe jî nizanim bê wê dûre çawa bibe. Bi peyva hevalê me yê doktor, em kêfxweş bû bûn, ko hevalê Yusuf ne mirî ye. Ew bi xwe jî qasî sê-çar rojan di nava nivînan da ma û dûre bê se-

qetiyakê rehet bû, wî jî weke me dest bi meşê û xwendina sirûdên leşkerî kir.

Eger mirov rastiyê bêje, em yek jî ji nexweşiyan rehet nedibûn, lê bi hukmê lêdan û sitresê, me her gav xwe weke mirovên saxlem didît, loma jî em li ser nigan disekinîn.

»Yuzbaşî weha li me kiribû ko em bû bûn weke mirîdê vî.. Wî jî ev rewşa me baş dizanî bû loma digot:

— Kurên min, divê êdî hûn wan destê xwe yên hêja û delal, wan destên, komunist û kurtçiyan tîne rê, zêde newestînin, ji bona vê yekê jî divê êdî em kûçikan di girtîgehê de xwedî bikin û dema pêwîst bû, hûn dikarin tenê kûçikan berra girtiyan bidin. Ji xwe qîmeta girtiyekî, weke ya kûçikekî jî tune bû.

Em her dem di bin kontrol û agahdariyên yuzbaşî de bûn. Her çiqas em serbest bûn jî, lê bêyî wî tu tişt nedihat kirin. Tenê yuzbaşî serbestiya ko em li girtiyan bixin da bû, wî serbestiya ko em bişkokên ber xwe vekin da bû, wî serbestiya ko em pereyên girtiyan bidizin da bû û wî serbestiya ko tiştên kantînê biha bifroşin da bû. Serbestiya me ev bû, bi tiştên vala çavên me girêdabû, bi tiştên weha her daxwaza xwe bi awayekî ko wî dixwest pêk dianî.

Dema wî digot ko »ji bona hûn zêde newestin, em ê kûçikan xwedî bikin« me bawerî pê dikir ko ew, li me difikire. Lê di rastiya xwe de ne weha bû. Me dest bi xwedîkirina kûçikan kir, Û me ew fêrî ko ew jî weke me bibin dijminê girtiyan, dikirin. Me gelek caran kûçik li ser serê girtiyan diceriband ka bê, fêr bû ye, ya ne.

Piştî çendaekî, xwedîkirinê kûçik, wer gîhiştin ko êdî dikarîbûn êrîşî ser girtiyan bikin. Me bigotina »Co« û kesek îşaret bikira, wî xar dibir ser girtiyî ko me îşaret dikir, eger girtî bireviya, ew bê birîn xilas nedibû.

Carna jî em li qawişan digeriyan û hin kesên ko berê berpirsiyariyên wan î rêxistinî hebûn, dineqandin û ew ji bona xwedîkirin û nerîna kûçikan, dikirin berpirsiyarê. Ew kesê ko ev qebûl nekira me lêdaneke dijwar lê dikir ko heta ew vê wezifa muqades qebûl bike. Hina qebûl nekir lê hina jî bêyî ko em lêdaneke qenc li wan bikin, gotin:

— Baş e, qomûtanê min, ez dikarim li kûçikan mêze bikim.

Ew kesên ko berê li mirovan mêze dikirin, rêberê wan bûn, îcar di girtîgehê de, li kûçikên me mêze dikir, bin wan paqij dikir, serê wan dişûşt û xwarina wan dida ber wan. Êdî piraniya dema wan bi nerîna

kûçikan derbas dibû.

Kêfa yuzbaşiyê me ji vê yekê re dihat ko wî kûçik bi wan kesên berê berpirsiyarê rêxistina bûn dida xwedî kirin. Bi serbilindayî, ji hin girtiyên ko hîn teslîm ne bû bûn re digot:

— Hûn hîn lêdanê dixwin, lê berpirsiyarê we, weha hatine rê ko êdî ew li kûçikên me mêze dikin.

Jî bona ko girtî ji vê gotara me bawer bikin. Me car carna navên wan kesên li kûçikan dînêrin, digot in. Carna jî me ew dibirên cihekî ko ew bi çavên xwe li berpirsiyarên xwe yên berê binerin, da ko ew jî zû xwe teslîmî me bikin. Tiştên dizanin, bêjin. Vê yekê tesîr li gelek girtiyan kir û hin ji wan bi saya berpirsiyariyên wan î rêxistina yên berê, ko li kûçikan mêze dikirin, xwe teslîmî me kirin«.

Dema gardiyan behsa kûçikên di girtîgehê de kir, ew rewşa ko roja avukatê min hatibû û gardiyan banî min kiribû ko ez û avukatê xwe hevdu bibînin, hate bîra min. Wî, ez derxistim derve. Bi meşa komando û xwendina sirûdên leşkerî û bi lêdanê min xwe gîhand hetanî cihê hevdîtinê. Di kabînê de avukat li benda min bû, li ba wî dido û li ba min jî gardiyanê me hebû. Ji xwe tu tiştekî ko em zêde biaxifiyana tune bû. Gelek tiştên giring hebûn, lê me newêrîbûn wana li ba gardiyana bêjin, qise bikin. Loma hal û xatir, dûre jî bi çend pirsên basît me ziyareta xwe qedand. Û ez li qawişa xwe vegeriyam, gelo ew kesên biçûna dîtina avukat û lêdan nexwarana hebûn. Na, ez bawer nakim ko ji bilî wan kesên xwe firoş tu kesek hebe. Rewşa min jî ji ya wan hevalên ko lêdan dixwarin ne cûda bû.

Belê çi bû di vegerê de bû, dema ez û gardiyanê xwe em ketin salona mezin li wir gelek gardiyan jî sekinî bûn. Ez weha tê gihiştim ko ew ji bona kesên tên dîtina avukatên xwe li wir rawestiya bûn. Lewra dema kesek ji cihê ziyaretê vedigeriya ew gardiyanên din ko li wê salonê sekinî bûn, tinazê xwe bi wan (kesên ko dihatin dîtina avukat) dikirin. Hina ji girtiyan re digot in »bisekine« hina digot »rûnê«, hina digot »razê«ma kê karîbû ji xeynî gardiyanê xwe bi ya wan ê din bikirana. Weke hatibû diyarkirin ko gardiyanan bi vî awayî dixwestin ko meriv xwe şaş bike ko ew jî lêdana xwe bikin. Min jî weke her hevalekî bi ya tu gardiyanê din nekir û piştî çend gava kûçikê yûzbaşî, ê bi navê »Co« bi berçavê min ket. Tirsekê ez girtim ko ew ê »Co« berra min bidin, hîn ez di vê tirsê de bûm, gardiyanê me, ji min re got:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Bireve!

Ez mecbûr bûm ko emirê wî pêk bînim û reviyam, dema ko ez reviyam hema »Co« yê yuzbaşî ji paşiyê de bi nigê min girt,. Heta ko ez sekinim wî xwîn bi ser nigê min de anî. Dema »Co« bi nigê min girt ez li cihê xwe sekinîm, gardiyan kir û nekir, ez ji cihê xwe ne lebitîm. Lewra min zanîbû ko dema ez xwe bilivînim wê »Co« ye nigê min perçe bike. Loma ez bi lêdana gardiyan razî bûm û min xwe nelivand. Dû re gardiyan gazî »Co« kir. Bi halekî xerab, ez û gardiyan em hatin ber deriyê qawişa me. Wî derî vekir û ez delkdam hundir û got:

— De bimire, kurê kerê.

Hevalên ko çav li vê rewşa min ketin, hema reviyan pêşiya min, wan bi min girtin, ez danîm ser nivîna, pantolênê min ji min danîn, çi bibînin, meraqa wan zêde bû û gotin:

— Heval çi bû ye?

Min ji wan re ew bûyer şirove kir û got:

— Hevalno, meraq nekin, ev tiştê hate serê min dikare were serê we hemûyan, divê ji îro pê de em xwe ji vê re jî amade bikin.

Belê bi vî halê xwe yê birîndar, li gel meşa komando û li gel sirûdan, gardiyan ez anîm hetanî qawişê. Wan bi zanetî kiryayarên weha dikirin ko em û avûkatê xwe hevdu nebînin. Em ji mafê xweparastina li dadgehê dûr dixistin. Wan baş dizanîbûn ko her hevdîtineke me û avukat, ji bona xwe hazirkirina dadgehê alîkariyeke baş bû. Wan nikarîbûn bi eşkere bigotana ko bila avukatê kesî neyê. Lê bi lêdaneke weha, gelek kes êdî nema diwêrîbûn biçûyana hevdîtina avukat,

»Ji ber wê lêdana me ya keteber, gelek girtî seqet mabûn, kesekî ko qismetê xwe ji lêdanê, negirtibana tune bûn. Ji ber ko me, gelek kes di wê girtîgehê de seqet hiştibûn. Bi wan kesên seqet meş ne dikirin. Dema qawiş derdiket derve, kesên seqet li hundir diman. Ji bona kesên di hundir de diman, xwe rehet nekin, ew jî ji lêdanê bê par nemînin, em çend gardiyan diketin hundirê qawişan. Ew kesên seqet an jî dereke wan şikestî, radibûn, diketin sekina nîzamî, hin kes ji ber seqetiyên xwe nikarîbûn, bi awayekî nîzamî rawestiyana. Kesên weha têra xwe lêdan dixwarin. Li wan kesên seqet jî weha hatibû ko wan dixwestin li derve meşê bikin û di dema derketina hevalên xwe de li hundir nemînin«.

Dema wî behsa kesên seqet kir, rewşa Xalê Seîd kete bîra min. Em li

derve bûn û me meş dikir, sirûdên leşkerî dixwendin, lêdan û tinazên gardiyana ji ser serê me kêm nedibûn. Di bin wê tava germ de qederê du saetên me qediya bûn ko gardiyanê me em xistin hundir. Em ji hal de ketibûn, bi ketina hundir, ji me hin reviyan towaletê, hina xwe dane erdê, hîn bîhna me baş nehatibû ber me ko dîna me dî Xalê Seîd dinale. Xalê Seîd ji qezayeke Mêrdînê bû. Temenê wî li dora 50 salî bû. Ji ber temenê wî gardiyanê me ew dernedixist meşê. Xalê Seîd li gel çend hevalên seqet di demên meşê de li hundir dima. Bi wî dengê Xalê Seîd em çend kes ber bi wî çûn, dîna me dît ko xwîn ji nav şeqa wî tê, me rewşa wî meraq kir û me ji wî pirsî:

— Xalî Seîd, çi bi te bû ye? Ev çi halê te ye?

— Qet nepirsin!

— Çawa dibe ko em nepirsin Xalê Seîd, de ka bêje, ev çi halê teye?

Êdî xalê Seîd dest pê kir:

— Piştî derketina we, Çawişê bloka li gel çend gardiyanên din hatin hundir, em ji ber wan rabûn, ketin sekina nîzamî, ew hatin ba min gotin:

— Kesên ko hîn dixwazin nerehetiyan bikin, an jî li me guhdarî nekin hene?

Min got:

— Na, qasî ko ez pê dizanim her kesên vê qawişê baş in, her emirê ji alî gardiyanan têne dayîn, pêk tînin.

— Kesên ko li dijî me propoganda dikin hene?

— Na, qomûtanê min

— Kesên ko hîn daw û doza komunistiyê an jî kurtçitiyê dikin hene?

— Na, komutanê min.

Çend pirsên din jî yên weha ji min pirsîn. Min jî bersivên li gor xwe dane wan. Lê baweriya wan bi min nehat, berê çawiş çend kulm danîn min, dûrê dîsa pirsên xwe domandin.

— Baş e, kî ye ko yê li vê qawişê emirê biryarên siyasî dide?

— Wele ez nizamin komutanê min.

— Naxwe tu nizane ha! Tu jî ji wan e ha! De ka her tiştê vê qawişê ji me re bêje. Eger tu vê neke em kîrê te (mêraniya te) jêkin. Min got:

— Di emirê we de ye komutanê min, lê bi rastî jî ez tu tiştekî nizanim. Ez kesekî kal û di halê xwe de me. Ez ji danûstendina wan tu tiştekî famnakim. Çawiş domand:

— Derewa meke, ya na tu zanî wê çi bê serê te.

— Wele ez derewa nakim komutanê min.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Werhasil wan tu tiştek ji min fam nekirin, têra xwe li min dan, dûre jî çawiş şîşek ji bêrîka xwe derxist û xiste hundirê mêraniya min, tê de bir û anî ev xwîn ji wir tê.

»Me di girtîgehê de, dereke kê bişkanda, pêwîst bû ko ew kes, sedemê şikandina pî an serê xwe, negota ko »gardiyanê min li min xistiye, loma jî vir şikest« gotineke weha di girtîgehê de qedexe bû, pêwîst bû kesên weha bigotana »Ez ji ranzayê ketime û vira min şikest« ji ber ko carna kesên mafê mirovan diparastin an ji hin Radyo û TV dihatin, dema wan pirs bikira lazim bû, ko girtiyan weha bersivên wan bidana. ‹car, car carna me ew kontrol dikirin ko bê hela kesî xwe ji bîr kiriye ya na. Em diketin qawişan kesekî ko dereke wî şikestî re digot:

— Kurê min çi bi vir te hatiye?

— Komandanê min, ez ji ranzayê ketim û vêderê min şikest.

— Kurê min lêdan li vir heye?

— Na, komandanê min na.

— Kurê min gelo vir çi ye?

— Vir dibistan e, ew dibistana ko ji bona me girtiyan hatiye vekirin û em di vir de dersên baş digirin.

Bi gotinên wan î weha kêfa me dihat, ji xwe mêr tunebûn ko li dijî wan bêjeyan tiştekî din bigotana. Ev bêjeyên weha, me bi hemû girtiyan dabû, ezberkirin.

Di qawişekê de ji ber lêdanê girtiyek ketibû rewşeke nebaş, em ji rewşa wî tirsiyan. Loma me doktor anî da ko li wî binêr e. Li gor rewşê hinek derman bidê. Em ketin hundir, doktorê me çû ber serê wî kesê birîndar, weha lê mêze kir û pirsî:

— Kurê min, çi bi serê te hatiye, ewqasî şikestiye?

— Komutanê min ez jî ranzayê ketim.

— Tu ji kîjan ran

zayê ketî?

Girtî ranza qatê binî rê doktor da got:

— Ez ji vir ketime, komutanê min

Ev gotina girtî him ne li gor dilê me û him ji ne bi dilê doktor bû. Ji ber ko kesê ji ranzê yek qatî bikeve tu tiştek pê nayê. Ji xwe piraniya doktorê girtîgehê, zilamên îdarê bûn, wan jî weke me tade û zordarî li girtiyan dikirin. Dema doktor mêze kir ko girtî bersiveke ne qenc da, loma wî xwest ko vê yekê rast bike û got:

— Na, kurê min na, qey nayê bîra te ko tu ji ranzê qatê dudiyan ketiye. Li xwe baş mêzeke û careke din ji ranzê nekeve.

Girtî bi awekî zû bi zû xwest wê şaşiya xwe rast bike, loma hema wî got:

— Belê, belê, komutanê min, rast ez ji yê jor ketime, lê ji ber êşa xwe ez nizamin min çi gotiye.

Me jî hema li wir bi awirên sert ew tehdît kir û li benda derketina doktor rawestiyan. Ji ber ko doktoran digotin ko »dema em hazir bin, tucarî li girtiyan nedin« Piştî çûyina doktor, me ew kesê nexweş û serê wî şikestî, xiste rewşeke din, ko êdî ew doktor nexwaze«.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## XVIII

»Êdî derdekî nuh û işkenceyeke taybetî dest pê kiribû. Gelek daweyên girtiyan hatibûn vekirin, girtî êdî divê biçûna dadgehê. Birin û anîna wan, ne ewqasî rehet bû. Gelek kes hebûn ko bi salan di wir de razabûn, gelek li benda vekirina dawên xwe bûn ko vebin. Loma carna gelek kesan ji me re digotin »komutanê min, dema dawa min vebe, ez ê bême berdan, tu sûcê min tune ye« Lê me ji tu kesî bawer nedikir. Girtiyan dizanî bûn ko di encama dadgehê de wê gelek bêne berdan. Bi hêviya ko wê bêne berdan, li benda dawavekirina xwe dîpan.

Ew roj jî hat, wan tu carî bawer nedikirin ko di wê rojê de jî em ê li wan bidin û işkenceyan bi wan bikin. Ew difikirîn ko hema dawa wan bête vekirin, her tişt xilas dibe. Lê ne difikirîn ko yuzbaşiyê me jî li benda vekirina daweyên wan bû û di demên hatina îddîanemeyên wan de wê çi bihata serê wan. Tenê wan dixwestin ko rojekê berî rojekî dawayên wan bête vekirin.

Dema îddîanemeyên girtiyan dihat girtîgehê, berî ko girtî wan bibîne, îddîanameyên wan ji alî yuzbaşiyê me Esat ve dihatin xwendin. Wî ew kesên rêxistin damezrandibûn, ew kesên ko leşker an jî polîs kuştibûn, navê wan yeko yek li ba xwe dinivîsî, piştre ew kesên weha, wî bi xwe li girtîgehê mahkeme dikir, li wan dida, işkenceyên gelek ecêp dianî serê wan. Ew girtiyên di rewşên weha de tenê du rê li pêşiya wan hebûn. Ya ew ê daxwaza yuzbaşî pêk bianiyana û tiştên ko wî dixwest binivîsandina, ya na jî ew kes we di wirde bihatana kuştin. Ji bilî van her du rêyan tu xelasiya ko kesên li girtîgehê dihatin mahkemekirin tune bû. Bi saya sedema dawavekirina girtiyan yuzbaşî hin kesên bi cezayê mezin dihatin îthamkirin xîste bîn işkencên taybetî ko kesên weha her tiştî jî wî re bêjin. Wî hin teslîm girtin. Wan daxwazên yuzbaşî pêk anîn û nivîsên xwe li gor dilê yuzbaşiyê me nîvisin. Ew kesên weha ji çendên tirsok pêk dihat, piraniyan kesên sûcê wan gîran li hember wê lêdan û êşkencêyên me bi wan dikir, radiwestiyan û tu tişt ji yûzbaşî re nedigotin, eksê wê li dadgehê her bûyerên ko me di girtîgehê de dikir li wir dîgotin.

Gelek girtiyên ko berê di nava rêxistinên xwe de berpirsiyar bûn, yan jî gelek kesên sûcê wan giran bûn, yuzbaşiyê me ew ji qawişê wan derdixistin, dibir hucran, bi rojan li wir bê nan, av û cixare dihiştin. Dawiyê kaxezek dida wan û digot:

— Binere mezinê vir ez im, ji min mezintir kes li vir tune ye û kes nikare têkilî nava karê min bibe, ez çi bikim dikarim, berdana te û cezakirina te jî di destê min de ye. Li gor ko min îddîanemeya te xwendiye, bi kêmanî tu yê 30-40 salî ceza bixwe. Bêyî ko ez lêdanê li te bikim, serpêhatiyên xwe, karûbarê xwe yên rêxistinê yeko yek binivîse, di binê kaxeza xwe de jî bêje ko »ez ji hertiştê ko min kiriye poşman im« Wê demê ez karim te bidim berdan. Na, eger tu tiştekî weha nenivîsîne, tu zane ko tu ê nikaribi ji vir bi saxî derkeve. Êdî ez diherim. Dema te dest bi nivîsê kir, xebera gardiyana bighînê ko bila ew ji te re, çay, av û xwarina xweş bînin. De hadê êdî tu dizane, ya mirin yan jî azadbûna te, her tişt di destê te de ye. Ji herduyan yekê hilbijêre.

Bi rastî jî tiştê ko yuzbaşiyê me digot, pêk dianî. Hin kesan ji bona di wir de neyên kuştin, hin tiştên ko baweriya yuzbaşî pê dihat dinivîsîn, dema ew diçûn dadgehê ew tiştên ko di girtîgehê de nivîsîbûn, înkar dikirin û digotin:

»Min ew tiştên nivîskî bi darê zorê nivîsiye û ji xwe hemû derew in, ji bona ko ez di girtîgehê de neyême kuştin, ji bona ko ez wan bûyerên di wirde dibin, bêjim min hin tişt nivîsîn, Niha ez di huzûra we de dibêjim, eger ez di girtîgehê de bême kuştin, qatilê min yuzbaşî Esat e«.

Belê me gelek kesên weha mêrxas jî di wê girtîgehê de dîtin. Hin mêrxas hebûn ko mirov li rewşa wan ecêbmayî dima, ne ji lêdanê ditirsiyan, ne ji girtîgehê û ne jî ji yuzbaşî Esat. Lê hin kes hebûn ko nava wan ji lêdanê diqetiyan, ji xwe ew kesên weha bûne zilamê yuzbaşî û kesên weha bûn ko ji bona lêdan li wan neyê kirin »îtîrafa samîmî« dikirin. Hin ji wan kesan, êdî li dadgehê jî li hevalê xwe didan û ew bi her awayê bûne merivên yuzbaşî. Yuzbaşî jî bi her awayî li wan xwedî derdiket; Li girtîgehê kesên weha di jiyaneke taybetî de bûn, xwarin, vexwerina wan ji kîsê yuzbaşî bûn. Car-carna yuzbaşî ew ji girtîgehê derdixistin, bi ko de dibirin me pê nizanîbûn.

Ew tiştên ko yuzbaşiyê me bi darê zorê, bi hin girtiyan dida nivîsîn, navê wê kiribûn »‹tîrafname ya samîmî« Lê ew bi xwe ne »îtîrafa samîmî« bû, ew bi xwe qebûkirina bi hukmê dar û jopan dihate kirin, bû.

Di girtîgehê de, cihên cûda cûda ji bona lêdana girtiyan û gelek

medotên bi taybetî hebûn. Li gor sûc û cezakirina girtiyan me ew dibirin cihê ko cezayên wan dihate birîn. Weke; lêdana di hucran, ya qawişan, û lêdana bi taybetî ya li sinema û hemamê ne weke hev bûn, li her cihekî şiklekî lêdanê hebû.

Jiyana me ya di wir de bû bû weke jiyana kerr û lalan. Ne me dizanîbûn ko em çi dikin û ne me rojekê devên xwe vedikir. Me her emirên ko ji alî yuzbaşî de dihat pêk dianî û gelek caran jî ji bona aferîmekê me mirov seqet dihiştin. Ew aferîma ko me li girtîgehê digirt, li vir, yanî li jiyana me ya siviltiyê de, li me bû weke pariyekî bijehr û di qirika me de ma.

Em ji her tiştên xwe bûn, ji dost û hevelan, dê û bavê xwe, xwişk û birayên xwe bûn. Lê rojekê ji rojan ne deweleta me, ne jî ew kesên di girtîgehê digot, ko her tişt ez im. Li me pirsîn. Kes nabêje »gelo ew kesên li girtîgeha Diyarbekrê gardiyan bûn, nîha halê wan çi ye«. Tu bi rastî bixwaze divê her kesekî ko li wê girtîgehê gardiyan bûn, ew kiryarên wan bi xwe kirine, bêjin, bêjin ko êdî tu kesên din neyên xapandin, tu kesên din jî weke me dikir, nekin. Ji ber derewên kesên li wir soz didan ko wê her dem li me xwedî derkevin, di jiyana me ya sivîltiyê de derket holê. Ew kesên soz dabûn ko wê li me xwedî derkevin, ev yeka hanê pêk neanîn. Ji roja qedandina me ya leşkeriyê de em hatin jibîrkirin. Lê hin kesên weke yuzbaşî, bi saya serê lêdana, ko me li girtiyan dikir, mezin dibûn, terfiyên wan î leşkerî bilindtir dibûn. Ma gelo rewşên weha wê heta kengî dom bike, em mirovên nezan,gelo heta kengî em ê bêne xapandin.«

Gardiyan him digot û him dibû kufe kufa wî, soro moro bû. Min fam kir ko dema ew tiştên wî bi xwe kirine tê bîrê gelekî aciz dibe, nikarîbû êdî qisedana xwe bidomîne. Him cixare dikişand him jî di nava ramanên kûr û hûr de xwe wendakiribû. Hêstirên wî yên girover xwe ji çavên wî bera xwarê da, hêsirên wî di ser çenga wî re, herikîn ser sînga wî. Devê xwe vekir ko tiştina bêje, serê xwe hejand û di ber xwe de got: »Wax wax, xwelî li serê min be, ma min çawa kir, tifî û hezar tifî li min be«ji vê pêve tu tiştekî din negot, rabû ser xwe, kete rê û çû. Qet ji min re tu tişt negot, min jî weha bi awayekî şaşmayî li rewşa wî mêze kir. Min jî ji wî re tu tişt negot, tenê heta ew jî ber çavên min wenda bû, min li wî nerî. Dû re ez rabûm ser xwe, min jî berê xwe da malê.

# XIX

Ez serê sibê zû rabûme ser xwe. Min haziriya xwe kir û li benda gardiyanê xwe rawestiyam. Ji xwe ji dema me hevdu dît û naskir vir de, êdî ez her roj zû radibûm ko wî zêde nedim sekinandin. Lê îro rojeke gelekî taybetî bû. Ez ji hatina wî di şikê de bûm. Min nema dizanî bû ko êdî ew ê bê ya na. Lê dîsa jî min xwe ji bona çûyinê amade kir û li benda wî rawestiyam. Lê ew ne dihat, tirsa min ew bû ko êdî ew ê neyê. Ez li ber şibakê rûniştim û qet ranebûm û çavneriya wî dikir. Berî nîvro min dît, wa ye ew dîsa di rê de ye û ber bi wî girê li hember nexweşxanê ve diçe. Dema ew hat rastî mala me, li hundir mêze kir, dît ko ez li ber şibakê li rêya wî dinerim, kêfa wî jî hat. Bi serê xwe îşareta, ko va ye ez diçim, tu jî piştî qederekê were, da. Kêfa min jî hat, min haziriyên xwe kiribû, hema min tiştê xwe girt, piştî ko ew ji ber çava wenda bû, îcar ez ketim rê. Dema min nêzîkayî li cihê me yê her car kir ko ew li wir rûniştî bû, bi dîtina min ew rabû ser xwe, hate pêşiya min tişt ji destê min girt û got:

— Ji bona do li min bibuihure, ez dizanim ko min bê ûsûlî kir, lê tu nizane ko çi kete bîra min. Dema ew tiştên ko min di wir de kirin hatin bîra min, min nema dikarîbû xwe bigirta, min nikarî bû xatir jî ji te bixwesta û ji derengmayîna min î vê sibê re jî sedam ew bû. Di mala me de bûyerek nebaş derbas bû. Şer di nava bav û birayên min de derket. Birayên min ji mal xeyîdîn, bavê min li min mêze kir û got: »Ev tiştên ko têne serê me, hemû ji rûçikê te ye,« Ev peyva bi min gelekî zor hat. Lê tiştekî ko ez bikim jî tune bû. Min xwest, herim û venegerim. Bi sergêjiyake weha ji mal derketim, min berê xwe da cihekî din, dereke ko êdî ez jê venegerim. Lê tu kete bîra min, wê demê ez li xwe vegeriyam, weke heft kes ji min re bêjin: »Lawo heta niha te tu tiştekî baş nekiriye, balo tiştên ko tu zani ji vî kesê qenc re bêje« û ez bi şûnde hatim. Min biryara xwe da ko heta ez ji te re tiştên ko ez pê dizanim nebêjim, ez ê bi tu derekê de nerim. Li min bibuhure em dest bi karê xwe bikin, wê baştir be. Dest pê kir:

»Me her şikil û metodên lêdanê li ser girtiyan ceribandibûn, him ew êdî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

fêrî lêdanê bû bûn, him jî em ji lêdana weke her ro aciz bû bûn. Ji ber vê yekê bû ko me êdî tiştên çewto mewto dikirin. Weke piştî meşa derve dema me qawiş dixiste hundir, îcar me yeko yek banî wan dikir ko ew werin ber derî û komûtê bidin. Di dema komûtdanê de me dizanîbû ko dengê kê ketiye û yên kê neketiye, ew kesên ko dengê wan neketibûn, derdixistin derve û lêdan li wan dikir ko çima dengê wan neketiye, lê hin mirov hebûn ko ew çiqa biqêriyana jî dengê wan nediket, kesê weha bêtir lêdan dixwarin û me ji wan re digot:

— Naxwe tu van sirûdên muqades naxwînî ha!

— Na komutanê min na, ji xwe dengê min nakeve, ez çer bikim jî nakeve. Digot.

— De wer li wî biner lo, tew ew min derewçîn jî derdixe, kuro!

Dema me kesekî girtî bi sûcekî sûcdar bikira, heqê girtî tunebû ko ew îtîraz bike. Pêwîst bû ko wî tenê bigota »tu emir dike komutanê min« ji bilî vê, gotineke din, sûcê wî girantir û mezintir dikir.

Êdî weha li me gardiyana hatibû ko em gelekî tiral (tembel) bû bûn, ji ber ko em bi her awayî li ser serê girtiyan azad bûn. Tenê em di warekî de ne azad bûn, bê lêdana girtiyan me nikarîbûn li wê girtîgehê weke gardiyan bimana. Ji bilî vê me çi, çawa bixwesta, li gor dîtin û nerîna yuzbaşî, me dikir. Êdî ji dilva ko em girtiyan derxin, derve û bi wan meşê bikin, sirûdên leşkerî bi wan bidin xwendin, me di hundir qawişan de, ev tişt, bêyî ko em biwestin, bi wan didan kirin.

Serê sibehan pêwîst bû ko girtî, saet 06.00-an rabana ser xwe, rîhên xwe kurkiribana, taştêya xwe xwaribana û cixarekêşan jî cixarên xwe kişandibana ko heta saet 07.00-a di rêza esasî de, li benda serhejmara serê sibê rawestibana. Berî serhejmarê, ji alî mesûlê wan de divê »Sonda Me« dûre di cih de meş û bi dengekî bilind jî sirûdên leşkerî bixwenda. Dema wan weha dikirin, me jî li kêfa xwe dinerî, çi dixwest ew dikir, car-carna jî me di wan qulikên di şibakên dîwaran de li wan mêze dikir, ko bê hela ew her tiştên ko em divên, nîzamî dikin an na.

Pêwîst bû wan bi dengekî gelekî berz sirûd bixwendana. Dema ko wan hemûya di wî hundirê teng de û bi deng bilind sirûd dixwendin, zarê guhê gelekan ji ber wî dengê berz diteqiyan û gelek bi vê sedemê kerr bû bûn, hina jî aqilê xwe wenda kirinbûn.

Piştî ko me ev şiklê meş û xwendina sirûdan di hundir de dît, em êdî rehet bû bûn. Serê sibê me emir dida, hetanî xwarina nîvro, piştî xwarinê ev kar dîsa berdewam dibû. Me kar weha bi pêş de biribû ko êdî gelek

caran rojên şemî û yekşema jî me ev tişt dianî serê qawişên cezakirî. Ji ber ko tiştekî rehet bû, tenê me emir dida, kar êdî bi xwe dihate kirin. Berê vê keşifa delal, rojên şemî û yekşema me qet bi wan meş nedikir, lewra me ji xwe re îstirehet dikir...

Me her roj ji girtiyan re bi pereyên wan, rojname û kovar dikirîn ko bi sedema ew wan bixwînin, di dema dayina wan de û me weha digot: »Divê yek rojname neyê qetandin, me çawa ev rojname dane we, pêwîst e ko hûn weha li me vegerînin«. Di vir de mebeste me ew bû, da ko ew rojnameyan nexwînin, ya duda jî dema wan rojname bi awayekî saxlem li me vedigerandin, me jî ew li cihê wan vedigerandin, yanî him rojname dihat girtîgehê, him girtiyan nikarîbûn bixwendana û him jî me heqê wan, ji girtiyan distend û ji xwe re ew bi şûnde dida û perê wan careke din digirt, yanî ev rewşeke weha bû ko ji me pêve kes nikarîbûn, ji nav derketa. Kesî nikarîbû bigota ko rojname nare girtîgehê, kesî nikarîbû bigota, girtî rojnama naxwînin. Ji ber ko me êvaran dida wan û serê sibê bêyî ko yek hatibe qetandin, me bi şûnde digirt û li cihê rojnaman difroşe vedigerand. Me heqê wan him ji girtiya distend, him jî ji cihê rojnameyan.

Di nava wan rojnameyan de, me yên seksî jî dikirîn û didan girtiyan. Me wan rojnameyên seksî hema zû bi zû ji wan nedigirt. Me dîxwest rojnameyên weha li girtîgehê hebin. Ji ber ko ew rojnameyên seksî çiqas di qawişan da bimana, ewqasî ehlaqê wan dihat xerakirin. Bi nerîna sûretên keçikên tazî ehlaqê geleka nebaş dibû, bi sozdana ko ew bibin mirovê yuzbaşî, hin soz ji bona kesên weha dihate dayîn. Bi saya serê wan kovar û rojnameyên seksî me gelek kes kirin alîkarê xwe û zilamên yuzbaşî.

Rewşa lêdanê bi awayekî rêkûpêk heta sala 1982-an berdewam bû. Lêdan û işkence qet kêm nedibûn, her ko diçû zêdetir û hîn jî firehtir dibûn. Ji ber wan lêdanên me êdî nav û dengê girtîgehê, him li Tirkiyê û him jî li cîhanê hatibû belavkirin. Ji ber vê yekê car-carna hin heyetên, mafê mirovan, yên Tirkan û hin jî ji derve dihatin. Ji bona ko yuzbaşiyê me, wan progpagandên dihat kirin, bi awayekî nerast bide zanîn, wî êdî lêdana fizîkî kêm kiribû. Her çiqa lêdana fizîkî kêm bû bû, lê li hemberî vê, tadeya pisîkolojîk zêdetir bû bû, ji ber vê yekê ye ko li wê girtîgehê rehetî peyda nedibû û lêdan nediqediyan.

Ji bona ko em bikaribin, bi rehetî, wan komelên ko mafê mirovan diparêzin bixapînin, di girtîgehê de ji heftê rojekê, bû bû roja sporê. Her qawiş rojekê diviyabû, sporê bikin û bi topê bilîzin. Me bi pereyên gir-

tiyan ji bona her qawişekê ji bo lîstika veleybolê top û tor da bû kirîn. Me ji bo kirîna wan tiştan pereyekî gelekî zêde ji girtiyan standin. Di destpêka kirîna van de kêfa girtiyan hat ko ew ê êdî, bikaribin di nava xwe de bi topê jî bilîzin. Lê em ne weha difikirîn. Me êdî baş dizanîbû ko lêdana fizîkî ji bona girtiyan, ne pir zehmet e, ew jî êdî fêrî lêdanê bû bûn.

Weke min got, me ji bona her qawişê topa veleybolê û tora wê da kirîn, rojên lîstina wan î topê jî me tiştên gelek ecêb dianî serê wan.

Her cihekî talîme me torek lê girêdabû. Dema kesên heqê mirovan diparastin, dihatin, çav li wê torê û lîstika girtiyan ya topê diketin, baweriya wan çêdibûn ko va ye, girtî dikarin topê bilîzin, spor ê bikin. Lê tiştên me dianî serê girtiyan, ji bilî me tu kesekî din pê nedizanîbû. Me li wan weha dikir:

Di wê roja ko diviya bû, spor bihata kirin, me qawiş derdixist derve. Du taximê ji 12 kesan pêk dihat. Wan dilîst, lê çawa dilîstin. Pêwîst bû her dem di rewşa nîzamî de bana. Tenê dema top dihat cem wan dikarîbûn destê xwe rakirana û li topê bidana, dûre dîsa têketana sekina nîzamî. Li dora xwe mêzekirin, bi dengê bilind gazîkirin, axaftina bi hev re ûhw. qedexe bû. Kesî nikarîbû ji kesekî din re bigota »ka topê bavê vira« dema kesî li topê neda, yan jî ew biketa, îcar me ew dibirin jor û lêdan lê dikir ko ji bona çi xweş nalîze. Eger du kes bi şaşî li hevketana, herduyan jî lêdan dixwarin. Dî dawiya lîstikê jî me ew kesên ko zora yên din biribûn, li hev siwar dikir û weha çend caran li dor saha topê dida bazdan. Lê ya xweş ew bû ko dema me kesê him bi kîloyên xwe û him jî bi qelefetê xwe giran û mezin, li wan kesên kêm kuwet û yên biçûk dikir, manzarayeke xweş derdiket, em ji kena diketin.

Ew kesên bi topê jî nedilîstin, wan nikarîbû, ji hevalên xwe re tezahurat bikirina. Bi awayekî azad meş kirin û bi hev re xeberdan û cixarê kişandin qedexe bû.

Roja spora wan, roja îstîreheta wan weha bû ko gelek caran wan nedixwestin ko derkevin derve û bi topê bilîzîn. Bi topê lîstin ji bona wan ji meşê zortir bû.

Eger musada te hebe, em îro jî di vir de bisekinin, ez gelekî westiyam, sibê ez ê ji te re tiştên hêjatir bêjim«.

Bi rastî ez jî gelekî westiyabûm, loma min li hember vê gotaina wî tu tiştek negot, deftera xwe girt, qelema xwe kire bêrîka xwe, bi wê rawestandinê ketim ramanên kûr û kûr nava wan bûyerên girtîgehê de çûm û

hatim.Ew bûyerên wir yeko yek dihatin berçavên min. Ew çi difikirî min bi xwe pê nedizanîbû. Berî ko em rabin wî dîsa got:

— Hevalê hêja, pêwîst e ko tu sibê hinkî dereng were vir, heta ko tu bêyî ez ê hin hazirî bikim. Sibê wê rojeke taybetî be. De ka em îcar rabin, bimîne di xweşiyê de û bi xatirê te.

Wî tu rojên din negotibû bi xatirê te. Min tu mane neda wê gotara wî, ya din gelo çima ez ê dereng herim min ew jî nedizanîbû. Lê min nedixwest ko ez, zêde xwe bidim dest û ew bizanibe ez jî de dema wî de girtiyakî wê girtîgehê bûm. Loma gelek caran, min hin tiştên ko wê min bide dest ji wî nedipirsî. Gelek caran min bi ya wî dikir ko ew wan kiryarên girtîgehê ji min re bêje. Ma gelo firseta weha bi dest kê diket? Min ev firset bi dest xistibû, loma ez gelekî ji xwe agahdar bûm. Min her hereket û axaftinên xwe bi kontrol dikir.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# XX

Roja din ez dîsa zû rabûm, li benda dema xwe ya çûyinê rawestiyam. Dema ko ew derbas bû, li hêla şibaka ko ez li wir li benda wî bûm, nêhirt, qet nekeniya û bi rûyekî tirş derbas bû. Ew derbas bû çû. Piştî wî bi qederekê yanî weke wî gotibû, li dor dema nîvro ez jî ketim rê, min berê xwe da wî girê li hember nexweşxanê û ketim rê û çûm. Li alîkî kêfa min dihat ko ew ê îro ji min re tiştên hêja bêje, li alîkî jî ez bi xwe jî weke di stresekê de bûm. Min jî nizanîbû ko ev yeka han ji bo çi ye. Gelek tişt ketin bîra min. Him girtîgeh, him rewşa min î li vir, rewşa ko ez niha têde bûm, ne tu rewş bû. Rehetî û têrxwarina me tunebû. Pereyên ko hevala min digirt, êdî têra me nedikir. Rewşa ko ez jî tê de bûm ne zelal bû, him min leşkerî nekiribû, him li alîkî din ez li welatê xwe her dem di bin çavan de bûm. Ne kar û ne jî îşê min hebû, weha aware aware ger jî, heta taliya jiyana min wê ji min re neserifiya. Di van xem û xeyalan de, dema min nêzîkayî li cihê hevdîtinê kir, tiştekî dirêj weke mirovekî bi darê de hatibû daliqandin, kete ber çavên min. Bi dîtana wî tiştî ez fikirîm »gelo gardiyan xwest henekekê (surpirîz) bike, gelo ew çî ye?« bi van ramanan min gavên xwe hîn bi lez avît, bi bazdan xwe gîhand bin darê. Lê ez çi bibînim, dîtina min dît ko cesedek bi darê ve daliqandî ye. Min nêzîkayî lê kir, berê wî bi hêla xwe de zîvirand, çi bîbînim. Gardiyanê min bi xwe ye, wî xwe daliqandiye. Bihna min teng bû, gurîzî girte canê min û ez gelekî aciz bûm. Gelo çima wî ev yeka kir? Gelo çima wî do ji min re gotibû ko »ez ê sibê tiştên hîn hêjatir ji te re bêjim?« Gelo çima wî xwest ko ez îro dereng werim vir? Naxwe hemû mesele ev bû? Gotina tiştên wî yên herî xweş, ev bû ko wî bi xwe, xwe daliqand. Berê ez jî şaşo-maşo bûm, lê min serê xwe rakir, li qelefetê wî mêze kir ko du name, xistine bêrîka çakêtê xwe. Dema min ew name derxistin li ser yekê nivîsandibû »Ji bo hevalê hêja Sîdar« ya din jî »ji bona bavê min«. Min ew nameya ko ji bo min bû, min girt ya din dîsa xiste bêrîka wî. Bi lez hatim nexweşxanê, min telefonî qerekolê kir, rewşa wî ji qerekolê re got ko ew jî xeberê bidin mala wî. Bi vî awayî her kesê herêmê pê agahdar bûn ko wî kesî

îxwe bi dar ve kiriye, lê ji bo çi ye kesî pê nizanîbû.

Dûre ez vegeriyam malê, min ew nameya ko wî ji bona min lêkiriye derxist. Destên min diricifîn. Min kir û nekir, nikarîbû, name vekira, Her çiqa zilm û tadeyê wî li kesên girtî û mirovên qenc hatibû jî, ew gelekî ji ber wan bûyer û kiryarên kiribû aciz bû, poşman bû. Lê wî nikarîbû vê poşmaniya xwe ji kesekî re bide îzahkirin. Loma ez jî bi xwe ji bona wî bû bûm hêviyek, bû bûm alîkarê wî ko ew wan bûyerên ko di girtîgeha Diyarbekrê de kiribû, bêje û xwe rehet bike. Bi wê hêrs û kederê rabûm ser xwe, min hinek ava cemidî vexwar, çayeke xwe da ser, dû re cixareyeke xwe pêxist û min nameya xwe vekir û dest bi xwendina wê kir:

»Hevalê hêja, Sîdar!

Ez weke hevalekî gazî te dikim, di rastiya xwe de tu heqê min tuneye ko ez te bikim hevalê xwe, ji ber ko ez ne hêjayî vî tiştî me ko mirovekî qenc bikim hevalê xwe. Lê tu dîsa li min bibihure, ji bona vê carê min bibexşîne. Ev dê cara min î dawîbe ko ez ê ji te re bêjim heval, ez hêvîdar im ko tê jî vê daxwaza min î talî qebûl bike.

Hevalê hêja!

Roja ko min tu nas kirî, kêfa min gelekî ji te re hat, tu û kesên weke te hûn hemû mirovên gelekî qenc in. Di destpêka gotina kiryarên girtîgehê de min tu nas nekir, piştî ko ez di nava bûyeran de çûm, êdî tu û rewşa te ya girtîgehê jî dihate bîra min, êdî min dîzanîbû ko tu jî di wê girtîgeha ko ez li gardiyan bûm, girtî bû. Ez weha bawer dikim ko te bi xwe jî gelek lêdan ji dest min xwariye, dema ko min ev rewşa te fam kir, min nedixwest tu zanibe ko min tu naskiriye, loma jî min xwest ew tiştên dihatin bîra min bi qasî zanebûna xwe ji te re behs bikim. Dibe ko min gelek tişt ji bîr kiribe, dibe ko min gelek tişt negotibe. Tiştên min digot, yên esasî û temelê lêdanê û rewşa pisikolojîk bûn. Tiştekî din yê giring jî ev e ko her gardiyanek li ser serê qawişa xwe azad bûn, her gardiyanek metodekî wî yê xas jî hebû, loma dikare kiryarên min û yên gardiyanên din bi her awayî hev negirin. Ew tiştên min ji te re gotin, tenê min girê didin û hemû rast in.

Dostê hêja!

Ez ê nexwazim vê nameya xwe dirêj bikim, tenê çend daxwazên min wê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hebin; eger tu van bikaribe pêk bîne, tê min di mezelê min de şad bike.

Weke tu jî pê agahdar bûyî, ko piştî çûyina min î leşkeriyê û qedandina wê, malbata min tu rehetî ji destên min nedîtin. Min her û her tade û işkence da wan. Wan di rûçikê min de gelek tiştên xwe wenda kirin. Ez bûme sedama bêtifaqiya nava wan, bav û birayên min rabûn hev, diya min ji derdên min û wan bûyeran tehamul nekir wefat kir. Taqeta bavê min, weke berê nemabû, ew gelekî asabî bû bû, sedemên van bûyeran hemû jî ez bûm. Min bi vê yekê dizanîbû, lê tiştekî ko ez bikim jî tune bû, min dikir û nedikir, nikarîbû xwe serrast bikira. Tiştên wê girtîgehê hemû di serê min de bi cih bû bûn, di laşê min de şîn hatibûn, tiştên qenc ji dilê min derketibûn, yên nebaş ketibûn şûna wan. Tu weke mirovekî zana û qenc pê dizane ko di wan şertên girtîgehê de mirov dikeve çi halî, xwe ji wê rewşê xilaskirin, ne weha hêsan e.

Loma daxwaza min wê ji te ev be ko tu tu carî navê min î rast li tu deran nebêje. Eger tu, van bûyerên min ji te re gotin, li rojnama ko tu tê de kar bike biweşîne, ez ê kêfxweş bibim. Lê rica ji te dikim ko tu ê navê min nede, tenê bêje gardiyan. Dema tu nav û paşnavê min î rastî bide, malbata min, xuşk û birayên min, dikarin zerarên hîn mezintir bibînin. Ji xwe heta tu bixwaze min zerar dane wan, ji niha û pê de ez naxwazim ko qasî misqalê zerre, zerara min bighê wan.

Dema ko min tu nas kir û pêde, ez hîn bêtir li ser wan bûyerên girtîgehê difikirîm. Min dixwest ko ez qenciyakê bi te bikim. Min dixwest ko ew bûyerên me gardiyanên wir dikirin, bêjim ko tu jî vana ji herkesî re bêje. Bila herkes rastiya wê girtîgehê bizanibin ko çima ewqas lêdan û tade tê de dihat kirin. Ji ber ko min ev mebesta te famkiribû ko te her dem bala min dikişand ser bûyerê wê girtîgeha bi nav û deng, wê girtîgeha ko serê gelek mirovên qenc xwar. Loma jî her êvar karê min ew bû, min tiştên wir dianî bîra xwe, min dixwest ko her tiştî, belê her tiştî ji te re bêjim. Lê tiştên ko hatin bîra min, yên min dizanîbûn ev bûn. Gelek kiryarên min bi xwe kiribûn, ji fediya min negotin, hin jî min xiste hustiyê hevalên xwe yên gardiyan.

Em, ew gardiyanên di wir de, piraniya me cahil bûn, feqirbûn. Me gelekan ji tu tiştekî fam nedikir, me nizanî bû, kurtçî çi ye, komunîst çi ye? Tenê li gor axaftina yuzbaşî her tiştê me dihate kirin, gotin gotina wî bû, kirin kirina me bû. Esasên plan û projan yên yuzbaşî Esat bûn û ew bi xwe jî ne mirovekî saxlem bû. Ew mirovekî kêş bû, roja ko wî venexwara, nikarîbû li ser xwe bisekiniya. Bû bû alkolîst û xwe dijminê

kurdan bû. Tenê daxwazeke wî hebû. Kurdan bikuje. Wî rojê çend kes jî bikuşta dilê wî rehet nedibû. Ji ber ko wî carna ji me re digot: »Dema her kurdek tê kuştin ez, salekê ciwan dibim«.

Min dixwest ko ez hîn gelek tiştên din ji te re bêjim, lê êdî ez ê nikaribim. Taqeta min ji ber wê bêtifaqî û ji hev belavbûna malbata min nema. Her ko bavê min li min mêze dikir, weke bêje »te dît te çi anî serê me, ev tişt hemû ji rûçikê te bûn«. Min bi xwe jî zanîbû ko ew bêtifaqiya ji rûçikê min, kete nava wan, min qet nikarîbû alîkariya wan jî bikira. Ez hêvîdar im ko tiştên min heta niha ji te re gotin, wê ji bo te baş bin. Dil dixwest, ko ez hîn baştir bikim, lê ez nema dikarim û dibêjim bi xatirê te. Ji bo te û hevalên te serkeftinê dixwazim...«


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**